Li Tirkîyeyê Tu Kes Sûriyeyîyan Naxwaze Ne Wisa? / **152**

Rev Ji Dêvla Çûyînê / **169**

Rojekê Bêyî Tirs Şiyarbûn Çi Azadiyeke Bêhempa / **182**

Carina Karê Me Ji Yê Li Tirkîyeyê Zehmetir E, Bêhenek/ **192**

Ev Der Sar E, Weke Cemedê / **205**

Bila Bêzar bin, Zivêr Bibin, Dev Jê Berdin û Biçin / **215**

Vê Gavê Ez ê Çi Bikim? / **224**

DYA, Xweziya Mirov Bi Tirkîyeyê Tîne / **233**

Encam / **241**

Destpêk

Kitêba LGBTÎ+ên Penaber 2: Ji Tirkîyê Çîrokên Koçberîyê çîrokên wan LGBTÎ+ên ku ji warên xwe bûne an jî ji warên xwe hatine derxistin û ji ber vê sedemê li welatên ewle ji nû ve tevli pêvajoya bi cih û warbûnê bûne dike mijara xwe. Di sala 2016an de ji aliyê Komeleya HÊVÎ LGBTÎ+ê ve kitêbeke bi navê LGBTÎ+ên Penaber hatibû çapkirin, tê de çîrokên wan LGBTÎ+ ên ku koçî Tirkîyeyê kiribûn, hebûn. Ev kitêba ku cih dide çîrokên wan LGBTÎ+ên ku bi sedema nasnavên xwe ji Tirkîyeyê koç kirine jî wek berdewamiya wê kitêbê hatiye amadekirin. Mekana ku di vê kitêbê de hatiye xwestin, bi awayekî şûngorandî derdikeve pêşberî me.

Di sala 2010an de li welatên Afrîkaya Bakur û Rojhilata Navîn tevgerên civakî di serî de biwarên sosyal û siyasî lê belê di gelek biwaran de bû sedema guherînê, ev tevgerên hanê jî kir ku mobilîzasyona mirovan ber bi Tirkîyeyê ve lez bide xwe. Ji 2010an heya van rojan di nav wê pêvajoyê de gelek caran Tirkîye weke welatekî koçgîr hat binavkirin lê belê di nav heman pêvajoyê de koçdarbûna [mirov jê koç dikin] wî hat paşguhkirin. Her wek piraniya welatên koçdar li Tirkîyeyê ji sedema ewilî ya koçê ji hawira mirovî ya neewle¹ ye ku ew hawir ji aliyê şer ve hatiye afirandin. Pozîsyona LGBTÎ+ên Tirkîyeyî yên ku bi hestên neewle dixwestin ji hawira şer² birevin weke koçê derket pêşberî me.

Di sala 2015an de kesên LGBTÎ+ bûn hedefên wan bizav û tevgerên siyasî yên ku li Tirkîyeyê xurt bûn, li ser dijiminiya li LGBTÎ+an cihêkarî û nefreta ji LGBTÎ+an hîn bêhtir kûr bû. “Meşa LGBTÎ+ ya Rûmetê ya Stenbolê” ya ku li Ewropaya Rojhilat û li Rojhilata Navîn Meşa Rûmetê ya herî qelebalix e ji sala 2015an pê ve hat qedexekirin. Salên li pey wê

1 Li gor Raporta Komîsyona Ewlehiya Mirovî ya Neteweyên Yekbûyî têgeha hawira mirovî ya ewle bi pênaseya herî hêsan weke misogerkirina azadiya kesên tê tarîfkirin.

2 Di Modela Çandên Koç û Xebatê de faktorên ku şêwe didin mekanîzmayên biryardana koçkirina mirovan li ser navê têgeha “şer” tê dahûrandin. (Cohen û Sirkeci, 2011)

qedexekirina Meşên Rûmetê yên li bajarên din pêkhatî bi xwe re anî. Di sala 2017an de Parêzgarîya Enqereyê qedexe danî ser çalakîyên LGBTÎ+an, bi van qedexeyan re LGBTÎ+an mehkûmê jîyaneke wiha bûn ku ew jîyan ji hêla hiqûqî ve di nav atmosfêreke neewle de bûn. Lîvdariya koçê ya LGBTÎ+ên ku mafên wan ji hêla Makezagonê ve nehatine misogerkirin, di vê pêvajoyê de lez da xwe.

Tevgera LGBTÎ+ê ya li Tirkîyeyê ji sala 1993an vir ve xwerêxistinîya xwe bi xwe pêk anî, di nav salan de rewşa wê bêhtir hat xuyakirin. Xuyaniya tevgera LGBTÎ+ê ya ku di ser komele, komîsyon, pêkhate û klûbên xwendekaran re xwe li bajarên cuda bi berdewamî rêxistinî dike, di van rojan de wek xetereyê cidîtir tê têgihiştin. Tevgera LGBTÎ+ê geh ji aliyê endamên medyayê ve geh jî ji aliyê sazîyên fermî ve pirî caran wek hedef têne destnîşankirin³.

Însiyatifa HÊVÎ LGBTÎ+ê ji pêkhateyên LGBTÎ+ yên ku bêhtir li ser nasnava tirkîtyê dihatin xuyakirin bi awayekî cihê di sala 2013an de li hev kom bûne û xebatên xwe bi awayekî pirçandî dane destpêkirin. Li gel tirkî çavkanîyên xwe bi zimanên mîna kurdî, erebî, farisî û îngilîz jî diafirînin, xebatên xwe yên di biwara LGBTÎ+ên koçber û penaber de didomînin.

Piştî komelebûna HÊVÎ LGBTÎ+ê di sala 2015an de penaberên LGBTÎ+ bêhtir pêwendî li gel HÊVÎ danîtin. Ev hêza ku penaberên LGBTÎ+ ber bi xebatên Komeleya HÊVÎ LGBTÎ+ê ve dikşîne, bi politikaya wê ya pîrzimanî û/an jî ji ber ku di navê wê de HÊVÎ heye dikare bête ravekirin.

Her wek ku di sala 2015an de me di bernameya perwerdehiyê ya bi navê “Di Biwara LGBTÎ+ê de Têkoşîna li Hemberî Nijadperestiyê”⁴ de diyar kiribû pêkhateyên qîsma herî mezin ya Komeleya HÊVÎ LGBTÎ+ê ew kes in ku di herka koçkirina navxweyî ya Tirkîyeyê de “nayên xwestin”. Belkî em bikaribin bi van tiştan re şiyana xwe ya entegrebûna ew çend bi lez ya biwara penaberîyê, rave bikin: me tu carî ji bîr nekir ku em kengê ji gund hatin û kengê bûn bajarî, me tim û daîm koçberbûna

3 <https://kaosgl.org/haber/2019-yilinda-lgbti-lari-sistematik-hedef-gosterme-yayginlasti> (Mêjûya ragihani 12.01.2021)

4 <https://tr.boell.org/tr/2019/09/18/lgbti-alaninda-irkcilik-ile-mucadele-egitim-programi-raporu> (Mêjûya ragihani 12.01.2021)

xwe di quncikekî bîra xwe de parast. Ew kesên ku di encama koçkirina navxweyî ya Tirkîyeyê de nedihatîn xwestin û LGBTÎ+ên ku ji welatên cuda hatibûn dema gihan hevdu HÊVÎ LGBTÎ+ hîn xurttir bû. Yekbûyîna di vê hevkarîyê de di biwara LGBTÎ+ên koçber û penaber de hewcehiya xebatên zêdetir ji bi xwe re anî.

Bi mebesta balkişandina ser pirsgirêkên serhatî yên LGBTÎ+ên penaber ên ku bi taybetî li Sûrî û Rojhilata Navîn ji cih û warên xwe hatine qutkirin û bi mebesta belgekirin û rojevkirina bînpêkirina mafan, nijadprestî û cihêkarîyê di kitêba LGBTÎ+ên Penaber de çîrokên wan hatine berhevkirin. Penaberên ku di vê kitêbê de dipeyivin îro li Tirkîyeyê najîn. Lê belê divê em ji bîr nekin ku neheqîyên serhatî didomin, bi ser heqîyê ve tu tiş ber bi başkirinê ve neçûye. Her ku nav cuda bin jî çîrokên serhatî mîna ne hev, hema bêje eyn wek hev in.

Ji sala 2015an vir ve, her ku di dîroka Tirkîyeyê de biwarên demokrasî û polîtîkaya civakî tu carî berfireh nebûbe jî bi tengkirina van biwaran re zextên li ser LGBTÎ+ên ku li Tirkîyeyê dijîn û li ser Saziyên Sivîl ên Civakî yên ku di van biwaran de kar dikin, zêde bûne⁵. Guherîna konjoktûrê û siyaseta yekrengî him ji bo LGBTÎ+ên ku li Tirkîyeyê dijîn him jî LGBTÎ+ên Tirkîyeyî kiriye rewşeke neewletir. Bi taybetî piştî sala 2016an, di wê koça ji Tirkîyeyê ber bi Ewropayê ve, LGBTÎ+ û çalakvanan ji cih û warên xwe hatine derxistin, hin caran jî mecburî terkandinê hatine kirin. Di demên dawî de gelek LGBTÎ+ ji bo ku li ser koç û rêyên koçkirinê xizmeta şêwirmendiyê bigrin serî li komeleya me didin.

Ev kitêb di rewşên serhatî yên koç û rêyên koçkirinê de, di mijarên heqwarin û polîtîkayên koçkirinê yên ku li welatê xerîbîyê pêk tên ji bo agahdarkirina LGBTÎ+ên ku her ji ber çî sedemê koç kiribe, koç lê hatibe ferzkirin an jî ew bi xwe xwestibe terka Tirkîyeyê bike, ji bo alîkarî û piştgirîya wan LGBTÎ+an hatîye berhevkirin.

Yek ji wan xalên girîng yên ku em dixwazin balê bikişînin ev e: Îro çawa ku li Tirkîyeyê penaber, bi taybetî jî penaberên Sûrî tûşî nijadperestî û

⁵ https://www.bbc.com/turkce/haberler/2016/06/160617_onur_yuruyusu_valilik (Mêjûya ragihani 12.01.2021)

cihêkarîyê dimînin bi heman tecrûbeyan penaber û koçberên Tirkîyeyî yên li welatên cuda ji tûşî wan tiştan dibin. Em vêya dibînin: Çawa ku li Tirkîyeyê ji ber nezanîna tirkî, di ser zar û devokên xwe heqê penaber û koçberan tê xwarin, dûçarî cihêkarîyan dibin heman tişt têne serên wan penaber û koçberên Tirkîyeyî yên ku ji vê derê çûne Ewropayê. Em dibînin: Çawa ku li Tirkîyeyê dibêjin “em Sûrîyeyîyan naxwazin”, li piraniya welatên Ewropayê ew peyv diguhere dibe “em Tirkîyeyîyan naxwazin”, “em tirkan naxwazin”, “em bîyanîyan naxwazin.”

Her wek ku di kitêbê de hatîye qalkirin, li dinyayê tu welat nîne ku ji LGBTÎ+fobî an jî ji binpêkirina mafan hatibe paqijkirin. Em pê dizanin ku di xala xwegihandina heqîyê û hebûna jîyanî de mirov here kîjan welatî pirsgirêkan dibîne.

Ferqa wan welatên ku weke ewle⁶ têne pênasekirin û Tirkîyeyê ev e: Zagonên heyî cihêkarîyê weke sûc qebûl dike û vê cihêkarîyê li gor ku meylên cinsî yên cur be cur û ji bo nasnavên zayendî jî ango li gor ku LGBTÎ+an jî bixe hundirê xwe bi awayekî berfirehkirî hatîye lidarxistin. Bi saya vê yekê sûcên li hemberî LGBTÎ+an tê kirin pirî caran bê ceza namîne. Ji ber vê yekê, piraniya LGBTÎ+ên ku di hevdiîna de cih girtin naxwazin carekî din bi temamî vegevin Tirkîyeyê. Bi saya zagonên wan welatên ku li wê derê dijîn xwe bêhtir di nav ewlehîyê de hîs dikin. Ew rewşa hanê carekî din bi bîra me dixe ku bê girîngîya zagonên li hemberî LGBTÎ+fobîyê çiqasî heyatî ye. Her wekî ku di kitêbê de wê bê xuyakirin li welatên Ewropa û Amerîkayê kesên cihêkarî him li penaberan him jî li LGBTÎ+an bikin hene lê belê ji bo pênasekirina sûcbûyîna van cihêkarîyan jî zagon hatine derxistin.

Ji bo wan kesên LGBTÎ+ yên ku ji Tirkîyeyê koç kirine, li Tirkîyeyê jî cih û warên xwe hatine derxistin an jî ew bi xwe terka Tirkîyeyê kirine li gel serhatîyên wan ên rêgirîya zimên, heqxwarîyên di biwarên vehewîn

⁶ Welatê ewle yê sêyemîn, li gor welatê qebûlkirî, derveyî welatê mirov bi xwe, ew welat e ku kesê penahende li wê derê vehewandîye an jî dikare li wê derê xwe vehewîne. Têgeha welatê ewle yê sêyemîn (qaydeya vehewîna li cihekî din/penahîya ewilîn) ji bo diyarkirina statûya penaberîyê di nav prosedûran de gelek caran tê bikaranîn. (Perruchoud û Redpath, Gôç Terimler Sözlüğü [Ferhenga Têgehên Koçê], 2004)

û xebatê de, wek hemû mirovan wan zagonên heyî bêhtir vehewîner dibînin û hewla sazîkirina jîyaneke nû ya li welatên xerîbîyê jî didomînin. Sedema sereke ya koçîkirina LGBTÎ+an ev e ku li Tirkîyeyê zagonên li ser kar nikare heqên LGBTÎ+an biparêze, hew wan tune dihesibîne.

Wek ku li jor jî me gotî bi tenê navê welatan diguhere; penaber û koçber bi taybetî jî LGBTÎ+ên penaber û koçberan tûşî nijadperestî û cihêkarîyê dibin. Hin caran, cardin koçîkirin li wan tê ferzkirin. Rewşên mîna dijîminîya li bîyanîyan li welatên penaheyî, îslamofobî û nijadperestî, li ser van tiştan nedîyarî, kulfeta îspatkirinê, nebûna niştecihîya daîmî, dersînorkirin, nehesibandina “hemwelatîya wesîfdar” tê ragihandin ku ji bo wan kesên LGBTÎ+ên ji Tirkîyeyê koçîkirî li welatên xerîbîyê têgihîştina neewlehîya mirovî diafirîne.

Ev kitêb li derdora çîrokên wan neh kesên LGBTÎ+ên Tirkîyeyî yên ku ji hawîra newele ya mirovî koçî hawîra ewle ya mirovî bûne teşe girtiye. Di vê kitêbê de tecrûbeyên di warê polîtîkayên penaberî û koçîkirinê yên heşt welatên penaheyî yên cuda de, ji bo LGBTÎ+ên penaber xala şert û mercên jîyanî yên welatên malxweyî ji devê kesên yekemîn ve tene neqilîkirin.

Weke berdewama kitêba *LGBTÎ+ên Penaber* vê carê ji pencereyêke cuda çîrokên nû em raberî we dikin. Bi vê berhevkarîyê re em dixwazin bi bîra we bixin ku divê em ji bîr nekin ku heman nijadperestî û cihêkarî li hemberî wan kesên LGBTÎ+ên li Tirkîyeyê dijî tîn kîrin, divê em ji bîr nekin ku pîrî caran têkoşîna li hemberî vê yekê xwedî girîngîyêke heyatî ye. Heqê her kesî heye ku xwe di ewlehîyê de hîs bike û em dizanin ku weke hemû mirovan kesên LGBTÎ+ jî ji bo ku xwe bêhtir di ewlehîyê de hîs bikin lêgerîna ax û welatan didomînin. Bi hêvîya ku li hemberî wan kesên ku dev ji vê lêgerînê bernadin nijadperestî û dijîminîya ku li deverê dinyayê li penaber û koçberan tûş dibe dawî li xwe bîne.

Li ser navê Komeleya HÊVÎ LGBTÎ+
Müzeyyen Araç - Ercan Aydın

Spasî

Berîya her kesî em spasiya wan kesên gotûbêjkar ên ku çîrokên xwe bi me re parve kirine wekî deynekî dibînin di stûyê xwe de. Ne ji wan bûna ew kitêb nedibû.

Em spasî û malavahîya van kes û sazîyên jêrîn dikin ku:

Cihan Huroglu di pêvajoya amadekirina kitêbê her û her li cem me bû,

Weqfa Friedrich Ebertê pişgirîya me kir,

Di hemû pêvajoya xebatê de Selçuk Çelik pişgirîya amadekirina weşandinê kir,

Necib Varan bi nivîsandina nivîsa encamê re hevkarîya me kir,

Esra Guven û Mehmet Sait Çakar di xwendina ewil û ya dawî de piştgirî dan,

Gokçe Katkici û Ferzan Şer mil dan wergerên îngilizî û kurdî,

Michael Asher xwendina dawî ya îngilizî û mamosteyên me yên ku hevkarî li xwendinên dawî ên kurdî kirin,

Di pêvajoya amadekarîya teknîkî de Süleyman Sayar, Osman Dogan û Salah Ahmed alîkarîyên xwe texsîr nekirin,

Hemû dildarên HEVî LGBTÎ+ ên ku her dem, di her şert û mercan de bi me re ne.

Em carekî din spasiyên xwe yên ebedî pêşkêşî wan tevan dikin.

Rast E Wekî Din Pêdivîya Mirov Bi Çi Dibe...

Silav,

Ez Pinar. Ji ber ku dê û bavên min ji hev veqetîyane ez di malbateke perçebûyî de mezin bûm. Dêya min bi eslê xwe rûm e, vê yekê li cem min hesta bêaîdiyetîyê peyda kir. Bavê min jî li Hêzên Çekdar ên Tirk [TSK] leşker e, ev jî bo min rewşeke cihê ye. Ez xwedî malbateke werê me, dibe ku ji bo we têkel be; ez xwedî şecereyeke werê me, dibe ku ji bo we xerîb be.

Di temeneke pir biçûk de bi tenê mam. Di heft salîya xwe pê ve ji hêla dapîra xwe ve hatim xwedîkirin, min salên xwe yên zaroktîyê li mektebên şevînê derbas kirin û di nav van aloziyan de min hewl da hebûna xwe saz bikim. Hasbelqeder dema ez gihiştim hejdeh salîya xwe min xwe di nav çalakvanîyê de dît. Piraniya mirovan bi heweseke mezin li benda hejdeh salîya xwe ne û dema dikevin hejdeh salîya xwe dibêjin qey wê xwe xweştir îfade bikin. Ez jî weha fikirîbûm. Te dî, yekê loq û badayî, bêhtir tîpeke jinane bûm. Ne jin ne jî mêr. Ez weke dîtbariyê dibêjim, an na pênaseyeke bi vî rengî nakim helbet. Ev tiştêkî bi min ve eleqedar e.

Min rojbûna xwe ya hejdeh salî dixwest bi çûna Taksîmê re pîroz bikim. Di wan deman de ango di salên nodî de di televîzyonan de bi awayekî zêde behsa zikaka Ulkerê, transên li Taksîmê dikirin. Bawerîyekê werê hebû ku te digo qey hemû trans li Taksîmê dijîn. Ji ber ku cî û senaryoya di derbarê me de di bernameyên televîzyonan de dihat nîşandayîn tim eynî bûn. Ez jî bi kelecana hejdeh salîyê çûm Taksîmê û li ser bankekê rûniştim. Ji hêlekê ve min hewl dida ku hay ji derdora xwe bibim, derdora xwe kişf bikim ji hêlekê ve jî min hewl dida ku xwe di mejîyê xwe de li cihekî bi cî bikim. Ji nişka ve bêtir min tawanek kiribe polîsên sîvil hatin ber min. Nasnameya min xwestin, min derxist da wan. Gotin

“çi karê te heye li vir, tu çi dikî?” ji min re. Min got “hema ji xwe re rûdinê.” Ez bawerim ji nişka ve têgihîştin ku ez “lubunya” me. A soxî, çawa têgihîştina vê yekê kirin min qet fahm nekir. (Te dî, min destên xwe bi awayekî jinan livand, an jî min tevgereke jinane kir, zêde nizanîm). Dûre bi lez û bez ez bin çav kiram. Wan ez birim Gerîndeyê Emnî ya Beyoglu, li Tarlaşaşî. Li wê derê serekê polisan Hortum [Xortim] Silêman hebû, bi îşkenceyên xwe nav û deng dabû, bi lêdanên wî re ez ketim hejdeh salîya xwe. Qet ji bîra min naçe: pirsra rengê ku herî zêde jê hez dikim kiribû, min jî gotibû “sor” û bi xortima sor min lêdan xwaribû. Ev trawmaya ewil bû hat serê min. Ez dibêim li pey wê min tu carî nekarî xwe li cihekî bi keys bikim. Min xwe wek firêzan hîs kir. Di çavên malbata xwe de jixwe ez zarokekî xerab û nediwê bûm.

Piştî temenekî, bi rastî jî êdî min nedikarî debara serhatiyên xwe bikim. Him ji tundîya giran ya derûnî ya malbatê, ji tundîya hevsalan him jî ji tundîya ku li mektebê dihat serê min di rewşeke pir bêzar de bûm. Di nozdeh salîya xwe de min mekteb qedand, ji malê veqetîyam û hatim Enqereyê. Li Enqereyê tiştên xerabtir hatin serê min. Li pey wan jî hatim li Stenbolê bi cî bûm. Di demajoya jiyîna min a li Tirkîyê, cara ewil li Lambadaya Stenbolê bi rêxistinî bûm. Li wê derê jî tiştên cuda cuda hatin serê min. Serdemeke wiha bû ku bi rastî min qet nizanibû bê tiştêkî bi navê jina trans heye an nîne, her wekî din dişibe çi. Ez behsa serdemeke wiha dikim ku digotin qey hemû jinên trans karkerên seksê ne, bes bi şev dertên zikakan, wan weke şevşevokan an jî weke monsteran (cinawiran) diditin. Mînak di nav rêxistinê de bi salan, min digo qey ez gey im, geyeke jinane me. Ji wan deman vir ve, ji bo min têkoşîneke giran ya hebûnê dest pê kir.

Dest ji heyîkirina nasnava xwe diborim, serdemeke wiha bû weke mirov jî bihatana qebûlkirin zor bû. Ev tişt, bi demajoya ez li Tirkîyê bûm qet kêma nebû, her roj çû zêdetir bû. Her ku roj derbas dibe bêhtirî pêdivîya min bi dengbilindkirinê dibe li hemberî her tiştên hatine/tê serê min. Bi kurt û kurmançî ez polîtîze dibûm. Tu dest pê dikî, neheqî û êşên

1 Her ku ewilî ji bo jinên trans an jî geyên jinane pênase kiribe ji di van rojan de hemû LGBT⁺an pênase dike ev peyv.

hatine serê dikeyên din dihesî. Tu bi sazîyên cur be cur re, tu bi civatên ji mirovên cur be cur re dibî wekehev. Hewl didî bibî wekehev. Di wê heynê de, ev tişt bi rindî te vediguhêrîne. Êdî tu têyî halekî ku tu dev ji xwe berdidî ji bo mirovên din tiştina dikî. Carina, ez xwe wekî Don Kîşot jî his dikim. Birra jî min ev pirsan ji xwe dikirin: “Gelo bi rastî aşê bayî hene?, an jî ev giş xewnên min in?”. Demakê di civînekê de ez beşdar bûm, min gotibû: “Li derve jîyaneke hetero heye boş bi boş diherike”. Bes ji ber ku min ev peyv gotin hatim lînçkirin. Kesên di civînê de bi gotina “ev çî gotin e, jîyana hetero, tu ji ku pê dizanî mirov hetero ne an ne hetero ne” re li ber min rabûn. Di destê min tu daneyên bi vî rengî tune bû lê belê qet nebe tiştê me dîtî, her tim ev bû: Her û her jîyanên heteroyê dixistin çavê me.

Ew nijadperestî û ji-qewet-birandina tu lê tûşbûyî te fêr dike ku tu bi mirovên din re bêyî cem hev. Ezmûna li Tarlabaşî jî wiha bû. Wekî din, pêvajoya Habitat IIê², mirovên ku tûşî cihêkarîyê bûne ên mîna kurd, roman, reşik, Afrîkayî, ji çandên cuda û ji nasnavên cuda bi kurtaşî hemû dikeyan bi awayekî anî cem hev. Ev jî kir ku em warekî nû yê jîyaneke hevpar ava bikin.

Ji wê pê ve min jîyan û têkoşîna hevpar li mêvanxaneyê transan jî ezmûn kir. Berî ku ez li mêvanxaneyê transan bimînim, bibim perçeyê ji wê derê haya min ji piraniya rasteqînîyan nîn bû. Piştî min li wê derê dest bi jîyanê kir, hay ji wan [rasteqînîyan] bûm. Mêvanxaneyê transan, berê jî, cihêkî werê bû dem bi dem diçûme serdanê, heya ji destê min dihat min hevkarî dikir. Rojekê hat ez jî mecbûr mam ku li wê derê bijim. Çimkî ji aliyê hezkirê xwe ve hatim xapandin. Ji ber vê yekê, ji ber ku min nekarî kirê xwe bidim xwedîyê xaniyê ez ji malê avêtim. Demekê li zikakan mam. Dûre, mecbûr mam, çûm mêvanxaneyê transan. Li mêvanxaneyê transan min tiştên balkêş ezmûn kirin. Te di tu bi awayekî politîk têyî, hay ji her tiştî heyî, wateyê her tiştî dizanî lê belê piştî jîyîna li wê derê rastî gelek tiştên balkêş têyî. Hûn ji wan tiştên ku li derve ji bo wan

2 Konferansa bi navê Habitat II ya ku di sala 1996an de li Stenbolê pêk hat. Berî vê konferansê, behsa wê serdemê dike ku jinên trans ên weke hilweşînerên pergala çanda heteronormatîv hatine daxkirin, li kolana Ulkerê ya li Cihangirê hatibûn qewirandin, hatibûn vederkirin û tûşî her cure tundiyê mabûn.

şer dikin û têdikoşin zêdetir li wê derê ezmûn dikin. Cihêtiyên politîk, statûyên civakî. Ev ezmûn bi rastî jî ez gelekî heyirandibûm. Mînak li mêvanxaneya transan jineke trans hebû hir MHPyî [Partiya Tevgera Neteweperest] bû. Dema pê re axifim gelekî metel mam. Te dî, hesta wê ya neteweperwer ew çend bilind bû, ji min re balkêş hat. Jê pê ve gelek mînakên din, gelek çîrokên din hene.

Piştî mayîna li mêvanxaneyê ez bûm rêverbira wê derê. Her tiştê mêvanxaneyê li ser milên min man. Bi rastî gelekî zehmet bû û pir ji qewet birand. Him hewl didî ku ew der li ser pîya be him jî ji bona pîrsgirêkên wan kesên li wê derê dijîn li çareserîyan digeri. Piştî şerên ku di 2011an de li Rojhilata Navîn dest pê kirin Tirkîye gelek koçberan li xwe girt. Ji Rojhilata Navîn bêhtir penaber dihatin. Pir LGBTÎQên penahende hebûn û hin sazîyan berê LGBTQyan didan mêvanxaneya transan. Bi sedema vê rewşê re guherîna mêvanxaneyê ber bi tiştêkî din ve dest pê kir. Bêhtirî cihê starê yê transên Tirkîyeyî bû, ji nişka ve bû cihê mayîna wan mirovên ji herêm û welatên cuda yên Rojhilata Navîn. Vê carê jî şerekî di navbera çandan de dest pê kir. A rastî hemû rewşên cihêkariyê yên di nav jîyana rastî de têne dîtin, hemû rewşên tundî, her awayên tundîya di zimên de derketin holê. Bes transbûyîn têrê nake. Ango bes ji ber bûyîna homoseksûeliya jin an jî homoseksûeliya mêr nikarî di fahmeke hevpar de û di jîyîneke hevpar de bigihî hev. Li mêvanxaneyê hingê min ew tişt dî û min ew ezmûn kir. Bi rastî jî zehmet bû. Kesên hatin mêvanxaneyê, yên ku berê xwe dane mêvanxaneyê xwedî trawmayên cidî bûn. Mînak li Tirkîyeyê, sazîyeke ku naxwazim navê wê bidim, jineke trans ya şêwrê şand ji me re. Ev jinik berê, ji bo komeke radîkal û dijwar ya îslamî hatiye şandin. Ji qîzîkê re gotine “di destê me de wekî din derfet nîne, tu yê li vê derê bijî”. Heya ku qîz were vê derê, li mêvanxaneya li wê derê du meh û nîv, tu awayê tundîyê nemaye lê nekirine. Ewilî dema hat mêvanxaneyê, sazkirina danûstendinê bi qîzîkê re gelekî zehmet bû. Ji ber ku, yek ez ne psikolog im, ne psikyatr im, ne pisporê xizmeta civakî me. Ango min qet perwerdehî nedîtiye. Bi saya têkoşîna xwe ya jîndemayînê min hewl da xwe bigihînimê. Aha, tu hewl didî bi mirovên di van rewşan de pêwendiyekê saz bikî. Bi rastî zehmet bû, bes li ser xwe nabêjim. Helbet dinya xwedê mirov hebûn; di

wextên xwe de keda xwe dane mêvanxaneyê, mêvanxane anîne vê halê heyî, ew domandine. Bêsiûdîya min ew bû ku mêvanxane piştî hatina min gelekî qelebalix bûbû. Zêde zêde mirov hebûn. Û venêrîna wan mirovan hemû jixwe ne pêkan bû.

Kes belasebeb koç nake. Kes dev ji zimanê xwe, ji çanda xwe bernade û naxwaze li cihekî nenas bijî. Kes naxwaze dev ji civaka xwe ya ku arîşedar e lê belê hîni pevjiyana wê bûbe, dev ji cihên nas berde û biçê. Hela ku yeka wek min polîtîk, pir realist, keseke ji bo hemû kesên çewisandî dixwaze tiştina bike, vê biryarê bide û li Swîsrê nişteci bibe bi rastî zehmet bû. Biryara min a koçê di demeke kin de, tevî tevî di nav mehekê de hate dayîn. Ango ne biryareke wiha bû bi salan li ser hatibe fikirîn, li ser hatibe sêwirandin û projekirin. Ez bi valêzeke biçûçik hatim vê derê. Ez bêjim, rojnameya bi navê Akît li ser mêvanxaneyê transan çend caran nûçe çêkirin. Di wê gavê de, piştî êrişê Kürşat Mircan li Meşa LGBTI+ ya Rûmetê ya Stenbolê, êriş bo dadgehîyê hatibû veguhastin. Her weha du caran êriş birin ser mêvanxaneyê transan. Carekê polîsan, carekê xelkên bi piştevaniya polîsan avêtin ser mêvanxaneyê. Tundiya ku polis li me kir gelekî giran bû. Min di jiyana xwe de qet tundîyeke ew qas giran û bi komî nedîtibû. Ew şev, derdora 03.30ê ber sibehê li mêvanxaneyê her kes di xew de bû, min ji nişka ve bihîst ku deriyê avahiya mêvanxaneyê hat şikandin. Di wê kêliyê de xirecirek rabû. Ez rabûm bê ka çi bû. Di wan deman de me pergala kamêrayê saz kiribû li odeya min. Min ji kamêrayê lê nêrî li derve qelebalixa polîsan heye. Min hewl dida ku fahm bikim bê ka çi dibe. Heya ku ez derkevim derve polis derketibûn jor. Hêj ku me nego hela çi dibe, wan demildest ez ji paşve kelemçe kirim û li erdê dirêj kirim. Peywirdarekî pir qelew yên ewlehiyê li ser piştê min rûnişt. (Ji wê rojê vir ve ye milê min seqet e, ez nikarim baş bi kar binim.) Hêj di wê kêliya fahmkirinê de bê çi dibe polîsan gotin “li ser teror û fihûşê gilî hene lewma em li vê derê ne”. Min ji wan re got “terora çi, fihûşa çi, hûn çi dibên?” Ji min re gotin “tu kî yî?” Min jî ji wan re go “ez berpîrsê vê mêvanxaneyê me. Ji kerema xwe rê bidin ku ez rabim ji we re behsa vê derê bikim, xwe bidim derbirîn.” Derfetek wisa nedan. Hema bêje 20 deqîqa bi wî şiklî li erdê mam. Mêvanxane tev de talan kirin. Her tiştî belawela kirin, her derî hilweşandin. Kesên

di wê demê de li wir diman pir tirsîyan. Mêvanxane duqatî bû. Ji du daîreyên ku li qata sêyemîn û pêncemîn bûn pêk dihat. Di wê kêliyê de ez li zarûyên din ên li mêvanxaneyê difikirim: “Gelo di çi rewşê de bûn”. Çimkî piraniyên wan bi tirkî nedizanîn. Jixwe gelek trawmayên wan hebûn. Bi ser de tiştêkî werê tê serê wan, gelekî sawdar bû. Piştî lêgerîna wan qedîya destûr dan min ku rabim ser piyan. Bi gotinên “li vê derê propogandaya terorê tê kirin, fihuş tê kirin” bi ser min de hîlbûn. Min hewl da wiha vebibêjim: “Binêrin ev der mêvanxaneyek e, ji bo hevalên me yên penaber stragehek e. Keremkin werin. We bi xwe jî lê nêrî. Gelo ev der dişibe cihekî ku fihuş li wê derê bê kirin.” Li mala jêr ode ji textên nivînên duqatî pêk dihat. Mala li qata jorîn jixwe bi temamî qada bêhnvedanê bû. Min got “taximeke qoltixan, televîzyonek, midbexek heye jê pê ve tiştêkî din nîne.” Ji min re gotin “rojname nivîsandibû”. Dûre ez pê hesiyam ku, zarûyekê ji mêvanxaneyê gotiye “ez karê seksê dikim û mişteriyên xwe jî ji cihên mîna baran peyda dikim”. Vê peyvê ji xwe re kirine mahnî gotine qey li mêvanxaneyê fihuş tê kirin. Te di wek ku mişteriyên xwe peyda bikin bînin vê derê ji xwe re kirine sedem. Dîyar e fahmeke wiha hatiye afirandin. Ez bin çav kirim. Di binçavkirinê de, gelek tiştên eletewş, gelek tiştên giran min dîtî, tûşî destdirêjiya cinsî bûm. Dotira rojê hat. Ber bi nivrokî ez berdam.

Dema vegeeriyam mêvanxaneyê, ciwan hemû runiştibûn, li benda min bûn. Hin ji wan girîyabûn, hin ji wan tarûmar bûbûn, pir tirsîyabûn. Di nav wan de yên tirkîzan hebûn. Min ji wan re behsa tiştên bûyî, tiştên serhatî vegotin. Min go “em ê gilîdar bin ji ber ku ev kiryar ne zagonî ye. Piştî ku ew ê tirkîzan ji yên din re wergerand, yek ji ciwanan go “heger xwaka Pinar gilî bike, ewê me dersînor bikin, ewê me li welatê me vegeerînin ji ber ku kaxizên me nîn in, nasnameyên me nîne.” Mînak, ez wê kêliyê qet ji bîr nakim, gelekî jandar bû, pirr zehmet bû. Min dev ji xwe berda, ji bo van hemû tiştên serhatî tu tişt ji dest nayê. Tiştên wan li te kirî kar e li cem wan. Ji bo ku tiştêkî neyê serê wan ên li mêvanxaneyê, dikevî rewşeke wiha ku êdî tu bi kêrî tu tiştî nayê. Pir wext di ser vê bûyera bi serê me de hatî derbas nebû, ber bi nivê meha kanûna paşîn ve, vê carê zîlamên bi rî û şaşîk avêtin ser mêvanxaneyê, derî şikandin. Min, tam di wê kêliyê de, ji bo sûdawerîya mêvanxaneyê transan li

Taksîmê li barekê partîya hevkarîyê li dar xistibû. Bi dahatên partîyê, me kîlîtên şikestî yên derîyan nû kirin. Min wêneyên mêvanxaneyê yên piştî wan bûyeran di hesaba xwe ya Facebookê de par ve kirin. Hîna jî di hesaba min de xuyaye. Di wê êrîşê de derîyên me şikestin, me kîlîtên wan guhertin. Ew qas êş, ew çend tiştên giran hatin jîyîn ku... Ev tevde dema ketin ser hev, êdî bêhna min nemabû ku li ber xwe bidim. Ez di halekê werê de bûm te dest bavêta ku derê, dê bişkesta. Piştî jîyîna ew qas bûyeran, derûniya min serobino bibû, kar û bar ji dilê min nedihat. Di wê pêvajoyê de, ji gelek sazîyan, bi taybetî ji gelek sazîyên civata sîvîl ên ku dewlet li piştî wan bû (ji wan sazîyên ku pîrî caran LGBTÎyên penaber ji me re dişandin) min piştgirî xwestin. Kesên li mêvanxaneyê diman pêdivîya wan bi piştgirîya derûnî hebû. Di warê tenduristîyê de pêdivîyên wan hebûn. Di gelek waran de pêdivîya wan bi piştgirîyan hebû. Mixabin pîrî caran min ji wan jî bersiv negirtin ji bo peyamên xwe. Deng nedan telefonên min. Li mailên min venegerîyan. Daxwazên min ên civînan nehatin qebûl kirin. Li Beyoglu yê tevli kermêseke ku ji mirovên gelek xweşik pêk dihat, bûm. Sazîyeke li wê derê hebû me hevkarîyê di nav xwe de saz kir. Ji berhemên xwe raberî min kirin. Min jî kermes bi kermesan gerîyam min hewl da ku wan tiştan bifiroşim û ji bo mêvanxaneyê dahatîyan bi dest bixim. Tevde çareserîyên demkî bûn. Bi pereyên dahatî encax me sarınca mêvanxaneyê dadigirt. Gava hewce dibû, mirovên ku bi rastî jî pêdivîya wan hebûna me xercaneya wan dida. Bi rewîştî xwe, hema hema wiha min hewl da ku çareserîyan biafirîm, lê belê êdî qidûma min jî dest bi şikestinê kiribû. Peritîm. Her tişt li min giran dihat. Rewşa min nema dikarî serhatîyan ragire.

Wê gavê televîzyona BBCyê ji bo ku di derbarê min de belgefilmek bikşîne bi min re ket têkîliyê û hatin Tirkîyeyê. Li Taksîmê di apartekê de diman. Bi koma belgefilmê re me hefteyek bi hevdu re derbas kir. Tevaya hefteyekê hema bêje hefteyê bîst û car seat em bi hev re bûn. Bi şev ez li mêvanxaneyê bûm, bi roj sax bi wan re bûm. Serê sibehê bi tavila şîyarbûnê re em dihatin cem hev. Bi vê yekê re, rûtînên min ên rojane, her tiştên min tomar kirin. Bi saya serê yeka ji wê koma belgefilmê aneha ez li vê derê me. Hevala hanê ji min re got “Pinar ev hefteyekê bi te re me. Her tiştî dibînim, serwextê her tiştî me êdî vê yekê

li xwe neke. Divê tu li xwe jî li jîyana xwe jî bifikrî.” Ji ber ku her tişt bi rastî jî gelekî zehmet bû û ez bi saya piştgirîya aborî ya vê hevalê hatim vê derê, Swîsreyê. Bileta min a teyarê wê bi xwe stand.

Her wekî din min ji hin kesên pir xas, her wiha piştgirîyên madî ji wergirtin ku ez ê heqê wan (ez nav nedim, dibe ku nexwazin navên wan belav bibe) ji bîr nekim. Min ew piştgirî nedîtina dibe ku ji zûde bibûma qurbanîya kujerîyeke kiryardenas. Eve pir zelal e. Bi ser de ez ji sîyaseta kurdî tîm. Bi nasnava xwe ya vekirî ya transan di nav sîyaseta kurdî de bûm û jixwe ji bo dewletê kana nefretê bûm. Ez ji bo wan terorîsteke potansiyel bûm. Sedemeke din jî ev bû: Mêvanxaneya transan li cihekî pir qamûyî, bêparastin û vekirî bû. Helbet, di destpêkê de veşaribûna wê pêkhat lê belê hat astekê wiha ku êdî eşkere bû, bû cihekî werê ku her kes pê dizanî. Bû qadeke werê ku ji sîmîtfiroşên kolanan bigrin heya wan kesên ji rê derbas dibin her kes pê dizanî, êdî canê her çi mirovî bixwesta bi rihetî dikaribû li derî bixe bikeve hundir.

Rojnameya Akîtê di nûçeya xwe ya mişt nefret de dîmenên min ên ji hevpeyvîneke min a bi rojnameya bîyanî re bi kar anîn. Dewlet, civat û çapemenîya transFOBİK û homofobİK nefret û tundîya ku dixwestin li LGBTÎ+an bikin, li mêvanxaneya berbiçav û bêparastin, li kesên wê derê kirin. Gava ku hewce bû, hedef nîşan dan, gava ku hewce bû avêtin ser mêvanxaneyê. Li pey ew qas bûyeran ez mecbûr mam ku koç bikim. Her tişt di nav mehekê de bû û qedîya. Min serî li vîzeyaya Yewnanistanê da. Min nedizanî gelo wê vîze derkeve an na. Çimkî di wan demên serilêdana vîzeyê de karekî min ê bi sîxortayê nîn bû, li bankeyan hema parikî pere jî nîn bû. Nasekî hevalê min, bila her sax be, pereyên wê li ser hev hebûn. Serê pêşî ji bo min me hesaba dolarê vekir. Me bi demkî pere kir wê hesabê û me serilêdana vîzeyê bi dekonta wê derê kir. Her tiştên me ew çend bêpîlan bû ku... Gelo ewê vîze bidana min an na qet fikra min nîn bû. Di wê gavê de, kêşana belgefilma ku min behs kir qedîya û ekîb vegeerîya welatê xwe. Du roj şûnde, hevalê derhêner li min gerîya. Got “Pinar ez nikarim debar bikim, ez dibêm divê pêvajoyê de lazim e pişt te bigrim” û cardin vegeerîya Stenbolê. Sibehekê ji navenda serilêdana vîzeyê peyamek hat. Digot: “Serilêdana we bi encam bû, hûn

dikarin bèn û pasaporta xwe werbigrin”. Min li telefona hevala xwe xist, em li hev civîyan. Nemabû em her du jî kela canê xwe bimirin. Em hatin ber derîyê navenda vîzeyê lê belê ji min nedihat têkevim hundir. Ew çend bi stres bûm ku... Dûre em bi hevdu re ketin hundir. Di wê gavê de wê jî bi kamêrayê tomar dikir. Qefaltina kamêrayê hat xwestin, me girt. Min cizdana nasnameyê ji bo karmendê gişeyê dirêj kir. Lê venêrî, pasaport da min. Min destê xwe danî ser pasaportê, lê bi tu hawî nikaribûm werbigrim, ew çend bi kelecana bûm. Min li hevala kêlekê xwe nêrî, dûre li pasaportê nêrî. Hevala min ji min re got “hela pasaportê veke”. Pasaport ji destê min girt û vekir. Bîskek li rûyê min nêrî û dest bi girînê kir. Em her du jî ji kêfan digirîyan. Bi milê min girt, kêlîyekê ji hiş çûbûm. Em derketin derve. Av, kolonya bi ser rû û rûçikên xwe... Hê jî me bawer nedikir. Derketina vîzeyê, li şaneyeke mejîyê min jî neketibû. Kêlîya herî girîng ya jîyana min bû, ew kêlî. Şeva balafira min a bo Yewnanistanê ez birim balafirgehê.

Balafir wê seat 06.00an de bifirîya. Ji ber ku seatên ber destê sibehê bû, bêyî xatirxwestinê ji mêvanxaneyê derketim. Bi caran vegeirîyam, min li paş xwe nêrî. Ji xwe ve fikirîm, min go “gelo ez ê carekî din karibim vê derê bibînim, ez ê karibim cardin vegerim vê derê, an jî ewê çî bi serê vir bê.” Min ji kesî xatir nexwest. Çimkî ev jî bo min tiştêkî pirr zehmet bû. Çûm balafirgehê. Dema ez li balafirê siwar bûm hê jî haya min ji tu tiştî tune bû. Yanî her tişt ew çend şîlo bû ku... Li nav balafirê li ser mêvanxaneyê difikirîm. Ez tim li van tiştan difikirîm: “Gelo ewê çî bibe, ewê çî bikin ev ciwanên hanê?”

Dema li Yewnanistanê daketim, hema min oxîneke kûr kişand! Berî hatinê, min li gelek tiştan vekolabû, di derbarê hiqûqa koçê de min gelek tişt xwendibûn. Mînak, gotibûn: “Bi vîzeyê Yewnanistanê bes tu dikarî li Yewnanistanê bimînî, tu nikari derbasî welatêkî duyemîn bibî.” Dûre te di Peymana Dublinê³ heye. Ji ber ku wek welatê ewil yê ku ez hatimê Yewnanistan bû, welatê duyemîn ê ku ez biçûma jî dibe ku ez paş ve vegeandama. Ji ber vê sedemê, di hişê min de gelek tevlihevi hebûn. Min tu tişt fahm nekir, her tişt bi awayekî lez û bez pêk dihat û

3 Peymana ku karên penaberîyê di berpirsiyariya kijan welatî de ye diyar dike.

ji bo min gelekî nediyarî hebûn. Kêliya ku bi rastî jî min go “Pinar êdî tu xelas bûyî” ew kêlî bû ku ez daketim Swîsreyê û ji venêrîna ewil ya pasaportan derbas bûm. Li Swîsreyê peywirdarê venêrîna pasaportê, bes bi serê çavê xwe li pasaporta min nêrî, derbas bû. Tam ez ê ji deriyê giştî derketema, min dît ku karmendekî polis ji dû min ve tê. Go “bibore”. Ez vegeyîyam pişt xwe min go “kerem ke.” Ji min re go “hûn ji ku tên, gelo ez dikarim li pasaporta we vebinêrim?” Min jî go “helbet.” Min derxist pasaporta xwe şanî wî da. Go “ji kerema xwe re tu karî bi vir de bêyî?” Dûre li balafirgeha Swîsreyê, ez ber bi paş de birim odeyekê. Li wê derê valêza min vekirin, hûr û kûr lê venêrîn. Pirsra tiryakan ji min kirin bê ka ez bi kar tînim an na. Min go “na”. Dîsa jî ez test kirim. Bi qasî deh deqîqeyan, ez bi wî awayî sekinandim. Ji bo min ew deh deqîqa wek deh salan bû, qet ji bîra min naçe. Dûre gotin “em lêborînê ji te dixwazin, tu dikarî biçî”. Ji wê derê derketim û min go “bi rastî jî qedîya.” Her tişt xelas bû û her tişt li paş ma, yanî serhatiyên min û hîskirinên min. Tam wiha qewimî.

Pêvajoya ku li vir hat serê min girîngtir e. Ji bo jinekê, ji bo jineke trans tu derê cihanê ne bihuşt e. Yekcar divê mirov vê zanibe. Hûn herin Hollandayê jî ev wiha ye, hûn herin Brîtanayê jî. Swîsreya ku aneha lê me bix we jî daxilê vê yekê ye. Bi ser de tiştêkî werê jî heye, tu nikarî tu tiştî biki giştîkar. Serhatiyên her kesî yekta ye, ezmûna her kesî zêde bi xwe ve ye. Mînak tiştêk hatibe serê min, qaîdeyek nîne ku bi heman rengî bê serê yekê din jî. Ango min hin tiştan bi hêsanî jiyabe -ez nikarim bêjim pir hêsanî bûn- ev bi xwe ezmûneke pir takekesî ye. Bi çendî hêzbûna te ve, bi çendî xwînsariya te ve, bi çendî hayjêbûna te ya li ser tiştan ve pir girêdayî ye. Yek ji wan jî ji ne bi serê xwe ve ye.

Koçkirin zehmet bû, hê jî zehmet tê li min. Lê belê lazim e kevanekî deynim vê derê. Di nav Swîsreyê de dewletên dîtir hene. Mînak ez li Cinêv im. Kantona Cinêvê xwedan zagona xwe û şêweya xwe ya rêveberîne ye. Kantoneke din jî xwedan zagona xwe û şêweya xwe ya rêveberîne ye. Di pêvajoya penaberîyê de ji ber ku navenda serîlêdanê li paytexta Swîsre, li Bernê bû ewilî hatim wê derê. Piştî serîlêdana wê derê bi sê rojan pê ve car bi car min ji xwe re digot “gelo ez vegeyrim Tirkîyê.”

Dema dikevî navendê, te dixin bin zextên derûnî, lêpîrsîna te dikin, li valêza te vedinêrin. Di hemdê xwe de tiştên xwezayî bin jî di wê kêlîyê de ev hemû li te pir giran tî. Jineke tirkîzan alîkarîya min kir. Navenda ku ez lê dimam, navendeke mezin bû û ez dam kata yanzdemîn. Her roj divê yanzdeh kat derketama. Çimkî li wê derê penaber nikarin asansoran bi kar binin. Bes personel dikarin bi kar binin. Ji bo ku personel bikarbînin jî qerdên wan ên taybet hebûn. Roja ewil dema çûm wê derê, jinika li cem min bi qerda xwe ez derxistim kata yanzdemîn. Ez birim odê, bi cî kirim. Go “fermo odeya te.” Li odeyê tu tişt nîn bû. Piştî çûyîna odeyê jinik go “ez ê te li navendê bigerînim.” Balkêş e, li avahîyê cihê ewil ez gerandim, Navenda Şûnveşandinê bû. Go “heger tu bixwazî, bi daxwaza xwe vegeerî dikarî werî vê derê û bi ser de alîkarîya madî jî bi te tê kirin.” Min go “çi eleqe?”. Min go “helbet naxwazim vegeerim.” Dûre ez pêhesîyam, bergînda van hemû tiştan heye û ev tişt giş helbet ji bo pêkanîna çewisandinê ne. Piştî destpêkirina jîyana li vê derê her tişt zehmettir bû. Her roj ji bo xwaringehê ji kata yanzdehan dadikevî qata sisê ya li bin sifirê. Li wê derê ew çend bi disîplîn in ku di navbera seatên 06.45 û 07.30an de taştê heye, tu dereng bimînî taştê çû. Xwarin û odeyekê didin. Tu li kata yanzdehan î û şibake gişt bi tîlan dorpeçkirî ne. Wek tîpa F ya girtîgeha vekirî bifikrin. Balkêş bû. Yanî, textên razanê hene, daşir hene, divê serşokan hevpar bi kar binî. Li navenda serilêdanê heftane 7 frank pere didin. Ango rojane dike frankeke swîsreyî! Dibêjin “ji xwe hûn rojê sê danan li vê derê dixwîn, pêdivîya we bi pere nîne”. Rast e. Wekî din pê divîya mirov bi çi dibe...

Di vê navê de, qerdeke demkî didin. Perçeke kaxizîn a demkî. Dema tu yê derkevî derve şanî ewlekaran didî, ewlekarî ew pesend dike. Tu ji bo cîxareyê derkevî derve jî. Pergaleke wiha danîne: tu ji deriyekî dikarî derkevî lê nikarî ji heman deriyê bikevî hundir. Bi awayekî balkêş di her ketin û derketinê de hema bêje li derdora tevaya avahîyê divê bizîvirî. Wek mişkên kobayî li derdora avahîyê zir dizîvirî. Tu, kaxiz şanî ewlekarîyê didî, ewlekar lê dinêre dibêje “temam” û destûr dide. Mînak heger tu ji Navendê derkevî bi destûr herî cihekî êvarê di seateke dîyar de lazim e tu vegeerî. Heger tu venegerî cardin nikarî bikevîyê. Tu di kata yanzdehan de yî, her tim mecbur î ji pêlpêlokên diçî û tîyî.

Min çend caran hewl da li xwaringehê nan bixwim. Li navenda ez lê bûm ji welatên cur be cur mirov hebûn û ew mirov transfobik bûn. Ez dadikevim xwaringehê ji nişka ve her kes dahv li hevdu dide, li min dinêrin. Yek li destên min vedinêre, yek li piyên min dinêre, te di tu nikarî nan jî bixwî. Min nekarî bi sê rojan nan bixwim. Piştî van bûyeran ez qet daneketim jêr. Min ji peywirdarekî tirkîzan re qala vê rewşê kir. Min qala serhatiyên xwe kir û min go “ji ber van bûyeran ez nikarim dakevim xwarinê.” Jixwe dilê min nedîçû tiştêkî. Ji hêla derûnî ve min şerekî pir dijwar dikir. Di vê navê de ketibûm rewşeke zivar zivarî. Ez bi rayedaran re peyivîm û dûre destûr dan ku bikaribim li odeya xwe nan bixwim. Bi vî rengî cihêkarîyeke pozîtîf li min hat kirin. Ez dadiketim jêr da ku xwarina xwe bistînim, min xwarina xwe distend derdiketim kata yanzdemîn. Min ev pirsgirêk bi awayekî demkî wiha çareser kiribû.

Dûre.. Ji bo hevdîtina ewil bang li min kirin. Di vê hevdîtinê de, gelek pirsên cuda ji min kirin: tu çawa hatî vê derê, di çi şert û mercan de hatî, ji ber çi hatî. Min hemû çirokên xwe vegotin. Komeleya li vê derê gelekî alîkarîya min kir. Bi hin çalakvanan re, ji serdemên Tirkîyeyê naskirîya me hebû. Bi saya nameyên referansê yên wan bicikirina min a li Kantona Cinêvê hat qebûl kirin. Çimkî, peyv di cî de, li ser çiyayê jî, li kantoneke Xê jî dibe ku bihatama şandin. Gelo bi hatina Cinêvê re hemû pirsgirêkên min qedîyan, gelo her tişt pir xweş bû? Helbet na. Lê tiştêkî werê heye ku li Ewropayê kampên penaberan hema bêje tevde pir dûrî navendên bajaran in. Kampa li Cinêvê parikî nêzî navenda bajêr e. Li Zûrîh, Bern û Baselê an jî li kantonên din kampên penaberan li cihên dûrtir in. Mînak kampa Kantona Appenzellê li binê Alpan e. Li gundekî çiyê. Yanî çûnûhatin bi rastî jî bi kote ye. Rojê tenê sê çar seferên otobêsan hene. Ew jî ji du seatan carekî ne. Li ser lûtkeya çiyê sosyalbûn ne pêkan e, tu îzole dibî. Kampa Cinêvê ya ku serê ewil ez şandim wê derê jî li serîyekî din ê bajêr bû. Belê, Cinêv bajarekî biçûk e. Ji Stenbolê biçûktir e lê ez di ser Stenbolê re mînakê bidim, bifikirin ku kampa penaberan li Silîvrîyê be, navenda bajêr ta li Kadikoy be; ew çend dûr e. Piştî hatina vê derê min go “ez şerşoka ku her kes bi kar tîne bi kar naynim.” Bi sedema ku ez jineke trans bûm werê cihêkarîyeke pozîtîf li min kirin: ez li odeyeke ku tê de şerşok hebû bi cî kirim. Odeyeke ku tê de şerşok hebû dan min, lê belê midbex hevpar bû. Dîsa, ji bo ku ez

ji wan çavên transfobîk aciz dibûm, ez bi xwarina konsêrveyan di ser xwe re mam. Min ji ber sedemên paqijîyê jî midbex bi kar nedianî. Ji ber sedema hewlestên mirovan, ji ber gelek sedeman min nedikarî bi kar binim. Yanî li kampa Cinêvê ji heman pirsgirêk hebûn. Tu ew çend li derveyî bajêr î, li cihêkî ew çend dûr î ku derbarê tu tiştî de fikra te nîne: Rawestgehên otobêsan li ku ne, mirov çawa diçe bajêr, yekcar tu zimên nizanî. Astenga zimên heye. Lewma jî, bi tevaya du meh û nîvan, ji odeya kampê derneketim. Pir zehmet bû.

Pirsgirêke weha heye: Cihêkarî li her derê dinyayê heye. Hew ku tu jin bî, hew ku bi ser de tu jineke trans bî... Vê dawîyê, li mekteba ku lê me tûşî cihêkarîyê bûm. Li vê derê wek mînak tu vêya dibînî; tu dikarî behsa cihêkarîya serhatî û tûşbûyîna xwe bikî û piştî ku tu behs dikî pê ve jî derbarê vê yekê de çareserîyek tê pey dakirin. Hêleka wê ya wiha baş heye. Belê cihêkarî li her derî heye, li vê derê psîkyatr jî, seksolog jî, şewirmenda min jî dibêjin: Cihêkarî li her derî heye. Belê. Tu li vê derê bergînda wan tiştên hatine serê xwe dibînî. Ev tişt li cem xelkê nabe kar. Derbarê vê yekê de mûeyîdeyek tê sepandin, dikarin ceza jî li mirovan bibirin. Mînak ez bi vê yekê metel mabûm. Ez ew çend hîn nebûme ku dikim bawer nekim. Li vê derê bi yekê peywirdar re pirsgirêka min a cidî çêbû û li ser wan tiştên ku hatin serê min, ez bi kesên hewcedar re peyivîm. Ji min re gotin “ji bo ku ev tişt hatîye serê te em gelekî xemgîn in û çî divê bêkîrin em ê bikin.” Bi rastî jî kirin. Ez hîna jî di asta penaberîyê de me. Ev tiştêkî gelekî zehmet e û naxwazim bi dewletê re pêwendîya min ne xweş bibe. Naxwazim di çavê dewletê de bibim yekê arîşedar. Çimkî daxbûyîn tiştêkî zehmet e. Ez vê yekê ji Tirkîyeyê ve dizanim. Ez birra jî baş dizanim di çavê dewletê de kesek arîşedar be, weke sûcdar bê dîtîna û bi vê yekê re jîyana xwe bidomîne tê çî wateyê. Bo mînak dema tu diçî Taksîmê filan, GBTyê [Tomarkirina Agahîyên Giştî] xelkê sî çirke ye ê min deh panzdeh deqîqe filan didome. Ev timî daîm wiha bû. Te dî, hejmara binçavkirina min bê ser û ber e, ez bi xwe jî nizanim êdî. Ev binçavkirin pirî cara kêfî bûn. Ji ber ku min nedixwest li Swîsreyê di çavê dewletê de bibim yeka “xerab”, serdemên ewil ez ji ber wê pirsgirêka xwe ya bi peywirdar e bêdeng mam. Ji ber ezmûnên min ên li Tirkîyeyê qewîmin tê [ev helwesta bêdengbûnê]. Dûre ez çûm cem rayedarekî û pê re peyivîm. Min behs kir û bi awayekî bi lez û bez çareserî dîtîna: Ew

kes ji wir hat birdûrxistin. Temam, ez vê yekê jî dizanim, tiştêkî werê nîne ku wê her dem ji sedî sed bi vî rengî çareser bibe. Min kesên ku digotin “li vî welatî transfobî nîne” jî dîtî. Ez pê bawer im ku wê hin kes derkevin bibêjin “li vî welatî homofobî nîne”, hin kes jî wê bibêjin “li vî welatî transfobî pêk nayê.” Li Tirkîyeyê jî heman tişt tê gotin, dibêjin “cana’m li Tirkîyeyê transfobî nîne.” Çimkî li Tirkîyeyê xuyanîya transan nîne. Trans wek ku tune bin têne hesabandin. Lewma cihêkariya li ser derdorekî nexuyayî jî nikare diyar bibe. Belê, li vê derê trans xuya ne, têne zanîn. Zagon hene. Vê dawîyê di referandomê de wekhevîya zewacê hat pesendkirin. Belê li vê derê ferq bi tenê ev e: Têne xuyakirin, têne zanîn. Lê belê dîsa jî mejîyê tîpîk ê ewropayî, ewropayîbûna spî pêdivî bi vê gotinê dibîne: “Li vê derê transfobî pêk nayê”, lê belê pêk tê.

Li ser penaberî û koçê vana bibêjin: Koçkirin û bi awayekî penaberiyên piştî temena çilî wek ya min bi rastî jî zehmet e. Gelek tişt hatin serê min. Piştî çil salîyê tu bi kalbûnê dihesî. Hêdî hêdî, bi giranî pêş ve diçî. Jixweber motîvasiyona jîyanê jî dadikeve û her tişt zehmettir tê li mirov. Tiştên ku di ciwanîyê de hêsan in ber bi temenên mezin ve ve zehmettir dibin. Kî çi bibêje bi ya xwe ye lê penaberî zehmetirîn ezmûna cihanê ye. Mînak homoseksûelekî an jî homoseksûelekê li Amerîkayê diçe San Fransîskoyê jî ev zehmetirîn ezûmana cihanê ye. Hevaleke min penahendeyê Amerîkayê bû, ez ji serhatiyên wê ve baş dizanim. Hevaleke min a din, trans, bi peyva “wê pir hêsantir be û wê pir baştir bibe” çû Hollandayê, ez dizanim bê çi hatin serê wê. Ji ber vê yekê penaberî zehmetirîn statûya cihanê ye. Bila nebêjin “ox çi xweş, Pinar çû û filitî”. Her tişt ew çend zor e ku... Piştî hatinê astengîya zimên heye, çewisandina psikolojîk heye û gelek tiştên ku te li paş xwe hiştine hene. Belê, min gelek tişt li pey xwe nehiştine lê belê diya min heye wek mînak. Ji bo min pir zehmet bû hiştina diya min a ku li dinyayê heyîna min a tekane ye. Ev pêvajoyê him bi laşî him jî bi gîyanî pêvajoyeke zehmet e. Serê pêşî divê tu xwedan derûnîyeyeke pir xurt bî. Him bi mentalî him jî bi gîyanî divê tu pir zexm bî. Çimkî tu gelek diwestî û pir diperitî. Bila qet nekevin wê xeletîya ku bi xemên aborî têne vê derê. Ez ne bawer im hevalên LGBTÎ bi xemên aborî dest bi rê bikin. Belê dewlet alîkariya min dike. Ji dewleta sosyal alîkarî digrim. Belê ez di maleke dewletê de

dijîm. Belê dewlet ji bo ku nemirim parikî pere dide min lê belê divê mirov tiştêkî wiha bifikre: Li vê derê jîndemayîn him bi aborî him jî bi psikolojîkî gelekî zehmet e. Jê pê ve, bi rastî jî li ser navê xwe dibêjim, ez ew qas mecbûr nemama, nedihatim vê pêngava dawî. Min ê qet fikra tiştêkî wiha nekira.

Şeva ku ez ê ji Tirkîyeyê veqetiyama, li balafirgehê dema bi dîya xwe re dipeyvîm li ser vê fikirîm: Dema min karê seksê dikir dîya min qet nedizani. Û ez her roj, berî ku ji bona kar derkevim, li dîya xwe digeriyam min dengê wê dibihîst. Ji ber ku ez weha difikirim: “Dibe ku îşev bême kuştin”. Min bi tirs “îşev wê tiştêk bê serê min ez ê cardin nikaribim dengê dîya xwe seh bikim” jîyana xwe didomand. Ev timî daîm wiha bû. Ew roja ku li dîya xwe geriyam jî di heman derûnîyê de bûm. Min baş zanibû ez ê cardin nikaribim dîya xwe bibinim. Min ji dîya xwe re behsa wê yekê kir ku tiştêkî bê serê wê ez ê nikaribim cardin werim, ez ê nikaribim cardin li cem wê bim. Ew jî ji min re gotibû: “Tu baş be, aram be, bextewar be, ewle be, ji bo min a girîng ev in. Taliyê em hemû mirov in, emrê me hemûyan dîyar e, a girîng ew e tu jîyana xwe ya mayî di ewlehîyê de derbas bikî. Ez jî naxwazim her roj bi tirs xebera gelo ew ê bê kuştin bijîm.” Bes ji ber vê yekê jî, li vî welatî bi ewle me. Ez baş dizanim ku seateke nivê şevê ew ê peywardarekî ewlehîyê bi şikandina derî re nekeve hundir. Ez baş dizanim li vê derê li hemberî êrîşekê, li hemberî nefretê hin mirov hene wê alîkariya min bikin. Piştî hatina vê derê, eve salek û niv e ez dikarim rakevim. Li Tirkîyeyê min nedizani bê xew tiştêkî çawa ye. Jîyana her bi tirs, her bi endîşeya ku wê çi bibe gelekî zehmet bû. Ji ber wan serdemên karkeriya seksê jixwe bi şev pirsgirêka min a xewê hebû. Di wan serdeman de ez bi roj radiketim, bi şev ji piya bûm. Lê anha bi şev radikevim. Ev jî hesteke çendî xweş e ku... Min li vê derê fahm kir bê raketina şevê tê çi wateyê. Wek ku min got, ez xwe di ewlehîyê de hîs dikim. Nikarim vegerim Tirkîyeyê. Bi dirêjîya jîyana xwe min ji bo xwe tiştêk nekir an jî tu carî nebûm miroveke xwehez lê belê di vê babetê de, belê, di dirêjîya jîyana xwe de cara ewil ez li xwe difikirim û bi temamî ji bo xwe vê yekê dikim. Ji ber vê sedemê ez ê qet li vegeerê nefikirim.

Li Tirkîyeyê Tu Kes Sûrîyeyîyan Naxwaze Ne Wisa?

Ez Demhat Bella,

Berî di nav tevgera LGBTÎ+an de bi rêxistinî bibim di nav tevgera jina kurdan de û di nav tevgera siyasî ya kurdan de jineke trans a rêxistibûyî û têkoşîner bûm. Yanê ez dikarim bêjim ez ji wê derê parikî hînê têkoşinê bûm. Hêdî hêdî piştî hayjêbûna nasnava xwe ya cinsî û piştî redkirina nasnava “mêr” a civakê min fahm kir ku divê ez li ser nasnava xwe ya cinsî têbikoşim. Dûre min têkoşîna xwe di nav tevgera transan de guhast rewşeke din. Di vê mijarê de wek ku hûn jî dizanin li Tirkîyeyê transbûn, transbûneke berbiçav pir zehmet e. A rastî bi ya min cihê destpêkirina çîroka min, tiştê ku xwebûna min saz kiriye ev der e. Ji malbateke bi deh zarokî ya kurd zarokeke trans im. Ji destê min nehat ez zankoyê biqedînim. Çimkî zankoya min hebekî faşîst û neteweperest bû û ji ber vê yekê jî mecbûr mam ku dev ji zankoyê berdim. Bala xwe didim hunerê, bi performansê mijûl dibim. Piştî hatina vê derê min dest bi çêkirina mûzîkê kir. Weke DJ dişuxilim. Bi saya vê yekê dibêmin min têkoşîna xwe veguhast cihêkî din, merhaleyeke din. Di her merhaleya jiyana xwe de min hewl da têkoşîna xwe gavek bi jor de bikim. Li vê derê bi eleqeya hunerê re min ew huner bi têkoşinê re anî ba hev. Aneha heger ez xwe pênase bikim, ez ê bêjim “ez jineke kurd, trans û penaber im.”

Li Tirkîyeyê heger mirov di tevgera LGBTÎ+an de berbiçav be, geyeke pir jinane be, lezbiyeneke butch¹ be, trans be an jî xwe bi tiştêkî din pênase bike ji aliyê LGBTÎ+fobîkan ve mahkûmê tundîya mişt nefret heta mahkûmê mirinê ye. Yanê heger mirov xwe li pişt perdeya tiştina veneşêre -naxwazim li vê derê şaş bê fahmkirin, mirov karê xwe li pişt perdeya tiştina veşêre- heger xwe weke tiştêkî din pênase bike û di nav tabûyên civakî de cî negire, dibe ku bi her cûre tundî û nefretên cûda re

¹ Di heyama îroyîn de di nav lezbiyanan de bêtirî ji bo derbirina zayenda maskûlen tê bikaranîn.

rû bi rû bibe. Heta dibe ku bê kuştin. Piştî min xwe weke trans eşkere kir, di nav yekemîn xwe-rêxistinîya trans a Tirkîyeyê de min dest bi derbirîna hebûna xwe kir. Demeke şûn de ez bûm sûreta berbiçav a wê rêxistinê. Him ji hêla transan him jî ji hêla polîsan ve di Meşên Rûmetê de bûm hedefa wan. Li Meclîsê ji bo Hande Kader komekê daxwaza civînê dikir ez jî di nav wê komê de bûm. Carinan ez diketim halê kesekî wiha ku di Facebookê de an jî di medyayên din ên civakî de vîdyoyên wê bi hezaran kesan ve dihat temaşekirin. Dema li Sûrê komkujîya kurdan pêk dihat weke kurdekê ji bona hevkarîyê çûm Amedê. Yanê her li ku derê têkoşîn hebûya ez diçûm wê derê. Ev tiştên hanê, bi dilê min an bêyî dilê min kirin ku bême naskirin. Bi tenê politikayeye min hebû: “Ez trans im, ez takekeseke vê civakê me, parçeyeye wê me û li vê derê me.”

Dema min ev xebat dikirin bi tenê hêmanek min paş guh kiribû, ew jî ewlehîya canê min bû. Him ji aliyê civakê ve him jî aliyê malbatê ve him jî ji aliyê mêrên qet nenas ên li kolanan ve ev gefxwarineke arasteyî min bû. Ez di rewşeke welê de bûm, min ewlehîya canê xwe paş guh kiribû ji ber ku bi tenê tiştêkî di bala min de bû: Têkoşîna min! Divê min têkoşîna nasnava xwe ya transê bikira, ji bo wan her kesên weke min.

Piştî ku ev rewş di medya civakî de, heta di kanalên (li CNNê) neteweyî, li rojnameyan (li Milliyetê) derket şûn de gefên malbata min hêdî hêdî dest pê kirin. Seba ku min çalakvanîya transan dikir ez di çavê polîsan de bûbûm yeka jênehez. Çimkî ez bi karkerên seksê re dixebitim. Ev der qadeke ji tundiyê re vekirî ye, carinan ji polîsan carina ji mêrên nenas, carîna jî ji malbatê. Ji bo ku em vê tundiyê bidin xuyakirin seat sisê, çarê nivî şevê mecbûr dimam diçûm qereqolan bi polîsan re pevdiçûm. Polîs, di pevçûneke ji wan pevçûnan de wiha gotibû: “Jixwe ez ji abalan [a cinsî] hez nakim, tew ji abalên jîrok qet hez nakim.”

Li pey vê bûyerê, polîsan hêdî hêdî dest bi gefan kiribûn li min. Gava gefên malbata min a ku zanîbûn ez kî me jî lê zêde bû êdî ji du aliyên cûda gefên li min dest pê kiribûn. Mesela, navnîşana min li Enqerê bû. Dema min serî li neştergerîya “guherîna zayendî” -ez vê dixim nav dunikan- da her ku navnîşana min a niştecihiyê li Enqerê bû jî polîsan kaxiza dadgehê ji malbata min re şand. A rastî xwestibûn bi awayekî ji min re wiha bibêjin:

“Ger tu ji rêya ku ez naxwazim, min nîşan nedabe, min qebûl nekiribe bimeşî ez ê jî giliya te li cem malbata te bikim.” Çimkî polîsan zanîbûn ku malbata min kurd e, di malbata min de heft zilamên ji min mezintir hene. Zanîbûn ew ê ev zilam di derheqê min de biryarê bigrin. Dizanîbûn ez lawê eşîra me. Polis, hikûmat û dewleta Tirkîyeyê a rastî bi vî awayê gilikirina min a li cem malbatê re bi şiklekî xwê bi “birîna” dê û kekên min de kiribûn. Lewra her tim di televîzyonê de didîtin, di medya civakî de, di Facebookê de didîtin. Herî dawî kekê min li min gerîya. Ez li cihekî rûniştî bûm, li pey gerîna wî malbat hemû yek bi yek bi telefonê li min gerîyan. Min got “çi bû, herhal yek mir.” Dema em peyivîn bi ser min de hil bûn gotin “kî bû ew ê di vîdyoyê de tu pê re peyivî? Tu bi çi kesan re digerî? Tu xwe serîyê çi dihesibinî?” Dûre qet ji bîra min naçe, dîya min hat ser telefonê û ji min re got “Ez zanim, tu bi HDPê re dixebitî (ji ber ku berîya wê min û Figen Yuksekdağê bi hev re daxûyaniya çapemeniyê dabû) û ji bo parastina mafê travestîyan tu ketiyî dirûva wan ne wisa?” Ew dem dudilîyek li cem min çêbû. Belê min dikaribû derew li dîya xwe bikim û dilê wê xweş bikim lê belê hingê min ê nasnava xwe paş guh bikira; li cihê ku mêr, dewlet, polîs nasnava me paş guh dikin, min ê jî paş guh bikira. Min di telefonê de ji dîya xwe re got “na, ew ez im û ji bo wê yekê şer dikim.” Kekê min telefon qefalt. Dûre bi awayekî ji min re wiha hat gotin: “Demhat biçe xwe rizgar bike, kekê te li Enqerê bi cî bû. Li her derî hûrehûr li te digerin, ew ê te bikujin.”

Bi sehkirina vê yekê re di jîyana min de aloziyek dest pê kir, nayê gotin. Di wê heyamê de gava min ji wê çarçoveyê li xwe nêrîbû, ez bi dilsozî bêjim, min ev gotibûn: “Min zorganî li kesî nekir, min pereyê kesî nedizî, min ji şîya kesî re nego xwar e. Min zîrar nedaye tu jîndaran. Ji ber ku min gotiye ‘bes ez ev in’, hin kes dixwazin min bikujin.” Mixabin ev jî bi hevkarîya dewlet û polîsan pêk tê. Piştî biryara dadgehê ya ku dewlet ji malbata min re şandibû şûn de dema ez bi malbata xwe re peyivîm wiha gotin: “Dewlet kaxizek ji me re şandîye lê belê me tu tişt jê fahm nekir.” Ewîlî jî dema kaxiz nû çûbû pirsîbûn gotibûn “çi dibe, tu çi diguherîni?”

Dema ez ji Tirkîyeyê veqetiyam sala 2017an bû û sedema sereke ya derketina derveyê welêt ev serhatiyên min bûn. Li gel vê yekê li Enqereyê

polisani bi hinceta ku devê we xwar e jî dikaribûn ceza li me bibirin û vî tiştî di nav me transa de em bêzar kiribûn. Mirov karê seksê bike jî neke jî dema di kolanan de bimeşe, nava rojê bi xwe jî, bi hinceta Zagona Qebhehan cezaya diravî li me dihat birin. Yanê me nedikarî biçûna karê xwe. Êdî polis bi çeteyan re dixebitîn. Çete -tê bira min nava rojê bû- gule bera piyê transekê dan. Di heyama karkerîya min a seksê de çete pirr bi ser min de hatin. Bi qasî hefteyekê çar pênc caran gule bera ber piyên min dan û dema ez çûm cem polisani tu tişt nekirin. Yanê di wan deman de cara ewil di asta candayîne de ketim xetereyê. Êdî li xaleke werê bûm ku hevalên min bi zorê digotin “divê tu biçî.” Bi ser de piştî derketina derveyî welêt bi çend mehan şûnde kekê min, ji ber ku nizane ez ji Tirîkiyeyê veqetîyame, mala hevalên min ya ku berê ez lê vedihewiyam bi awayekî peyda kiriye. Pê re li komeleyê jî geriyaye, xebatkarên komeleyê gotine “Demhat êdî li vê derê naxebite.” Dûre mala hevalê min ji aliyê kekê min ve tê serdegirtin. Ji seba vê yekê lawik mecbûr ma mala xwe guherand. Aha ji ber vê her du korerêyan, yanê korerêyên polis û malbatê, li gel wan jî tiştên hatine serê transên li Tirîkiyeyê kirin ku ji bo koçkirina Swedê ez biryar bidim.

Di pêvajoya derketina ji Tirîkiyeyê, piştî serilêdana vîzeyê bi qasî du sê hefteyan ji mal derneketim. Li ser îhtîmala ku kekê min, min zevt bike bi dirêjîya wê maweyê min rêyên koçkirinê vekola. Te dît, min li tiştên mîna “ez ê çawa vîze bigrim, heger nikaribim vîze bigrim bi rêyên qaçax be ji ez ê çawa derbas bibim.” vekola. Yanê piştî serilêdanê, min dest bi lêgerîneke baldartir li ser rêbazên din kir. Çimkî ev pêvajo pir jandar û tengezar bû ji bo min. Te dît, heger vîze derneket ez ê çi bikim? Ez rastî bibêjim min pîlana çûyîna bi rêya botan jî kir. Bi kurtî bêjim min li hemû rêyên cûda yên koçê vekola. Min qaçaxçiyên jî peyde kir, min li her tiştî pirsî. Ji ber ku di serê min de pîlanên cûda hebûn.

Ez bi hevalên xwe re peyivîm û gava ji min re gotin “êdî wextê çûyîna te hatiye” min zêde nedizani bê ez ê bi ku de biçim. (Di vê gavê de bi rastî jî di derbarê tu welatan de agahiyên min tune bûn) Bi tenê ev li cem min zelal bû, divê ez di nava du hefteyan de derketama derveyî welêt. Ez li vê yekê fikirim ku wê kîjan welat hêsantir vîze bide min, pêşî min xwest

siûda xwe ya vîzeyê biceribînîm. Balkêş e, di jîyana xwe de yekemîn serilêdana min a vîzeyê ji bo penaberîyê çêbû. Baş bû ku du hefte şûnde vîzey a min a Swedê derket. Min erêkirinê wergirtibû û du an jî sê roj piştî derketina vîzeyê ji Stenbolê hatim Swedê.

Ez bêm ser vîzey a Swêdê, ji bo wergitina vîzeyê bandora karên bi hevkarîya me û Balyozxaney a Swêdê û pêwendîyên min ên rêxistinî çêbûn. Ez dikarim bêjim, bêtir bi siûd bûm. Lewma hin heval ji min dipirsin dibên “erê te çawa vîze wergirt.” Wekî din miaşa min hebû, sîgortaya min hebû.

Dema veqetîna ji Tirkîyeyê tengezarî û stresa min a di balafirê de tê bîra min. Gava em li Swêdê daketin min karî bibêjim “ox aneha tamam e, ez li vê derê me.” Vîze û koçkirin dibe ku pir bêtengasî xuya bikin lê belê di nav sê seat û nivê di nav balafirê de min xwe ji xwe re digot “ez hîna jî li Tirkîyeyê me.” Min got “ev xewnek e.”

Di rewşên asayîyê de tu carî min li rêwîtîyên balafir an jî otobêsan de nikaribû raketama. Wê rewşa hanê ji bo min hingî bi stres û tengezarî bû ku êdî ji halê xwe ketibûm. Îcar şeva berî vê rêwîtîyê qet xew bi çavê min neketibû. Min xwe ji xwe re got “dema ez li balafirê siwar bûm dixwazim rakevim.” Lewra min nedixwest tirsên serhatî carekî din di nav balafirê de bi serê min de bîn. Bi dirêjîya rêwîtîyê di xew de çûme. Kengî balafir dest bi daketinê kir û tekerên wê li erdê ketin, bi dengê wê şîyar bûm. Wê kêliyê tişteki wiha bi bîra min xist: Berîya bi salan tevî malbata xwe me erdhêja Edeneyê dîtibû. Ew erdhêj bi bîra min xist. Wê kêliya ku tekerên balafirê li erdê ketin ji bo min erdhêjeke nû bû çimkî. Di jîyana min de xala werçerxê bû. Ew demên hanê bi bîra min xistibû. Min xwe ji xwe re got “Xwedê, min got gelo cardin erdhêj çêdibe?” Min digo qey erdhêja berî bi salan hatibû serê min, wek ku cardin dihat serê min. Dûre ez pê hesiyam ku ya rastî jixwe di nav xwe de min erdhêja herî mezin a jîyanê didît ku qet xebera min jê nîn bû. Û ew dem, balkêş e, ji alîyekî din ve hîseke wiha çêbû: Di heman demê de cara ewil di jîyana xwe de min xwe aram hîs kir. Min gotibû “o xweş li vê derê me û wê tu kesî min nekuje.” Aneha lê hay dibim ku min bi çavekî dîtiye. Malbata min an jî

polisên Tirkîyeyê tune ne li vê derê. Ez wiha fikirîm ku qe nebe wê tu kes nikaribe min li vê derê bikuje, min ew kêlî xwe aram kiribû. Ez dikarim wiha bêjim, min du hestan pev re seh kir.

Piştî hatina vê derê lê hay bûm. Li Tirkîyeyê li ser civakê ewra tirsê heye. Çimkî ew demên ku li Tirkîyeyê bombe diteqîyan, milîtanên DAÎŞê kêfa dilê xwe dikirin. Bi kurtasî derveyî nasnava cinsî li ser me hemûyan tirsek hebû. Gava ewil ez hatim vê derê li tu navendên danûstendinan, li tu cihan, li balafirgehan bi xwe jî cîhazên X-Rayê tune bûn. Demên ewil min li derveyê tu polis jî nedîtin. Hêlekê min kêf dikir. Heger mirov tiştên zilm li mirov kirî an jî êş bi mirov dayî li cihê çûyîne nebîne rihetî lê rûdinê. Rihetîyeke wiha li gel min çêbû.

Lê belê tişteki wiha hebû. Belê, hêlekê min pir rihet bû lê belê li vê derê gelo min ê têkoşîna xwe çawa bikira? Ji roja ewil de ew tirs hebû li cem min. Ji bo min nijadek nenas, skalayeke nenas ya zayendê, oleke nenas, rengêki nenas, çandêke nenas e û ez weke pitikeke nû ji diya xwe bibe, me. Tu kes jî tu tiştî rê mirov nadin. Lewra ne diya min li vir e ne jî bavê min... Te dît dema pitikek dest bi jîyanê dike hîndekareke wê (te dît ne hewceye dê û bav bin) çêdibe lê di jîyana min de tu kes nîn bû, bi tenê bûm. Ez ê xwe çawa hînî kesên vê derê bikim? Ez ê çawa xwe bidim nasîn? Di stres û metîrsîya van de bûm.

Erê li vê derê jî baş im, dikarim bêjim min xwe gihand rihetiyê. Belê ew ê tu kes li vê derê ji ber ku “ez ez im” ew ê min sûcdar nekin, ceza li min nebirin, ez ê tûşî tundiyê nebin lê belê pê re li vê derê “zayînek” pêk hat û pêdiviya vê zayîne, ya pitika zayî bi perwerdekarekê heye. Nebûyîna wê yekê jî, tenêti jî ez dixistim stresê. Ji hêlekê ve fikirîna “ox li vê derê me” û vê carê, li hêla din fikirîna “ez ê vê carê çawa ji nû ve dest pê bikim” li cem min dibû sedema destpêkirina depresyonekê.

Piştî hatina Swêdê ez bi gelek bûyeran re rû bi rû bûm. Ez nikarim bêjim Swêd welateki nijadperest e an jî welateki ne nijadperest e. Yek ji rêyên min ên têkoşîne serketina min a afirandina hawirdorekê bû ku bikaribe min bi hemû nasnavên min re qebûl bike, rêz li hemû nasnavên

min bigire. Mesela hevalên min ên Swêdî yên li vê derê ji bo ku bibin hevalên min divê ne nijadperest bin. Ji bo ku bibin hevalên min divê ne transfobîk û homofobîk bin. Ji bo ku karibin bibin hevalên min divê rêzê li wan hemû nasnavên ne wek xwe, bigirin. Li vê derê derdora min a hevalan tev de hay ji vê yekê ne.

Serdema ewil a hatina min ez li kampekî ji civakê îzolekirî dimam, kamp li cihekî wiha bû ku bêtirî nifûsa Swêdîyên emirkirî li wê herêmê diman. Li wê derê mekanek hebû. Carinan bi lubunyayên ji kampa me, em ji bo vexwarinê diçûnê. Li cem me hevaleke me ya reşik jî hebû. Jinikek hat cem me rasterast di rûyê me de got “em we li vê derê naxwazin. Ev der axa me ye, ser-reşikên naletî.” Ji ber ku ez weke jineke trans û kurd li Tirkîyeyê tûşî nijadperestî, cihêkarî û gelek cûreyên asimilasyonê bûbûm jixwe haya min ji van tiştan hebû. Lê belê li vê derê rewşeke cûda hebû.

Li wê derê bi navê “ez kurd im” asimilasyonê heye li vê derê ji ber “rengê porê te, reş e an na” mirov dikarin bi helwestên nijadperestî li hemberî te rabin. Li pey vê bûyera serhatî me bang li polîsan kir (dema mirov tê vê derê li gor rewşa ihtîmalî ya hewcehiyê hînî mirov dikin ku li polîsan bigerin. Baş bi wan didin fahmkirin: nemaze wê çawa li nexweşxaneyê bigerin, wê kengî û di çi rewşan de divê bikin.) û polîs hatin. Li vê derê peywira ewil a polîsan alikirina te ye. Nabe ku polîs transfobîk be, nijadperest be, zayendperest be, seksîst be. Polîsên vê derê (di jîyana xwe de tim kerba min ji polîsan çûye hîna ji diçe) kir ku raya min a li ser polîsan parikî biguhere. Çimkî polîs hat nehat vê pirsî: “çi bû?” Me jî yekser dest bi vegotinê kir. Dûre tavilê wan jinik avêt derve. Ji jinikê re gotin ku mafê wê ya dembihûrkê nîne li vê derê. Me giliya jinikê kir. Jinik yekser dest bi peyvan kir got “çawa dibe, ez Swêdî me!” Gotin “bibore, tu Swêdî yî lê ev nayê wê mahneyê ku tu nijadperest bî” û jinik avêtin derve.

Cara dudûyan serhatîyeke bi vî rengî jî gava li kampê bûm pêk hat. (Ev serhatîyên min ne rewşeke quretîyê ye. Dixwazim balê bikşînim ser wê yekê) Di kampên penaberan de, heger ne kampa LGBTÎ+an be û mirov

di kampeke têkel de be, mixabin gelek bûyerên transfobîk, homofobîk an jî seksîst dibe ku pêk bên. Çimkî mirovên ji welatên cuda cuda hatine mecbûr in di kampan de bi hevdu re bijîn. Haya me jê heye bê mirov çendî dikarin bibin transfobîk û seksîst. Di kampan de em tûşî gotinên transfobîk û seksîst ên hin penaberên ji Rojhilata Navîn û Afrîqayê dibûn. Ev tişt her roj dihat serê min. Çimkî Tirkîye jî welatekî wiha ye. Piştî tûşbûna bi çend carî ya van gotinan min ji rêveberîya kampê re ragihand. Li pey wê re rêveberîya kampê ji bo penaberên vê derê derbarê LGBTÎ+ê dest bi perwerdehiyan kirin. Li vê derê ji penaberê di nav helwestên cihêkar de wiha hat gotin: “Belê, hûn hatin vê derê, mafê penahiye ya her kesî heye li vir lê belê qeyde û bendên Swêdê jî hene. Nabe ku hûn transfobîk û seksîst bin. Ji ber ku we her kesekî tazî an jî nîvtazî dît, hûn nikarin ji wan daxwaza seksê bikin.”

Li kampê qadeke hevpar a dûşê hebûn. Ji bo wê derê digotin kapma demkî. Mirov çend rojan li wê derê dimîne. Cihêkî weke hostelê bû. Ez ketim serşokê û di rêya derketinê de çar pênc mêr hebûn û min ji zimanên wan fahm nedikir lê her û her digotin “seks, seks, seks.” Tiştê min fahm kir daxwaza seksê dikirin û ez jî çûm cem gerîndeyê kampê, min jê re rewşa hanê vegot, min dîyar kir ku pir aciz bûme. Min got “ger li vê derê ez bi dawa xwe ya kinik an jî bi bornoza xwe ji serşokê derkevim û ji cihê ku hatime ne ewletir bim nexwe ji bo çi ez hatim vê derê? Peywirdarên kampê hemû mêran civandin dersa LGBTÎ+ 101 dan wan. Pê re heger tu hatiya vî welatî tu mecbûr î qeyde û bendên vê derê bizanîbi. Bi saya van qeydeyan em hînî rêzgirtina li cûdahiyên hev û du dibin. Piştî perwerdehiyên bi vî rengî tu dibîni ku ew jî diguherin. Piştî vê bûyerê min ji xwe pirsî: ji ber çi yanê? Mirov li vê derê dikare biguhere lê li welatê xwe çima nikare biguhere? Dilê min peritîbû.

Helbet li vê derê jî nijadperestî heye lê belê li derdora xwe ez bi pirsgirêkên gelek mezin re şer dikim. Rêveberîya Koçberîyê pir ne li hev e. Hingî pirsgirêkên wiha hene li derdora min ya hevalan nikarim dema xwe ji bo hewldana li dijî kesên transfobîk û nijadperest xerc bikim. Hêla baş ew e ku mirov dema hevaltîyê bi min re dikin bi rastî jî dizanin ez mirovekî çawa me, wiha hevaltî dikin.

Sazîyeke vê derê heye dişibe Rêveberîya Koçberî ya Tirkîyeyê. Tu diçî wê derê dibêjî “ez dixwazim serî li penaberîyê bidim.” Ger hebe tu pasaporta xwe, nasnameya xwe didî destê wan. Piştî çend rojan bang li te dikin. Ev dibe pêş-hevdîtinek. Dixwazin li çîroka te guhdarî bikin: Tu ji ber çi hatî? Baş e, heger bû û tu vegeyîyayî Tirkîyeyê wê çi bibe?

Van pirsan û pirsên bi vî rengî bi çend awayên cûda li çend cihên cûda dipirsin. Yanê, gelo bawerî bi çîrokê dibe yan na? Çîrok rast e yan derew e? Li van tiştan dipirsin. Piştî guhdarkirina li çîroka te pirsra pereyên li cem te dikin bê çiqas e. Sedema vê pirsra pereyên li cem te heye. Hewl didin dîyar bikin ku divê kengî miaşa te terxan bikin, heya kengî alîkarîya te bikin. Tu jî pereyê li cem xwe ji wan re eşkere dikî. Ew jî hesaba dema qedandina wî pereyî dikin, miaşa te didin destpêkirin. Dûre dipirsin “bê cihê te yê mayîn heye yan na?” Ger cihê te yê mayînê hebe yan jî tu li cem hevalên xwe bî dibêjî “heye” lê heger tune be te dişinin kampa bendemanê ya ku min behsa wê kirî.

Bêyî dewletê, bêyî sazîyên dewletê bi serê xwe biryar didin. Yanê ne mecbûr in ji dewletê bipirsin. Carinan dibe ku bipirsin lê belê her tim ne hewce ye. Mesela polis dipirse lê belê biryara dawî Rêveberîya Koçberî ya vê derê dide. Dema mirov tê vê derê dest datînin hemû nasname, belg û pasaportên mirov. Şopa tilîyan têne girtin.

Bi giştî pêşwazîkirina kesên vê derê pir pir baş bû. Mînak tê bîra min, di pasaporta min de mêr dinivîsî û peywirdar dema nasnameya min girtibû destê xwe ji min re gotibû “li ser navê welatê te lêborînê ji te dixwazim.” Ez wê qet ji bîr nakim. Lewma dikarim bêjim ji nêteke xerab ve nêz nabin. Çimkî dema ewil ez hatim jinika ku îfadeya min a ewil girt ji min re wiha gotibû: “Ji bo te hormon gelekî girîng e, tu jineke trans î û karê min ê ewil e ez ê hewl bidim pirsgirêka hormonan çareser bikim.”

Herî zêde piştî pênc rojan cihêkî mayînê ji bo te dibînin, te dişinin cihê mayînê. Bi giştî ev cihên hanê dibe ku dûr û ji civakê îzole bin. Heger kesekî, nasekî tu karibî li cem bimînî tune bin tu mecbûr dibî qebûl dikî û diçî. Li gor vedîtina nasnava cinsî û meylê tê gotin ku organizasyonên LGBTI+an heye û tu dikarî bi van re têkilî deynî.

Bi saya serê wan tu dikarî di derbarê LGBTÎ+ên vê derê û yên Swêdê de tiştina fêr bibî. Tê gotin ku dikarî ji xwe re civatan deynî û dûre dest bi bendemanê dikî. Prosedûreke dîyarkirî ya Rêveberîya Koçberîyê nîne li vê derê û bi awayekî ji sazîyên din ên dewletê cûda dixebitin. Hin ji wan kesên serilêdayî sê mehan li bendê dimînin. Hin ji wan dirêjtir. Mesela piştî bendemana salekê min hevdîtina esil a bi navê “Interviewê [hevdîtin]” pêkanî. Pîvaneke wê nîne, dibêjin herî kême şexş meh lê belê herî zêde çiqas dirêj dibe, tu nizanî. Ji te dipirsîn bê tu parêzerek divê yan na. Destheqê parêzerê jî ew bi xwe didin. Lê belê rêxistinên LGBTÎ+ên vê derê xwedî torên xwe yên parêzeran e û min jî yekê ji wê derê xwestibû. Çimkî sedema hatina min a vê derê jî ber nasnava min a cinsî bû lewma min jî yekê ji wê torê hîlbijart. Dûre li cihê bicikirina te ger rewşeke te ya taybet hebe mesela tu jineke trans bî odeyeke yekkesî didin te. An jî bi transeke din re di malekê de dimînî. Em bêjin tu gey an jî lezbîyen î te li cihekî bi cî dikin ku kême zêde çar gey an jî lezbîyen tê de ne. Te û heman kesên ji nasnav û meyla te ya cinsî dixin odeyekê. Tu wiha dest bi jîyanekê dikî. Li vê derê mirov çiqas xwarin dixwe listeya bihayên wan hene. Tibaba li gor bihaya listeya her rojê, li hejmara rojên wê mehê dixin û her meh bi qasî wê pere bi te didin. Min di hevdîtineke xwe de ev peyv li wan kiribû: “Gelo hûn bi çavî li me dinêrin; wek takekesên ku bes xwarin divêtin? Mesela ez jineke trans im û naşuxilim. Mehane ev qas lêçûnên min ên makyajê hene. Gelo hûn dibên qey penaber serê xwe naşon? Bi wî pereyî xwarinê ez ê çawa karibim kelûmelên serşuştinê bikirim? Taliyê pêdiviyên me yên bingeşîn ên mîna şampû, kaxizê daşirê hene.” Li vê derê di wê mijarê de pirsgerêk hene.

Bi çavekî wiha li penaberan dinêrin weke kesên ku bes xwarin dixwin û pêdiviyên wan bi vehewînê heye. Ev pir talûke ye û ji rûmetê dixê. Tu tenê xwarin dixwî, xwarin bixwe, rabe razê, xwarin bixwe, rabe razê, odeyeke te ya parvekirî heye. Jê pê ve tiştêk jî nîne. Te di ji bo sosyalîzasyonê budçe venaqetînin ango tu politikaya wan nîne. Cihekî ku qet li kelûmelên din ên ji bo malê nafikirin, bi çavekî wiha li te dinêrin wek ku tu zîndewarek î bes xwarin dixwî. Li vê derê du hezar û du sed krona Swêdê didin me. Li gor pereyê Tirkîyeyê em hema bêje heştêsed nehsêd lîre dike. Wekî din mafê te yê şuxilê hebe tu dişuxilî, lê belê hema bêje tiştêkî ne pêkan e. Çimkî derdora te ya hevalan, kesên te

yên naskirî tune be tu kes naxwaze te dest bi kar bike. Mirov naxwazin bi penaberan re bişuxilin. Ev rewş li tevahîya cîhanê wiha ye. Tu penaberî bî tu yê bi qaçaxî bişuxilî, tu yê bi buhayên erzan bişuxilî an jî tu yê qet neşuxilî û tu yê hînî debarkirina bi pereyê dewletê bibî.

Prosedûra penaberîyê parikî wiha ye. Piştî hevdîtina ewil ya destûra niştecihiyê li benda bersiva wan dimînî. Li vê derê penaber di nav xwe de wiha dipeyîvin: Kengî kêfa canê wan bixwaze wê demê li dosyeyên me dinêrin. Mînak ew roj hewcehî bi girtina dosyeya te hebe û kesê li wê derê xwe baş hîs nekiribe dikare bersiveke neyînî li serilêdana te bide. Birastî jî ev wiha ye. Dosyeya te jîyana bi rewşa derûnî ya xebatkaran ve girêdayî ye. Ev tişteki gelekî dijwar û pir xerab e. Tu jîyana xwe saz dikî (mesela du sal û nîv e ez li vir im) zilam di rojekê de dikare bersiveke neyînî bide. Mafekî wiha yê dewleta Swêdê heye: Mesela mirov aneha destûra niştecihiyê bigire jî mafê wê heye di nav pênc salan de paş ve bigire. Ger mirov tev lî sûcekî bibe (li gor wan tu serî ji bo qeydeyên wan daneynî) di nav pênc salan de dikarin te deport² bikin. Ew deriyê vegerandinê tim vekirîye. Tu destûra niştecihiyê werbigrî jî vekirîye.

Li vê derê destûra niştecihiyê di du gavan de pêk tê. Destûra ewil ji bo sê salan tê dayîn. Ger te bi tevahî pênc salên xwe li Swêdê derbas kiribe mafê hemwelatîyê dide te. Li vê derê tişteki wiha xweşik heye, ji roja ewil a hatina te vir ve dijmêrin. Maweya berî wergirtina destûra niştecihiyê jî tê de di nav pênc salan de tu dikarî serî li hemwelatîyê bidî. Ez dixwazim amaje bi vê yekê bikim ji ber ku li Ewropayê hê jî hin welat hene maweya bendemanê piştî wergirtina destûra niştecihiyê didin destpêkirin. Ez behsa hêleke vî welatî bikim ku ji welatên din baştir e: Mesela li hin welatên Ewropayê statûyên mîna a, b, c didin penaberan. Li vê derê statûyeke wiha nîne. Ger te sûcek nekiribe, qeyda te li cem polîsan nîn be, tu “entegre” bûbî dikarî hemwelatîyê werbigrî.

Gelek kes ji min re dibêjin “ez ji jîyana xwe ya li Tirkîyeyê aciz bûme û bi awayekî ez ê werim. Ez êdî nikarim li vê derê debar bikim, bi gotineke

² Di hiqûqa penaberîyê de biryara dersinorkirinê li ser penaberekî hebe, ew penaber li welatê xwe yan jî li welatê ku jê hatiye şûnde tê vegerandin.

rewa ‘bihûştê dixwazim, ez ê werim wê derê.” A rastî ji hêlekê ve mirov lê binêre ji axên ku me jîyana xwe li ser kiriye gelekî pêşdetir, li cihêki xweşiktir in lê pêvajoya penaberîyê ew çend ne hêsan e. Têkoşîn divê. Hin hevalên min ên trans ên karkerên seksê ji min re dinivîsin û behsa daxwazên xwe yên koçkirinê dikin. Li diji tengasiyên li Tirkîyeyê tê serê hevalên me yên LGBTÎ+an a rastî ez naxwazim LGBTÎ+an li wê derê, li Tirkîyeyê bijîn. Ez dixwazim her kes were vê derê û li tecrûbeya xwe zêde bike bê li vê derê çawa qedrê mirovan digirin. Ger tu nikaribî ji bin barê penaberîyê rabî, derûniyeke te ya tekûz, giyaneke têkoşîner a tekûz nîn be, tu nizanibî bê çawa xwe bipolarêzî penaberî dikare ji bo te bibe xwekuştinek.

Mesela dema ez hatim vê derê min bi îngilîzî nedizani û sê mehên ewil min nekarî bi kesî re bipeyîvim. Min kesekî nedît pê re bipeyîvim ji ber ku min ziman nedizani. Û min depresyoneke giran derbas kir bi dirêjiya sê çar mehên ewil. Ez li vê derê naxwazim behsa hiyerarşiyê bikim lê belê her ku ez ji hay ji hêla xwe ya têkoşîner heme jî ew giyana têkoşîner piştî sê çar mehan hew kir û ez heya ber xwekuştinê anîm. Ez bi dilsoziya xwe dibêjim vê yekê. Çimkî, belê hêleke min rihet e, hêleke me pir xwe bi xwe ye, lê belê ew çanda nenas, ew zimanê nenas, ew suhbetên nenas ên mirovan, têkiliyên wan ên evînî, pir û pir li derveyî elimandinên me ne. Mesela li vê derê zilamê ku ez pê re şa bûm, dema berî destê xwe li laşê min bide destûr ji min xwestibû, min dest bir girînê kiribû. Li vê derê ne tenê tiştên neyînî, wek ku min mînak da, serhatiyên erênî jî dikarin derûniya we xerab bikin. Çimkî, vê carê mirov li xwe vedigere û dibêje “ev tişt li cem çanda min, li cihên zayîn û mezinbûna min nîn in. Çima?” Li hin cihan bi hinceta ku te dawa kinik li xwe kiriye zorganiyê li te rewşa dibîne, lê li vê derê zilam ji bo destê xwe bide laşê te, ji bo ku te maç bike destûr ji te dixwaze. Te dît mirov dudilî dibe. Dibêji: “Min berê di ser axên çito de jîyana xwe kiriye.” Giraniya derûnî ya vê yekê ew çend ecêb e ku... Dema mirov wan tiştên xweşik ên li welatê xwe nabîne lê li vê derê dibîne û dide ber hev tûşî giraniyeke mezin a derûnî, erdhêjeke derûnî dibe. Tiştê ku em dibêjin adaptasyon ev e ya rastî. Adaptebûn derûniyeke xurt û qewîn divê. Ger hûn xwediyê derûniyeke bi vî rengî nîn bin li qisûrê nenêrin ez nizanîm bê hûn ê karibin ji bin

barê penaberîya li vê derê rabin an na. Çimkî gelek penaberên li vê derê nekarîn ji bin barê wê derûnîyê derkevin û vegeyriyan welatên xwe. Ya, min pir dîtiye, li kampa ez lê dimînim nêzî deh kesan gotin “em nikarin” û vegeyriyan. Heta lawikek ji min re got “ez di nav çand û zimanekê de me ku pê nizamî û bêyî hevalên xwe nikarin, dixwazim biçim.” Carê jî jineke trans vegeyriya, ew jî ji heman pirsgerêkê dinaliya. Piştî vegera wê qîzê bi mehekê em pêhesiyan ku hatiye kuştin. Welatê te ferq nake, statûya te ya civakî ferq nake. Min gelek kes dîtin dema bawerîya xwe bi nekarîna xwe anîn pê ve bêyî ku li paş xwe binêrin vegeyriyan. Lewma divê mirov xwedî derûnîyêke xurt, qewîn û têkoşîner be. An na kes tu tiştî nade kesên ne têkoşîner. Li hemû cîhanê jî ev tişt wiha ye.

Her wekî din kêmasîyeke mezin jî heye ku min jî nekiribû: Berî hatinê divê tu belgeyên xwe top bikî. Divê dîploma li cem te be. Di derbarê tiştên serhatî de belgeyên te hebe; yekî tişteki gotibe ji te re, mesela doza te hebe, malbata te an jî kesên din gefa mirinê li te xwaribin divê tu van tevde li cem xwe binî. Mesela dîplomaya min ne li cem min e, ev mînaeke xerab e. Çimkî di wê kêlîya hatina xwe de min nekarî tu tiştî bi xwe re binim. Dûre min karî ewraqên xwe, her tiştên xwe bidim hevdu. Ji ber ku ez yeka parikî bi nav û deng bûm derfeta min hebû jî înternetê van hemûyan peyda bikim. Ger derfeta we ya bi vî rengî tune be û belgeyên we jî ne li cem we be hûn zehmetiyên dijwar dibînin. Vê pêlê ez ê dest bi mektebê bikim. Piştî teqezkirina destûra niştecihîyê mafekî wiha çêdibe. Ez dikarim ji cihê mayî zankoya xwe bidomînim. Berî wê divê tu ji ezmûna zimên derbas bibî. Ka bifikirin dîploma, belgeya xwendekarî ne li cem we ye, hûn ê çawa xwendekarîya xwe bidin piştrastkirin. Wek min gotî di jîyana xwe de, li welatê xwe belgekirina her çi ji destê we hatibe divê ew belge li cem we be. A herî girîng ew e ku mirov di cihêkî elektronîk de veşêre yan jî li cem xwe weke belge amade bike. Û divê çîroka we rasteqîner be. Mesela tê diyarkirin ku Tirkîye jî bo kesên LGBTÎ+ welatekî “ewle” ye. Çimkî her welatî li gor agahiyên parlemenên wî welatî, ji hikûmat û zagonên wî welatî dinirxînin. Lê belê min ji bo wan ewk şandibû, vaye “ez li Tirkîyeyê di komeleyekê de çalakvanîyê dikim.” Te dît dema min raportên ILGA Europe, Kaos GL û Pembe Hayatê pêşkêşî wan kir zilamî li wê derê got “na yaw, te ev ji ku

dîtin? Tirkîye ji bo LGBTÎ+an welatekî ewle ye.” Dema min da nîşankirin ku li gor ILGA Europê Tirkîye di warê binpêkirina mafên LGBTÎ+an de li Ewropayê di rêza yekemîn de, li cîhanê jî di rêze nehemîn de ye, zilam nikare bi vê yekê bawer bibe.

Divê hûn van agahîyên min dayî baş bizanin. Divê hûn hemhalê wan agahîyan bibin da ku karibin pişta dosyeya xwe an jî çîroka xwe bi vî awayî bigirin. Mesela ji Tirkîyeyê lawikek hatibû ew jî hat deportkirin. Çimkî lawik di hevdîtina xwe de gotiye “ez ji Tirkîyeyê derketim ji ber ku aciz bûbûm, ew der ne cihekî jîyanbar e bo min.” Ne eleqeya lawik ji LGBTÎ+an heye ne jî haya wî ji çalakvanîyê heye. Behsa geybûna xwe dike. Ji bo min mirov bi çi awayî xwe pênase bike ew e, helbet ez ê rêzê lê bigirim. Dema ewil min raportên di destê xwe de danê ji min re got “hadê ya, li welatê me komeleyên werê hebûne? Van komeleyan raport ji çêkirine?”

Min ji ber vê yekê ev mînak dan: Divê tu di hin tiştan de agahdar bi. Divê çîroka xwe li gor wê vebibêji, li gor wê pêk bîni. Lazim e tu bi belge û raportan re xurttir bikî. Ne bes bi raportên ji welatê xwe, divê tu bi raportên di civata navneteweyî de tê zanîn û yên komeleyên ewle piştgirî bidî. Ger di derbarê van de agahîyên te tune bin, bi gotineke rewa “hadê rabûm, ez ê biçim” nabe. Xebatkarên vê derê ji gelek ezmûnên derûnî derbas dibin û ger mirov derewan bike pir bi lez pê derdixin. Li vê derê gelek mirovan nas dikim pênaseyên wan ên zayendî derew in û nekarîne destûra niştecihiyê werbigrin. Di hevdîtinan de a rastî dikarin heman pirsî bi sed awayên cûda car bi ser caran bipirsin. Di vê babetê de divê mirov derewan neke lewma ez di vê babetê de dem bi dem wiha dibêjim: “Te dît çîrok pêk tê lê dema çîroka te li ser hîmên qewîn nehatibe avakirin mixabin dibe ku dilê mirov biêşe.” Bi kurtî û kurmancî ez nikarim bêjim her LGBTÎ+ê tê vê derê wê bikaribe destûra niştecihiyê bigire. Derewan nakim. Çîroka te ne qewîn be, bi rastî jî jîyana te ne di xetereyê de be destûra niştecihiyê nadin tu kesî.

Li Tirkîyeyê tu kes Sûriyeyîyan naxwaze ne wisa? Li Almanya jî tu kes tirkan naxwaze. Bi kurtîasî li welatên dîtir jî kesên dîtir naxwazin. Te dît

navê penaberîyê bêtir lêçûn e, bêtir bêkarî ye qaşo... Ji seba wê tu welat an jî tu kes kesekî din weke penaber li welatê xwe naxwaze. Naxwazin mirov ji welatên dîtir bèn li welatên wan bi xwe bi cih bibin. Em jî vê yekê naxwazin. Ên li Tirkîyeyê jî naxwazin. Gelek hevalên min ên trans ên ku digotin “em Sûrîyeyîyan naxwazin” peyman ji min re dişînin dibêjin “em dixwazin koç bikin.” Ez jî vê derê dixwazim ji wan re bêjim ku ew ê bêne cihekî wisa ku wê tu kes wan nexwaze.

Lê belê ev jî heye, ji bo ku tu penaber î ji mafan ne bêpar î. Bila ne bi dilê şahê vî welatî be, ne xem e ji ber ku mafên te hene. Lazim e tu ji mafên xwe agahdar bî, xwedî derûniyeke xurt bî da ku karibî ji bo mafên xwe bi rastî têbikoşî, her wekî din divê tu belgeyên (bo mînak wêneyên Facebookê, parvekirinên medya civakî, hemû ewraqên fermî, dosyeyên dozê yên delwetê) ji bo piştrastkirina çîroka xwe ya heyî û avakirî li cem xwe bigrî. Û ji bir nekin ku li her derê dinyayê transfobî heye, li her derê dinyayê homofobî heye, nijadperestî heye. Ev bi xwe tiştekî ne aidê welatekî an jî axakê ye. An jî ne tiştekî aidê nijadekê ye. Ev bi xwe tiştekî wiha ye ku xwediyê wê cihana kapitalîst e, aidê cihana kapitalîst e. Yanê tu biçî welatê herî zêde dostê LGBTÎ+an jî, heger tu kesekî bêyî daxwaza wan bî mixabin tûşî transfobîyê jî homofobîyê jî dibî. Divê êdî em ji vê fikrê dûr bikevin: Mirov transfobîyê an jî homofobîyê (li Tirkîyeyê jî demekê em dipeyivîn, dihat gotin ku transfobî û homofobî li bajarên kurdan zêdetir e lê ez tev li vê yekê nabim) qet nikare bike malê civakekê. Mirov nikare vê daxîne bine ser welatan. Nijada vê yekê nîne, zayenda vê yekê. Ji bo ku mirov li hember vê yekê têbikoşe pêwîstiya mirov bi derûniyeke baş, bi binesazîyeke baş heye. Li vê derê jî transfobî û homofobî heye. Lê belê ez nêremoyeke wiha me ku dikare serî bi vê yekê re bike. Ez vê yekê timî dibêjim. Ez nêremoyeke wiha me ku dikare serî bi bela nijadperestîyê bike. Ez nêremoyeke wiha me ku li heqê xwe digirim. Lêgerîna heqîya xwe gelekî girîng e, têkoşîna ji bo vê yekê jî gelekî girîng e.

Mesela dixwazim behsa mînakekî bikim: Rojekê diktorek ji min re go “ez nikarim êdî hormon bidim te, ji ber ku di raporta te ya psîkîyatrîyê de nanivîse.” Min jî jê re got “te berê hormon dane min, çima piştî şeş heft mehan hormonê qut dikî? Qey te berê jî ev yek nedîtibû?” Dûre

ez li bijîşka xwe jî geriyam. Baş e ku bijîşka min naskirî bû. Ew ji min re raport nivîsî û dûre min hormonên xwe wergirtin. Min heqê xwe girt, ji ber ku çûm nexweşxaneyê û min terka wê derê nekir. Heya wextê girtina nexweşxaneyê li wê derê rûniştim. Ewlekar hatin. “Na!” min go. “Ev tişteki pirr bêdebe e, bêrêzi ye.” Çimkî dema ewilî ez hatim te pirsaraportê nekir lê dema aneha tîm tu dibêji “ez pê hesiyam ku raport nîne û ez nikarim hormona te binivîsim.” Tu çito bijîşk î? Belê nebûna raporta min tişteki pirr fahmbar e lê belê çawa ev ji ber çavê te direve û ji ber ku ev ji ber çavê te revîyaye ez çawa dikarim bême cezakin? Li ber deriyê wê nexweşxaneyê rûniştim, ranebûm. Min ji wan re got “ev ne kêmasîya min e, ev kêmasîya bijîşk e” û min dîyar kir ku ev rewş cidînegirtina karê xwe ya bijîşk bi xwe ye. Piştî vî karî bijîşk şandin cihekî din. Lewma divê mirov bi rastî jî yekê wiha be destê xwe biavêje çi divê bi xwe re bîne. Cardin dibêjim ez vê ya bi qurreyî nabêjim. Bi gotina “ez LGBTÎ+ im û li Tirkîyeyê pirsgirêk hene, nikarim bijîm” mirov li benda bihûştê be, li min negrin lê belê wê pir xeyalperestî be, pir ehmeqî be.

Ez li vê derê li hemberî transfobiyê, li hemberî homofobiyê, li hemberî nijadperestiyê têdikoşim. Di warên dîtir de bi rêyên dîtir têkoşina xwe dikim. Mesela komelaya LGBT+ a vê derê li xaleke gelek spî disekine û gey e. Lê belê ez ne spî me, ne li xaleke spî me. Bi vê sedemê jî li her derî têkoşin heye, li her derî mijarên pêwîstî bi têkoşinê hene. Ax û welatê nijadperestî, transfobî û homofobiyê nîne. Ev ramansazîyeke cîhana kapîtalîst e û em dikarin şop û nîşanên wê li her derî bibînin. Bi awayên cûda cûda pêwîstî bi têkoşinê heye. Û ger ramansazîya te, rêbaza têkoşina te ne li gor vê yekê be li min negre lê tu dikarî li Swêdê bijî. Ev ne tenê li Swêdê ye, nikarî li Tirkîyeyê jî bijî.

A talîyê bêjim, ez dibême ez ji nû ve ji dayîk bûme û naxwazim kes li cihê ku berê ez lê bûm bijî. Çimkî ev parikî jî cihekî wisa ye ji ber mirovbûna mirov qedir didinê lê belê qadên têkoşinê cihê jî tê de hene. Dixwazim balê bikişînim ser vê yekê: Tu kes bi xwestekî nabe penaber. Her kes bi zorê têne koçkirin û mixabin di axên me de bi zordarîya wan kesên ku jîyanê li me diherîminin em têne koçkirin. Navên girîng ên tevgera LGBTÎ+ê koç kirin, koç dikin û wê koç bikin jî.

Ez ê li vê derê bizewicim. Dixwazim bizewicim û zarokê min çêbe. Li Tirkîyeyê kirina vî tiştî heta fikirîna wê jî ne pêkan e. Gelo ez dixwazim vegerim Tirkîyeyê? Ji bo jiyînê, na. Qet! Çimkî ji transfobîyê wêdetir cihekî wiha ye rêzê li nijada min nagire. Tirkîye cihekî wiha ye ez ji ber kurdûna xwe pirsgirêkan dijim. Û ez li vê derê cardin bi kurdûna xwe hesiyam. Li vê derê bi rihetî dikarim bêjim kurd im. Yanê li Tirkîyeyê serbestîyeke min a bi vî rengî nîne û ez naxwazim ev jî ji destê min here. Li Tirkîyeyê ji derekê pê ve di nav tevgera LGBTÎ+ê de bi xwe jî min dît ku ez spîtir dibim, bi tirkîbûnê ve diçim. Bi tirkîbûnê ve diçî. Asîmilasyon tişteki wiha ye. Dema ez li wê derê bûm û min li eynikê dinêrîya min didît ku tu eleqa min û nasnava min a kurd bi hev nemaye. Ev girîng e ne girîng e nizanîm. Lê belê bi min mirov ji ku derê ye, ji ku hatiye, xwedîyê çandêke çawa ye, ev tev de tiştên biqedr û qîmet in. Û dema min ji vê derê lê nêrî bi başî dît ku tevgerên mîna LGBTÎ+ên ku ji gelek zêdetir e ev tevger, ew bi xwe jî gelek kesan spî kir û pir ber bi tirkîbûnê ve bir. Li vê derê bi rihetî dikarim bêjim ez kurd im. Naxwazim ev serbestî ji destê min biçê.

Li vê derê dilê min ket yekî. Yarekî min heye. Em pîlana zewacê dikin. Ew dixwaze bi min re bê û Tirkîyeyê bibîne. Dibêje “em tevî hev herin Tirkîyeyê, ez dixwazim hevalên te, der û dorên te yên kevn bibînim.” Yanê ez dixwazim pê re werim Tirkîyeyê, wî û jîyana xwe ya berê bi hev bidim nasîn. Ez pir dixwazim elimandinên xwe veguhêzim ser hin sazîyên Tirkîyê. Li vê derê her tişt bi awayekî cûda dimeşe. Ez xwe deyndarê hin sazîyên LGBTÎ+ ên Tirkîyeyê jî dibînim. Dixwazim di vî warî de veguhastinan bikim. Lê belê ne ji bo jiyînê. Piştî hatina vê derê ji asta ku digotin “kurdê nêremoyê lawê Xwedê, tu tiştî nizane” anîha hatim asteke wiha ku dibêjin “îngîlîzî zane.” Li cihekî spî me li gor gotina wan û tu carî pesnê xwe bi vê yekê naynim. Bes dixwazim bêjim ew nêremoyê ku we digot “kurdê pîs”, we her nasnava wê biçûk dixist bi ser vê yekê ket û têkoşîna xwe anî vê astê, ne derew e!

Rev Ji Dêvla Çûyînê

Silav ez Sûrela,

Ez hinekî behsa xwe bikim. Ez li Entekyayê ji dayîk bûme. Li Entakyayê mezin bûme, ereb û elewî me. Li wê derê her ku ne di bin banekî siyasî de bibe jî, li derdoreke siyasî mezin bûm. Te dî bi awayekî pêvajoya politîkbûnê hat serê min. Li taxeke ku bêtirî mûxalîf bû, mezin bûm. Weke zarokê malbateke nanfiroş hatime dinê. Dê û bavê min bi xwendin û nivîsandinê nizanin. Di nav şerê nan û zikê xwe de ne, kesên ji rêzê ne. Em heşt xwişk û bira ne, bi tenê min xwendîye û textê xwe xweş kiriye, wiha tîm hesabandin. Ez behsa vê yekê dikim, lewra ev yek bi çîroka min a koçberîya ber bi Almanyayê ve girêdayî ye. Bi paşxaneyê malbata min û bi çîroka min [a şexsî] ve.

Min di hivdeh hejdeh salîya xwe de li bajarekî din dest bi xwendina sosyolojîyê kir. Di wan demên xwendinê de xwişka min bi xwazgînî bi yekê “alamancî” re zewicî. Jixwe kesên di nav malbatên feqîran de ji bo ku ji xwe re pozîsyonekê ava bikin hewl didin dest bi lêgerîna jîyanekê nû dikin. Timî daîm “derdekî” wan î revê yan jî çîrokeke wan a revê çêdibe. Nexasim di malbatên mîna me feqîr û xwedî gelek zar û kulfetan de. Çimkî tu weke malbat, ji aliyê civakê ve, ji aliyê pergalê ve tûşî tundîya civakî, siyasî û aborî dibî. Îro dema lê difikrim, ez wê zewaca xwişka xwe ya bi xwazgînî ji bo xwişka xwe weke “revêkê” dibînim. Belkî ji bo xwişka min ji dêvla jîyanekê dilneşad li bajarekî biçûk, jîyanekê dûrî xem û kulan li welatekî mîna Almanyayê çêtir bû li gel ku xerîbî hebû jî.

Xwişka min bi xwazgînî çû Almanyayê û bi xweşîkî mêrê xwe nas nedikir. Ji wê kirî, ji ber ku alamancî bû digot qey wê cihanbîniya wî cuda be. Belkî li wê yekê jî fikirîbe ku aboriya wî jî baş be. Belkî wiha fikirîbe ku ez herim wê derê ez rihet bibim, ji vê feqîrîyê, ji van zextan

xelas bibim. Lê belê piştî çûna Almanayê xwişka min her roj ji aliyê mêrê xwe yê muptelayê tiryakan ve tûşî tundîya navmalê dibû. Piştî zewaca xwe hîn bû ku mêrê wê muptelaya tiryakan e. Zavayê me bi xwe jî koçber e. Him weke muptelaya tiryakan him jî weke mêrekî koçber ew bi xwe jî tûşî gelek cihêkariyan bûye a rastî.

Werhasil dema min li Tirkîyeyê li zankoyê xwendina xwe dikir xwişka min got “ez li vê derê gelekî bi tenê me, pir jî tûşî tundîyê dibim. Ez zimanê vî welatî nizamim. Nikarim bişuxilim. Nikarim bi kesî re bipeyvîm. Di bin tundîyê de jiyaneke îzolekirî didomînim. Tu jî heger zankoya xwe biqedînî dikarî bêyî vir”. Wê demê kesên ku dawî li zankoyê dianîn dixwestin biçin wê derê, şertên wan ên çûyîna Almanayê hîn hêsantir bû, aneha hîn zehmettir e. Go “him tu dikarî li vir jî xwendina xwe ya zankoyê bidomîni, mastera xwe bikî, him jî piştî min bigrî. Qe nebe ez ê ji tenêtiya xwe rizgar bim.”

Piştî qedandina xwendina xwe ya li beşa sosyolojîyê bi hêviya ku ez û xwişka xwe piştî hevdu bigrin ez hatim Almanayê. Helbet Almanaya di bir û baweriya min de gelekî cuda bû. Welatekî pêşveçûyî, bêhtir demokratîk. Li min wer dihat ku mirov li vî welatî bi dilekî rihetir dikare fikrên xwe vebibêje, bêtirs dikare piştî fikirdayîna xwe bigre. Min tişteki wiha sêwirandibû, te di min digo qey ez hatime welatê serbestîyan.

Derba ewil ez hatim û çûm kursa zimên. Helbet min xwe fêrî almanî kir. Mecbûr bûm biçim kursa zimên û pêwist bû di asteke bilind de xwe fêr bikim. Li gel kursa zimên pêdivî bi pejirandina perwerdehiya min a li Tirkîyeyê hebû, pêdivîya naskirinê (wergirtina belgeya hevtayîyê) hebû. Ji bo wê yekê jî min hewl da.

Di wê pêvajoyê de qet heqê te yê şuxilînê nîne. Ji ber vê sedemê jî di warê aborî de qet ne hêsan e mirov bi tena serê xwe debara xwe bike. Li cem donerfiroşan, di karên avahîsazîyan de bi qaçaxî şuxilîm û di wî warî de keda min gelek car hat xwarin. Bi gelekî erzanî ez dam şuxilandin. Te di tiştên hatin serê penaberên sûriyeyî yên li Tirkîyeyê me jî heman tiştan li vê derê ditin. Ji nehê êvarê heya duwanzdehê sibeha din çardeh

panzdeh seatan em didan şuxilandin. Bi vî awayî keda me, laşê me her tiştên me hatin xwarin, pê re jî çûyîna zankoyê zehmettir dibû.

Di hin xalan de Tirkîye weke welatekî dîke tê hesibandin, di xala perwerdehiyê de bi xwe jî wiha bû. Perwerdehiya min a li Tirkîyeyê di warê sosyolojîyê de nivî hat qebûlkirin nivî jî mecbûr mam ji nû de bixwînim. Bi awayekî mecbûr bûm zankoyê jî nû de bixwînim. Li vê derê jî çûm zankoyê û min qedand. Di dema xwendina xwe ya zankoyê de min dît ku hîyerarşiyên di nav mirovan de çawa dixebite. Di navbera sazî û takekesan de, di navbera min û zankoyê de...

Weke takekesekî, weke xwendekarekî biyanî ez pêhesiyam ku di navbera mamoste û xwendekaran de, di navbera xwendekaran bi xwe de, a rastî ev mirovên han hemû me tevan weke misilman dihesibînin. Her ku min misilmantî nepejirandibe û min xwe weke misilman bi nav nekiribe jî wan ew dax li me kirin. Ji ber ku ez weke kesekî “ser-reşik” dihatim dîtîn, bi nav û cism û laşê xwe ve bi tevahî bi wê misilmantîyê hatibûm daxkirin, ji ber vê yekê yekcar bi dîkesaziyekê [tr. ötekileştirilme] re rû bi rû bûm. Xwendekar jî, mamoste jî, sazî jî, yanê hema bêje bi temamî civakê ev yek saz dikir. Van tecrûbeyên hanê berê min dan xebatên li ser koçberî û cihêkarîyê. Bi kurt û kurmançî aneha ez him li ser koçberîyê him jî li ser cihêkarîyê, helbet him jî li ser nijadperestîyê dixebitim, ji ber nasnava zayenda xwe jî li ser heteronormatîvê dixebitim. Heya neha jî tim min di van babetan de hewl da, ku tiştinan bikim. Him bi awayekî polîtîk him jî bi awayekî akademîk.

Berî bêm Almanyayê li dema zankoyê dilê min ketibû hevalekî min ê mektebê. Hevalê min yekê wiha bû ku gava bi riwangeya îroyî lê difikrim dibêjim “min çawa dil berdaye mirovekî wek wî”. Ez her li derdora wî bûm, bi şev û rojan ji bona wî girîyam. Ji ber wê yekê jîyana min a zankoyê tevî xem û elem derbas bû. Her ku min nasnava xwe eşkere nekiribe jî jixwe diyar bû. Hevalan digotin “hûn weke jin û mêrê hev in”. Ji ber ku em di heman malê de bûn pirî caran me di heman nivînê de radiket. Derd û kulê hevalê min ê malê tim dîtina qîzekê bû, digo bila hezkiriyêke min hebe. Min jî dixwest. Lê belê te dî di navbera nasnava wî ya heteronormatîv û

nasnava min a dij-heteronormatîvî de têkiliyek jî hebû. Her ku dûre wî ev nepejirandibe, heta neha jî nepejirandibe jî gelek hevalên me yê hevpar wer difikirîn ku têkiliyek di navbera me de heye. Ji der û dorê ve jî hin caran wiha xuya dikir. Ji ber vê yekê jî gelek tinaz li ser me dihatin kirin, min bix we gelekî heqaret dîtine .¹

Helbet ev tiştên hatine serê min yekser berê min ber bi koça Almanyayê ve neajotin. Çimkî heger xwişka min negota “were, ez ê bi awayekî alikariya te bikim”, xeyal û pilaneke min a çûna Almanyayê nîn bû. Çimkî mirovên wek me ji hêla çînî ve bêawantaj in, ji wan re zehmet e ji Tirkîyeyê birevin an jî biçin welatekî dîtir. Gelo ne ji xwişka min bûya ez ê bi kîjan piştgirîya aborî biçûma Almanyayê? Bi derfetên xwe pir zor e, heta ku ne pêkan e. Lewra Almanya ji bo min ûtopîk bû. Derveyê welêt û Ewropa ûtopîk bû. Te di ne ji xwişka min bûya ez ê nikaribûm bihatama; her ku derfeta wê ya aborî jî nîn bû, lê belê çawa bêjim, di maleke yekjurî de bû. Bi tenê ew ji destê wî dihat ku nivînekê raxe ber min û derfeta xwarinê bide min. Ew bixwe jî fedakariyeke mezin bû. Ji ber ku piştî hatina ji Tirkîyeyê li vê derê lêçûnên kirê û xwarinê hene, jê pê ve li vê derê çêkirina sîgortaya tenduristîyê tew mecbûrî ye. Ango gelek pêdiviyên bingeîn hene, lazim e mirov pere li wan xerc bike. Ji ber ku xwişka min xwe da ber van lêçûnan hatina Almanyayê bo min hêsantir bû.

Almanya ûtopîk bû çimkî ji ber sedemên aborî ji bo kesên wek me ji bajarekî çûna bajarekî din bixwe jî lêçûneke giran bû, lewma ez qet li ser jîyaneke li Almanyayê nedifikrim. Lewra tu carî fikra jîyana li Almanyayê li cem min peyda nebû. Ji ber zextên heteronormatîv herî zêde di wan demên zextan de ez lê difikirim; gelo ez ê karibim herim Stenbolê? Gelo ez ê karibim jîyanekê li wir ava bikim.

Hêj ku ez di nav van fikran de digevizim xwişka min vê fikrê, vê pêşniyazê, anga mijara çûna min a Almanyayê ya bi piştgirîya xwe danî ber min. Helbet hatina min a Almanyayê gelek bandor li jîyana min a lubunyayê kir. Li Berlînê jîyana geyan berbiçav e, kafeyên geyan, barên wan, odeyên wan ên reş, çalakîyên wan û komele an jî civatên wan hene.

¹ n.w. italîkî aidê nivîskar e.

Di derbarê jîyana geyan de an jî bi giştî li ser polîtîkaya zayendan gelek tişt diqewimîn û min jî timî daîm bi nêzîkahî qismek ji dûrahiya wan dimeşiyam. Min temaşe li wan dikir. Ji ber tirsê ku weke gey eşkere bibim min nediwêrî. Ango di eslê xwe de min tirsên xwe yên li Tirkîyeyê jî bi xwe re anî bûn. Li Tirkîyeyê jî ber ku bawerîya min bi tu kesî nedihat min xwe ji kesî re eşkere nekiribû. Bi demê re ew jî pêk hat û weke ku min gotî ji bo ku karibim nasnava xwe ya neheteronormatîv bi awayekî hêsantir bijîm derfeta min çêbû.

Bi ser de hin tişt hene bi temenê ve girêdayî ne, çimkî ez behsa bîst sal berê dikim. Neha li Tirkîyeyê bijîm gelo min ê çawa nasnava xwe bidaya der nizanîm, min ê çawa jîyana xwe saz bikira nizanîm. Lê belê bîst sal berê zehmetir bû. Bi ser de ez li derdoreke çepgir bûm. Geh li Entakyayê be geh jî li bajarê zankoyê be. Wek hûn dizanin çepgiriya Tirkîyeyê heye, tevgera kurdan heye. Ev jî heye tu tim û daîmî li civata çepgiran bî dîsa jî di wê civata çepgir de rû bi rûyê homofobiyê dibî. Ez vê homofobîya li civata çepgiran pêk dihat weke tundîyeke dijwar fahm dikim an jî min wiha fahm dikir. Çimkî hûn ji rastgiran, ji komên olfiroş, homofobiyê dipên jixwe normatîviya wan wiha ye. Bi sedem ku cihêkarî polîtîkayên wan ên bingehîn e mirov zêde şaş nabe, hêvîşikestî nabe. Lê belê dema mirov jî wan kesên ku dilzîziyê dipê, qaşo ji derdorên rewşenbîr, azadixwaz û fikirdar in ve van tiştan dibîne mirov bêtir jî qidûm dikeve. Dema dibêjim jî qidûm dikeve, mirov xwe biçûçik, bê nîrx û bê pişt hîs dike.

Ez dibêm tiştê ku herî zêde ez birîndar kirim serdema min a evîndariyê bû. Pir zor e mirov nikaribe hezkirina xwe vebibêje. Lê belê min hezkirina xwe bi awayekî dabû xuyakirin, min karîbû vebibêjim. Ez wan tiştên ku hatine serê min ji hêla xwe ve weke tundîyeke pir dijwar dibînim. Lewra ne bûyerên ji rêzê bûn tiştên ku hatine serê min, ji ber binemaya heteronormatîv ya civakê pêvajoyeke tundîkar bû. Pêvajoyeke dirêj bû. Pêvajoyeke bieş ya du sê salan bû û êdî mirov xwe bi xwe dida înkarkirin û homofobîya serwer jî bi awayekî daxilî xwe dikir. Jîyanekê arasteyî vê yekê... Tu mecbûr dimayî xwe înkâr bikî. Te dî nexweşînek e, an na? Gelo ez normal im an na? A soxî her ku min pêdizani jî, min şerê van pîrsan kir. Di gava xwendina zankoyê de dûrbûna ji malbatê tişteki

baş bû. Çimkî tevî homofobîya hevalên xwendekar, ne mecbûr bûm bi ser de bi homofobîya malbatê jî mijûl bibim. Dûrbûna ji malbatê di vî warî de hinekî barê min sivik kir. Hema wiha, yanê...

Ger ez vegerim ser çiroka xwe ya koçberiyê, lazim e mirov erdnîgariya bi navê Ewropayê pênase bike. Ewropa bi awayekî politîk dikare bê pênasekirin, bi awayekî aborî dikare bê pênasekirin û bi awayekî erdnîgarî dikare bê pênasekirin. Bi awayekî erdnîgarî cihekî bi navê Ewropa nîn e bi ya min. Ji ber ku Bulgaristan an jî Tirkîye jî perçeyeke Ewropayê ye, Macaristan jî. Lê belê Norweç, Hollanda, Danîmarka, Awisturya jî perçeyeke wê ye û dema mirov lê binêre a soxî birek Ewropa hene. Û gelek politikayên cihê yê wê Ewropayê hene. Ez dixwazim bêtirî behsa Ewropaya Rojava bikim. Xalên wan ên hevpar binema û dîroka wan a mêtinkar û kolonyalist in. Her çiqas îro mêtinkarî bi awayekî fermî ne li ser kar be jî bandorên wê hîna jî didomin. Nijadperestîya hîma yekitiya wan îro li Ewropayê nemaze li Almanyayê, a rastî li naverast û rojavaya Ewropayê bi heman kujerîya xwe didome. Hîn jî ji ber politikayên nijadperest, ji ber çalakîyên nijadperestî mirov jiyana xwe ji dest didin. Ez behsa wan kesên ku li Behra Spî xeniqî ne, li Balkanan wenda bûne an jî li wan deran bi her awayê tundîyê re rû bi rû bûne nakim. Bi awayekî beloq li peytextên Almanya, Îngîlistan û Fransayê hin mirov ji ber ku weke ewropî nayên pejirandin dimrin. Bi min ev nijadperestî carinan bi reng û dengên cihê pêk tê. Em him dikarin behsa nijadperestîya fermî û sazîyî bikin, him jî nijadperestîya di navbera takekesan de. Ew kesên ku weke ewropî nayên hesibandin tûşî her cure nijadperestîyê dibin. Ez bi hêsanî nimûneyekê bêjim: Serê pêşî dema hatim Almanyayê hin ciwan bûm. Bîst sal berê destpêka bîst saliyên min bû. Pîrî caran mirov, polis an jî xebatkarên markêtan gumana dizîyê dibirin ser min. Ez diçûm markêtê tim bang li polîsan dikirin. Li ser kîs û laşê min lêgerînê dikirin. An jî weke ku tiryakfiroş bim polis ez kontrol dikirim. Di sûpermarkêtan de, di îstgehên trênan de, li rawestgehên otobêsan, heta di meşa cahdan de; weke dikeyekê, dikeyeke xerab, dikeyeke xeternak rû bi rûyê wan kiryanan mam. Neha jî tûşî wan dibim lê belê aneha ne di destpêka bîst saliyên xwe de me, çil û du salî me. Êdî pîr bûm. Xeternakîya min li gorî wan hindiktir e, bêtirî ber bi koçberên xort ên nespi ve nijadperestîyêke

zêdebar heye. Di eslê xwe de ev her sê xal dibin yek; tu ciwan î , weke mêr têyî dîtîn, weke biyanî têyî hesibandin. Ji hêla polîsan ve, te di ji hêla sûpermarkêtan ve, li cahdan, çi zanim eşkereyî, di meşê de ji hêla hemwelatîyên alman ve carina bi devkî carina jî bi fizikî rû bi rûyê êrişan dibî.

Min jî gelek caran ew dîtîn. Ev tecrûbeyên bi vî rengî her tiştî bi mirov dide lêpirsinê: Gelo ev welat dikare çiqas bibe welatekî azadîxwaz û demokratîk? Çimkî xwedêgiravî tim behsa mafê mirovan dikin ya! Xwedêgiravî mafên mirovan fêrî welatên din ên “cîhana sêyemîn”, welatên “pêşneketî” an jî “di hemdê pêşketinê de” dikin ya!

Li vê derê hema jixweber weke ku diz bi li hemberî te tevdigerin. Weke ku mirov krîmînal be li hemberî te tevbigerin, ev te diêşîne. Helbet ev tişt di nav jiyana rojane de hene, gava dikevî zankoyê, gava li zankoyê dixwinî, gava zankoyê diqedîni jî dîsa bi tevgerên nijadperestîyê re rû bi rû dibî.

Di nijadperestîyê de wek hûn dizanin; Rojavayî xwe berzîtir, baqiltir dibînin, ji hêla ciwaniya laş delaltir dibînin û li hemberî mirovên wekî me jî wek ku “em fahmker” bin tevdigerin. Lewma li zankoyê an jî li dibistanên seretayî û navîn notên wan bi xwe jî li gor rawêjîna wan ya di ser welatên mirov re bi awayekî cihê tê belavkirin. Helbet ev yek jî dibe sedema ku hûn dev ji xeyalên xwe berdin. Çimkî piraniya mirovan bi hêvî û armancên diyar têne van deran. Mînak hevalên hunermend hene, hatine. Akademîk hene. Gelek mirovên ji biwarên cihê têne van deran û karên wan ên ewilîn an firaqşoyî ye an jî berkarî an jî di avahîsaziyan de ye an jî tiştên mîna van karan de dişuxilin. Gelo ev karên xerab in? Helbet na. Lê belê piraniya hevalan beriya hatina xwe tu kar nekirine û ji nişka ve wan mecbûr dikin di van karan de didin şuxilandin. Çimkî mejîyê karê akademîk û teorîk di me de nabînin. Bi awayekî berbiçav biçûkxistinek heye.

Nijadperestî di zagonan de pirtir e. Ango zagon bi xwe dibin sedemên nijadperestîyê. Hin zagon dibin sedema nijadperestîyê; makezagon jî

qedexa datîne ser nijadperestîyê. Zagoneke giştî heye li dijî cihêkarîyê, dibêjinê “Zagona Giştî ya Tевgeran”. Ew jî qedexa datîne ser cihêkarîyê. Di wê zagonê de xalek heye dibêje “ji ber koka xwe ya etnikî, ji ber nasnava xwe tu kes nikare cihêkarî li tu kesî bike”. Lê belê ev xal bes di Hiquqa Kar û Baran de û di Hiquqa Medenî de kar dike. Di biwara perwerdehiyê de kar nake. Mînak zarokek, takekesek li dibistanê, li zankoyê tûşî nijadperestî û cihêkarîyê bibe ev zagon wî/ê naparêze. An jî mirov li odeyeke dewletê ji hêla karmendekî ve, ji hêla polisekî ve tûşî tevgera nijadperestîyê bibe nikare bi vê zagonê re xwe biparêze. Ji ber ku li gor zagonê ger tu jî bes di biwara Hiquqa Kar û Baran de li aliyê karsaz ve tûşî cihêkarîyê bibî dikarî li hember karsaz dozê vekî. An jî, tu bêjî Hiquqa Medenî biwareke gelekî fireh e. Tu dikarî di biwara heqê tenduristîyê de serî lê bidî lê dîsa jî bandora wê zêde nîne. Li gel vê yekê gelek zagonên din jî hene ku bi zagona cihêkarîyê re di nakotîyê de ne. Zagoneke derbarê polîsan de heye. Mînak li gor vê zagonê heqê polîsa heye bi eşkereyî ji ber rengê laşê wan mirovan desteser bikin. Ê nexwe çî eleqeya vê yekê û zagona dijî cihêkarîyê ya di Makezagonê de bi hevdu heye. Her wekî din dixwazim behsa zagoneke din bikim, mesela zagona turbanê, zagonek e qedexa datîne ser laçeka ji rêzê. Çî eleqeya wê û rêgeza wekhevîyê heye. Li vê derê hin zagonên hene pêşbîniya rêgeza wekhevîyê dikin an jî qedexa datînin ser cihêkarîyê; hin zagonên dijberî van jî hene ku zagon û kiryarên nijadperestîyê ne. Ez bi kurt û kurmancî bibêjim cihêkarî û nijadperestîya sazîyê, civakî û takekesî pir serdest e li Almaniyayê. Ev tişt di heman demê de bi qasî nijadperestîyê ji bo homofobîyê jî rastîyek e. Zagona wekhevîyê homofobîyê jî qedexa dike lê belê bes di biwarên min gotî de, di Hiquqa Medenî de û di zagonên li ser şuxilan de. Karmendekî ber destê dewletê bi hêsanî bi awayekî homofobîk dikare tevbigere. Zagon rê li ber vê yekê nagirin.

Min li vê derê pêvajoya xwe ya hiquqî zexm kir. Her çiqas min heya neha behsa hêlên neyînî kiribe jî, ji ber xwendekarîya xwe min ji hin awantajên jî sûde wergirt. Ewîlî statûya min xwendekarê biyanî hebû. Di destpêkê de mafên min ên sînorkirî hebûn, a rastî statûyeke mişt neheqî û bêmaf hebû. Piştî mezûnbûnê an ez ê mecbûr bimama vegerim Tirkîyeyê an jî min ê karekî bidîta an jî min ê yekî bidîta pê re

bizewicîyama. Berî mezûn bibim bi salekê min hevjinê xwe nas kir. Piştî mezûnbûna zankoyê min dest bi diktorayê kir. Ango min statûya xwe ya xwendekarîyê hebekî din dirêj kir. Di wan kêliyan de min hevjinê xwe bêtir nas kir, em bêtir bi hev ve hatin girêdan û ez pê re zewicim. Ji ber wê zewacê li vê derê mafên min niştecihiyê ji guherî, min mafê hemwelatîya almanî jî bi dest xist. Neha weke hemwelatîyeke ji rêzê ya alman dijîm û min dev ji hemwelatîya Tirkîyeyê jî berda. Bi qasî awatajên wê dezawantajên wê rewşê jî hene. Min nedixwest biçim leşkerî, bibim leşker. Ji ber wê yekê ez bûm hemwelatîya alman. Statûya min ji piraniya hevalên xwe hîn baştir e. Helbet statûya min di nav jîyana vir de, di meşa ser rêyan de, anga di nav jîyana civakî ya rojane de nayê xuyakirin û ez ji her çi dibe bila be bi awayekî almaneke dike me.

Tirkîye wek welat Peymana Genevayê (Cinêv) îmze kiriye, ji ber vê yekê ji ji bo gelek welatan (nexasim ji welatên Yekîtiya Ewropayê) weke welateke ewle tê qebûlkirin. Ji ber vê yekê li gor Peymana Geneva mirovek ji ber nasnava xwe ya politîk, ji ber meyla xwe ya seksûel an jî nasnava xwe ya zayendî serî lê bide jî dibe ku serilêdana penaberên LGBTÎ+ên ji Tirkîyeyê neyê qebûlkirin. Çimkî di zagonên Tirkîyeyê de xaleke qedexeyî li ser homoseksûelîyê nîne. Ewropa dibêje “heger li welatê te homoseksûelî bi zagonan weke sûc neyê qebûlkirin em ji ber vê yekê nikarin te weke penaber qebûl bikin”. Lewma kesên ji Tirkîyeyê tene Ewropayê, Almaniyayê di vî warî de gelek pirsgirêkan dibînin. Ez çend kesan nas dikim ku dikarin bi vî awayî bikin. Gelek heval hene li vê derê pir zehmetî dikşînin. Çimkî Tirkîye ji bo LGBTÎ+an weke welateke ewle derbas dibe. Li Tirkîyeyê li ser kaxizan tu qedexe derbasdar nîne. Aliyê din ê vê mijarê jî ev e ku heger mirov ji hêla malbata xwe yan jî ji hêla komên din ve gefa mirinê xwaribe piştî hatina vê derê îspata wê jê tê xwestin û ev jî pir zehmet e. Çimkî ev tişt di heman demê tê wê mahneyê ku mirov xwe deşîfre bikin.

Li her welatan parêzerên xwedan şiyana dedektîfî yên Almaniyayê hene, bi almanî *Vertrauenanwalt* dibêjin ji wan re. Te di heger ez ji şopandineke homofobîk reviyabim Almanya wan parêzeran, wan karmendan peywirdar dike, dide vekolinê. Lê dipirse: Gelo ew kes bi rastî jî ji hêla

malbata xwe ve tûşî êrîşeke homofobîk bûye?, Gelo di bin şopandineke homofobîk de ye?, Gelo ji ber vê yekê “reviyaye”?, Gelo “ne reviya” ye? Li vê derê gelek mirovên bi çîrokên cur be cur hene. Lazim e mirov peyde bike, tomar bike. Lewra ev lêkolîna te, di vî warî de gelek bi qîmet e. Wekî mînak afgan hene, koçberên LGBTÎ yên îranî hene. Ew bi xwe jî bi zorê têne qebûlkirin. Ji bo LGBTÎ+ên îranî û afganistanî mafên mirovan pir hindik in; heta ku qet nîne jî, serilêdana wan a penaberîyê bi zehmetî tê qebûlkirin. Li vê derê, li Almaniyayê gelek penaberên LGBTÎ+ ên îranî û afganistanî hene ku wan bi şûn de şandine. Ango rewşa her welatî cuda ye, wer tê fikirin ku Tirkîye welatekî hîn serbestir e. Mehên çûyî Almaniyayê jî bo LGBTÎ+an Afganistan jî weke welatekî ewle senifand.

Ji ber van sedeman, ez wiha bêjim, bi rastî jî kesên bixwazin koç bikin divê pir baş hesabê xwe bikin. Divê dev ji gelek tiştan berdin. Li Tirkîyeyê her çiqas mirov weke LGBTÎyek ne xwedî jîyaneke hêsan be jî li Tirkîyeyê mirov derveyî nasnava LGBTÎ+ê xwedî pir derfetan e. Derdorên te yên civakî, derdorên te yên hevalan, karên te yên şuxilîne, zimanê te yê xwe derbirîne, zikakên te yên meşê... Ez dibêim di eslê xwe de tu xwedî gelek tiştan î.

Divê mirov hesaba vê yekê jî bike: Ez ê karibim dev ji kîjan ji van berdim? Ez ê bikaribim kîjan ji van li pey xwe bihêlim û biçim welatekî din û gelo li wî welatî çi tişt li benda min in? Çimkî ew welatê hûn lê difikrin, welatekî xeyalî ye. Her ku em ji filman an jî ji xwendinên xwe, ji bihistinên xwe wêneyekê çêbikin jî ew welat welatekî xeyalî ye.

Rêya ku tu lê dimeşî jî ne ya te ye. Mînak li vê derê dema ez dimeşiyam polîsan ez ceza kirim. Ez wiha bêjim belkî pêkenî be lê ceza heqê min bû. Çimkî di lempa zer de derbas bûm pênc ewro cezayê pereyan li min birîn. Ez behsa serdemên ewil dikim. Di wan serdeman de xwişka min bes pênc ewro jî bona hefteyekê dida min. Di wê hefteyê de mecbûr bûm min debara xwe bi wê pênc ewroyê bikira. Roja duşemê bû, diçûm mektebê, da ku dereng nemînim ji bo kursa zimên min lez dida xwe. Lempa trafikê li ser zerê bû û lempa qet neketibû ser sor. Ji ber vê yekê polîs ceza birî û mecbûr mam min hemû hefteneya xwe da polîs. Ev

mînaka herî hêsan e, tu yê çawa karibî bi ewleyî di rêyan de bimeşî? Tu nikarî. Lazim e tu hesaba van gişan bikî. Ne aîdê me ne: rêyên welatên din û biyanî; zimanê ku em pê diaxifin an jî nekarin pê biaxifin; derdorên me yên civakî. Li welatekî pir cuda gelo ji pêvojoyeke wiha re em amade ne? Lazim e mirov li vê bifikre: Ez ê çiqas karibim li ber xwe bidim. Ez ê karibim çend rojên xwe, çend hefteyên xwe, çend salên xwe bidim gihîştina (ne bi fizîkî) wî welatî. Ji bo ku ez bibêjim “belê êdî ez li vî welatî dikarim bijîm” divê dev ji gelek tiştan berdim û divê ez amadeyê wê yekê bibim.

Min gelek tişt ji dest dan, ez vê bi eşkereyî bibêjim. Min li vê derê belê gelek tişt bi dest xistin lê belê salên min ên ewil mişt ji dest çûn. Ji ber ku di temeke ciwan de bûm min hin tiştan cardin li xwe vegerandin. Heger ez di sî saliyên xwe de bihatama herhal ez ê di cih û pileyêke cuda de bibûma.

Pergala aborî tişteki werê ye ku piştî demeke diyar te weke takekesekê ku bi kêrî qezenca wê ya aborî bêyî nabîne. Bi çavê mesrefê li te dinêre, bi çavê zîyanê li te dinêre, bi çavê barê li te dinêre. Weke ciwanek hîna jî bi potansiyelî tu yeka wiha yî ku ji te qezenc bigrin. Ji ber wê yekê lazim e mirov bifikre bê dikarim dev ji çi berdim. Bi ser de ez li wan kesan difikrim, ji ber polîtîkî hatine vê derê û nikarin vegerin. Çimkî hin kes hene ji bona penaberîyê serî lê dane, piştî wergirtina statûya penaberîyê nikarin vegerin. Gelek mirov hene hatine vir lê belê hay jê bûne û dibêjin “a rastî ez ji bo vî welatî ne tu tişt im, qe nebe li Tirkîyeyê min dikarî tiştina bikim, bi awayekî polîtîkî xwe bidim derbirin. Kesin hene ku li Tirkîyeyê xebatên çalakvanîyê yên girîng kirine li vê derê, li Almanayê bi temamî wek ku ne tiştekin bin têne hesibandin. Nayên qebûlkirin ji ber ku weke mirovên kêmaqil têne hesibandin. An jî wan dadixin nasnava mexdûrîyetên wan. Bes weke qurbanîyên reben ên homofobîyê têne hesibandin. Lewma divê mirov baş li ser van bifikre.

Ser vê meselê bibêjim, hin hevalên ku hatine vê derê dema vedigerin bi bîr tinîn, her çiqas hin tiştan hilweşandibin jî li Tirkîyeyê gelek tiştên baş jî kirine. Piştî gelek kesan girtine. Gelek weşan pêk anîne. Lê belê aneha ew heval weke hiçekî têne hesibandin. Û di bin wê hiçbûnê de

zahf diçewisin. Çimkî ev welat derfeta afirandinê nade wan. Di biwara rewşenbîrîyê de, di biwara politik de, di biwara civakî de mafê afirandina naverokan nade wan. Anku bide jî bi destûra ku bi tenê di ser çîrokên xwe re biafirînin, dide. Te dî, we li Tirkîyeyê çi [êş] kişandin, de hadê behs bikin ji me re da ku em jî di derbarê wê de tiştina binivîsin. Wê mafê dide te ku tu çîrokên qurbanîyê biafirîni. Lewma divê mirov bifikre, hesabê xwe bike, ez nabêjim bila neyên lê belê lazim mirov hesabên her tiştî hûr û kûr bike. Û divê rêxistinîyeke baş ya LGBTÎ ya penaberî bê kirin. Hevalên me jî in. Di van deman de li vê derê nû bi nû hevalên lubunyayê ku ji Tirkîyeyê tên bi rêxistinî dibin. Hêvîdar im ev heval jî piştî demeke nezêde li hev bicivin û bi ser kevin. Lê belê serdemên ewilî zehmet e. Serdemên ewilî yê koçberîyê ji bo her kesî zehmet e.

Ez bême ser pirsê we ya dawî, ez nafikirim vegerim Tirkîyeyê. Heya beriya bi du salan min pir dixwest vegerim, çimkî ev der êdî ez fetisandim û her ku min bi daîmî li vir jîyana xwe domandibe jî li Tirkîyeyê bi taybetî bi tevgera LGBTÎ+ re têkiliyên min hebûn. A rastî min tim têkilî danîbû, tim hebû ew pêwendî. Berê min digot “gelo ez ê karibim bi vê nasnava xwe li Tirkîyeyê bijîm” û ez û hevjinê xwe em li ser çûyîne difikirîn. Pîlanên me jî li gor wê hebûn, lê belê min hevjinê xwe ji dest da. Mir. Min ew li vir binax kir û ez aneşa ji bo vê derê bi awayekî hestiyarî di rewşeke qefaltî de me. Belkî li dahatû cardin fikra vegeerê li min hay bibe. Ji ber vê rewşa xwe, ji ber berzeyê xwe aneşa mêrê xwe li vê derê bihêlim û biçim, li min weke terkkirinê tê. Her ku min teze ew ji dest [ne]dabe jî naxwazim wî bihêlim û biçim aneşa. Lê belê tim ew fikir hebû bi min û bi hevjinê min re. Çimkî em bi hev re hatin Tirkîyeyê li Stenbolê, li bajarên din me betlaneya xwe kir. Te dî ez dibêm em hesaban bikin, ez jî tevî hesaba homofobîyê dikifirîm ku bi hevjinê xwe re vegerim Tirkîyeyê.

Wek hûn jî dizanin xebateke min heye. Li ser politîka û tevgerên LGBTÎ+ên li Tirkîyeyê. Berê jî xebatên min ên cihê çêbûn. Bi zanîna min dixwest biçim û bêm. Lê belê ji ber vê sedema taybet e ez bawerim ez li Tirkîyeyê bijîm ez ê bi awayekî gelekî rihettir jîyana xwe bidomînim. Çimkî li gel nijadperestî û cihêkariya li vê derê, tu bi temamî têyî daxistin

weke bûnewerîya yekê biyanî. An jî bes têyî daxistin weke takeke homoseksûel. Tim mirov li nasnavêkê bê daxistin, li gel bê tevgerîn, mirov diweste. Qey li Tirkîyeyê ev tişt nîn in (?), helbet hene. Lê belê ez bawerim ez ê bi hêsantir karibim li hember van daxistinan li ber xwe bidim, li min wer tê.

Rojekê Bêyî Tirs Şiyarbûn Çi Azadiyeke Bêhempa

Ez Erce. Zarokê malbateke koçber im. Di malbateke piretnîkî de mezin bûm. Hema bêje temama jiyana min (heya bi saleke berî ji Tirkîyeyê derkevim) li Stenbolê derbas bû. Di biwara Zanista Siyasa de min lîsansa bilind xwend. Weke lêkolînereke serbixwe min xebatên akademîk kirin. Berê ez di sektorên qamûyî de û di biwara cîvaka sîvîl de xebitibûm. Neha weke penabereke polîtîk û mirovî li Ewropayê dijîm. Ez dixwazim parîkî bi destnîşankirina şert û mercên heyî yên li Tirkîyeyê dest bi serhatiyên xwe yên li Tirkîyeyê bikim. Di van çend salên dawîn de em di serdemeke weha de ne ku li Tirkîyeyê sazîyên civaka sîvîl ên ku bi angaştê pêşengîya tevgerên LGBTQ+an radibûn dest ji têkoşînê kişand an jî bi zorê destên wan hatin kişandin. Ji ber ku rewşa rojane naşopînim aneha naxwazim tiştêkî bêjim li ser rewşa heyî. Sedema reva min ji şopandina domdar a rewşa heyî ev e: Him ez bêrîya welat dikim him jî hewl didim li nûçeyên di derbarê Tirkîyeyê de nexwînim da ku xwe baştir hîs bikim. Bi kurtî dixwazim sedemên bingehîn ên derbarê vekişîna ji qadê ya tevgerên LGBTQ+an li gorî xwe şîrove bikim.

Yekser an jî neyekser bi her awayî li Tirkîyeyê ji hêla îqtidarê ve afirandina heyama tirsê xwe bi hemû tundîya xwe raber dike, bi rêya biryarnameyên di hukmê zagonê de bêhiqûqîya bêhnçikandî xwe bi hemû tundîya xwe raber dike, mueyîdeyên rêveberî yên dewletê (çi siyasî çi hiqûqî) ku bi her cîhazên xwe demeke dirêj e ketiye rewşeke hişavêtinê û bi hegemonîya xwe bi her awayî xwe ji nû ve diafirîne xwe bi hemû tundîya xwe raber dike. Dema ez li vana difikrim, divê mirov bi awakî zelaltir diyar bike ku li Tirkîyeyê tundî ketiye rewşeke îdeolojîkî. Êdî rastîyeke misoger e, tundîya welêt ya bi awakî bêstîsna ketiye rewşeke îdeolojîkî, em li heyama wê tundîya di ser mirovan de sepanî dijîn.

Di nav vê konjoktura heyî de, li gor fikra min tevgerên LGBTQ+an û sazîyên civaka sîvîl ên ku bi angaştê pêşengîya van tevgeran dikin jî bi şiklekî stûyê xwe li ber rêbazên terbiyekirina dewletê danîne, hema bêje wek şirketan tevdigerin. Yanê, em şahîdiya rastîyekê dikin ku civaka sîvîl jî bi fahmeke bazarhez dest bi tevgeran kiriye. Ev bi xwe dûrî fahmê ye: Dema mirov lê dinêre hin rêxistinên civaka sîvîl ya ku di nav hewldana man û nemanê de, wek demên berê di şertên îroyîn de jî dûryanê dixin navbera xwe û lêgerîna heqîyê an jî ji qada têkoşînê bêhtir bi mantiq û endîşeya mûçedarekî, karmendekî dewletê yê ku ji sîuca dîsîplîne vedidize tevdigerin, van tundîyên dewletê li xwe datînin û li hemberî tundîya sistematîk a li tevgera LGBTQ+ û lubunyayan sepanî bédeng dibin. Li vê derê dixwazim vê mînakê jî bidim, bi rastî jî tiştê ku ez behsê dikim ne “bizdonekîya kevokê”¹ ye. Têgihîştîneke gelekî jî wê cudatir û têra xwe tîkel û lêrûniştî. Ez dikarim wiha bi nav bikim: bi temamî bédengbûn an jî radestîbûna li wê tirs, tehakûm û tundîyê.

Di nav wê rastiya civakî û polîtîk ya behskirî de ku ji tecrûbeyên min pêk dihat, ez pê dihesim ku bi hesta tenetîyê re rû bi rû me. Talîyê, di nav vê pêvajoyê de wek mexdûrekî tehdeya fizîkî û psikolojîkî ji bo dabînkirina ewlehîya canê xwe û domandina şertên pêdivîyên tenduristîya xwe mecbûr mam terka Tirkîyeyê bikim. Her ku dem di ser re derbas bibe jî ne pêkan e ez tahde û kiryarên xerab ên hatine serê min pênasê bikim. Min pêvajoyeke psikolojîkî ya hest bi gefan kirî dît, bê ka ez ê heman tiştan cardin bijîm. Di vê pêvajoyê de ya eşkere bibêjim min karî bi tenê du sazîyên sîvîl li cem xwe bibînim.

Ez dixwazim parîkî firehtir bikim vê mijarê. Li gor fikra min li Tirkîyeyê lêgerîn û têkoşîna min a li ser heqîyê çî bi pêvajoya meyla min a cinsî de çî jî bi tahde û miameleyên xerab ên serhatî bergindeke xwe ya takekesî û civakî heye. Di derbarê lêgerîna heqîyê ya hemû nasnavên kêmaran (li gel ku ez li dijî vê pênasîyê me jî bi kar tînim) de ji bo ku berpirsiyarîya xwe ya mirovî û berpirsiyarîya li hemberî xwe bi xwe bi cî bînim ez pê dihesim ku divê hin tiştên bînin kirin. Bo berdêla vê rêgezê, ez tûşî

1 Nişeya wergêr. Behsa nivîsa Hrant Dink ya bi navê “Ruh halimin güvercin tedirginliği” [Derûniya min weke bizdonekîya kevokê ye] dike.

pêvajoyeke gelekî tund û ranegir kirim. Dikarim bi seatan behs bikim. Ev pêvajo çiqas dem bi ser de derbas bibe jî li ser mirovan çawa be li ser min jî wer bû tecrûbeyeke her û her şophişti. Em li Tirkîyeyê, li welat û civakeke werê dijîn ku pêvajoyên dijwar têne serê mirov, ev hemû tiştên derveyî aqil bi zorê bi me didin elimandin, an jî şîretan li ser pêdiviya vê elimandinê dikin.

Biskek berê min bal kişandibû, min gotibû “da ku xwe baştir hîs bikim ez pûte bi wê yekê didim ku nûçeyên derbarê Tirkîyeyê de nexwînim.” Belê hin caran difikirim ku Tirkîye jî bo min xelas, belê hinekî jî ber sedema pêvajoya bi serê min de hatî ber bi bayê hêrsê dikevim û dibêjim “Tirkîye jî bo min qediya çû”. A rastî, ev gotin parîkî li ser lêvan e. Bi mahna erdnîgarî, belê, dixwazim ev erdnîgarî jî bo min tune be. Weke zarokê malbateke piretnîkî ez jî eyn weke malbata xwe tim û daîm xwe weke dikeyekê, koçberekê hîs dikim. Ev rewş, a rastî jî zaroktiya min vir ve gelek pratîkan anî serê min ku [ev pratîk] di mijara hesta aîdiyeta Tirkîyeyê de dibin sedema lêpîrsînê. Dema ez di sektora qamûyî de dixebitim jî bi awayekî kûr ev tişt hat serê min. Li gel vê yekê, dema min têkoşînên gelên an jî yên nasnavên ku li Tirkîyeyê li heqiyê digeriyan û jî bo heqiyê hewl didan dîtin, min pratîkên civakî yên ku lêpîrsîna koçerbûna min bi xwe gengaz dikir jî dîtin. Belê, dibe ku jî ber bandora van tiştan jî dibêjim “jî bo min qediya çû.”

Di talîya vê pêvajoyê de min guh da pêşniyazên malbata xwe, yên derdora xwe ya nêz û pêşniyazên hevalên xwe yên parêzvanên mafê mirovan ên biwara civaka sîvîl, bi pêdiviya terkkirina Tirkîyeyê qaneh bûm. Bi awayekî hizra min li ser mayîne bû, li ser domandina têkoşîna pêvajoya li min tûşbûyî û ya lêgerîna hiqûqî. Ez dikarim bêjim bi awayekî ez hatim qanehkirin. Bi saya serê dostên xwe, ez hay jê bûm ku di warê dabînkirin û domandina ewlehîya canê xwe de ez di rewşeke pir xetere û teng de me. Di dema binçavkirinê de an jî di gava daxwaza îfadegirtinê de ew ê çî bihata serê min an jî min ê serencameke çawa bidîta giş cihê pîrsê bûn. Îcar bi ser wê rewşê, dostên min diyar kirin ku tiştê jî destê wan tê ev e: bi daxûyanîya çapemeniyê re belavkirina miameleyên bi serê min de hatî. Ji wê wêdetir jî, wek ku her kes pê dizane li Tirkîyeyê di van

demên dawî de pêvajoyên dadî bi biryarên nepenî kar dike. Ev biryarên nepenî li Tirkîyeyê hawirdorekî ku serê bêhîquqîyan hat nixûmandin afirand. Li welatekî bilêvkirin û belgekirina tahde û miameleyên xerab hatibe asteke gelekî dijwar mayîna [li wî welatî] ji bo min fikreke pir zehmet bû. Bi ser de kesekî xwedan vê tecrûbeya hanê... Her ku ji hêla hestan ve zehmet bibe jî bi handana malbat, hevjin û hevalên xwe re min bona serilêdana penaberîyê biryar da ku ji Tirkîyeyê veqetim.

Berê ji ber ku ez li ser penaber û penahendeyên LGBTIQ+an di rêxistineke navneteweyî de xebitîbûm, ji ber tecrûbeya min a ji qadê û têkilîya min a nêz bi penaberên LGBTI+an re min zanîbû ewê pêvajoya serilêdanê zehf zehmet e. Berî her tiştî di derbarê welatê ku serî li penahendeyê bidim de pêdivîya min bi pêvajoyeke biryardayîne hebû. Ji bo derbaskirina vê pêvajoyê serê pêşî min welatekî veguhastinê diyar kir. Li wê derê pênc şeş hefte mam. Di vê gavê de, dema ez xebatkara navneteweyî ya civaka sîvîl bûm hevalên min yên xebatê hebûn, hevdîtînen min bi wan re çêbûn. Hin komeleyên naskirî hebûn min bi awayekî profesyonelî bi wan re pêwendî danîbû, bi wan re hevdîtina min çêbûn. Di nav şert û mercên heyî de bi wan agahîyên ku min ji wan wergirtî, min li ser welatekî gihişt biryara xwe. Li gor hizra xwe ez ê di warê derûnî de bi rêya herî hêsan li wî welatî bi ser ketima, ew ê vê pêvajoyê li min hebekî din sivik bikira. Li pey vê biryara xwe ji welatê veguhastî min xwe gihand Swîsreyê. Li Swîsreyê min serî li penahîyê da.

Di derbarê zehmetkêşiyên li welatê xerîbîyê [koçberîyê] mînakên ewil ev in têne bîra min: lînêrîna penahende û penaberên LGBTI+an li ser entegrasyonê, berovajîkirina rasteqîniya politîk, zordestiya li ser peyrewên xwe. Ev zordestî çawa tê danîn? Di ser laş, hukm, zayend û nasnavên etnîkî an jî olî re bi afirandina tundîyê (an jî ji nû ve afirandina tundîya sazkirî) re tê danîn; bi rêya her û her dûpatkirina nasnav û rewşa xwe ya civakî re tê danîn û ev xala hanê jî balê dikşîne ser nasnava xwe, bi vê yekê re kesên din ji nedîtîne ve tê, wan weke dike saz û aforoz dike.

Ji dema hatina xwe ya ewil a Swîsreyê ez dixwazim behsa mînaka çavdêriyêke xwe ya din bikim. Hevaleke min a lubunya û Tirkîyeyî ez

pêşwazî kirim. Mazûvana min a ewil ev heval bû. Pêwendîya min a ewil pê re ji bo min gelekî hindekar bû: Ewîlî ji hêla LGBTÎQ+an ve, dûre ji bo dîtina pratîka civaka Tirkîyeyî ve û ji hêla arîşeyên di bin nêzîkahîya li ser navê pêvajoya entegrasyonê van her du civakên behskirî ve hindekar bû. Ji ber dirûvên xwe ya fizîkî, asta xwe ya perwerdehiyê û hukmê xwe yê li ser zimên li Swîsreyê rasterast min pratîkeke nijadperestî, cihêkarî û aforozê nehatim. Lê belê ya rastî bivê, di vî warî de pratîka ewilî li hember min di nav civaka Tirkîyeyî de pêk hat. Lewma ez dikarim vêya bibêjim, pratîka herî cihêkar û aforozê ya ku hat serê min di nav civaka Tirkîyeyî de pêk hatîye. Min dît bê tundîya laş û nasnavî, faşizm di nav xwe [wan] de çendî berbelav e. Min dît bê timî daîm tayînkirina nasnava kesên din di ser nasnava wan ya zayendî û heya aîdîyeta etnîkî yan jî li ser xuyanîna fizîkî çendî berbelavtir dibe. Ji ber vê sedemê min dît ku bi qasî di nav civaka Tirkîyeyî de heye di nav lubunyayan de bi xwe jî ji hêlekê ve hîmeke qeyranbûyî (vê pênaseyê li vir heveleke lubunya bi kar anîbû ewilî) heye. Derveyî van tiştan, ez bûm şahidê pratîkên çewsîner û aforozê ya lubunyayan ku hewl didan têkîliyên takekesî yên mirovan û pevrebûna cidî yên hestiyarî ya wan mirovan ji nîrxê bixin. Bo minak, li Ewropayê LGBTÎQ+ên bi HIVê dijîn jî hene û aha ev komên ez behsa wan dikim min dîtîye li ser van hevalan her û her hîyerasîyê datînin, weka ku dîkesazîyê biafirînin wan aforoz dikin û bêyî ku erêkirina van hevalan hebe rewşa wan a HIVê eşkere dikin. Li vê derê bi taybetî dixwazim vêya dubare bikim: li ser mijarên mîna eşkerekirina nepenîya jiyana taybet ya kesên din bi riya îxlalkirina parastinîyê² re (heya statûyên wan ên HIVê jî) an jî xwe bi xwe daxkirina kesên din weke krîmînalên dest nîşan dike ku pratîkên pîranîya lubunyayên ku li Ewropayê bi angaştê çalakvaniya LGBTÎQ+an radibin, dikekar in, li ser kesên din zordestîyê dikin, bi awayekî heteronormatîf nasnavan (çi zayendî, çi cînsî, çi etnîkî an jî çi olî) li dikeyan bar dikin û bi vê hêla xwe ve jî ne kêmi tundîya dewleta Tirkîyeyê ne.

Derveyî van tiştan, weke penaberekê bi derûnîya kesekî li welatekî nû di nav civateke herêmî de (pêvajoya lihevkerinê ya bi navê entegrasyonê) hînbûna zimên, adaptebûna civaka herêmî û pergala vê derê, ji ber cûdahîyên zimanî, çandî û çîni hin zehmetîyan min dîtînin. Bo nimûne,

2 n.w. ew mafê ku tu kes nikare dest bidê.

li Swîsreyê di mijarê nasnavên herêmi û serdest de, çavdêrikirina mekanîzmên aforozkirina îzafî yên nasnavên hev û din pir hêsan e. Di nav tevgera LGBTQ+an de homoseksûeleke ne Swîsreyî ya rastî dikare bibe sedema cihêbûn, aforozbûn an jî dikebûnê. Ev mijar ketiye rewşeke wiha ku mîna piraniya kesên êdî hêdîka wek ku li me jî rûniştibe. Cihêkariya di nav civata Tirkîyeyî de hat serê min jî, mîna vêya ye. Mirov bi rihetî dikare bibîne ku nasnava etnikî, meyla cinsî an jî zayendî her çi dibe bila be li vê derê di nav civata Tirkîyeyî de pêwîstiya lihevkerina sterotîpa serdest li mirov tê ferzkirin. Te di, vê carê jixwe em homoseksûel in, wek ku li her derê dibe li nav civata Tirkîyeyî jî pêkan e mirov daxkirina hebekî bi gotinên lubunî, qûnde, qûnek hwd. rast bê. Bo mînak, dema ez balê dikşînim ser an jî wer didim der ku homoseksûel im û bi mêrekî re zewicandî me, dibe ku malbateke min jî saz bûbe, ne hewceye ji bo têgeha malbatê bes binyadeke hetero bihewîne, vê carê tu dibîni ku ew awirên dikekar bi duqatî bi te didin hesandin. Em li pirsên wiha rast tên: Gelo çawa dibe ku du mêr bibin wek malbatekê? Yanê hûn ji xwe re dibêjin malbat? Bi rastî jî hûn xwe weke malbatê dibînin? Jê pê ve, li Ewropayê di nav tevgera LGBTQ+ a Tirkîyeyê de LGBT+ên kurd ên ku xwe weke piraniyê dest nîşan dikin hene, ji nasnava LGBTQ+ bêtir qada têkoşînê li ser nasnava kurdbûnê re saz dikin, di lêgerîna politîkbûnê de ne an jî di wê qadê de têdikoşin. Ev rewş tê fahmkirin. Ez dixwazim li vê derê behsa xaleke hebekî seyrbûyî ya vê rewşê bikim: Ger hûn ne kurd bin li vê derê di çavê civaka Tirkîyeyî û yê lubunyayan de bi xwe jî hûn dibin tirk; çerkezbûna we, cihûbûna we bergînda xwe nîne. Ev rewş paradigmaya nasnavan ya li Tirkîyeyê tine bira min. Tu ji Tirkîyeyê bi tirk î, şanseke din nîne. Li vê derê jî ger tu ji Tirkîyeyê bi û ne kurd bi weke tirkekî bertekan dixwî û wiha têyî nirxandin. Dema neheqî li te bibe, ji hevalên di nav têkoşîna LGBTQ+an de çigirtî bi awayê takekesî an jî girseyî yekser tu li bi vê şeweyê min behskirî bersiva xwe dibîni. Ez û hevalên lubunyayê ên ku li welatên cihê yên Ewropayê ne dema em li ser tecbûbeyên dipeyvin em dizanin ku ev rewşa hanê newekhevî û rewşeke êşdar e. Yanê bi kurtasî di nav lubunyayên Tirkîyeyî jî mirov dikare li pratîkên ditir ên şeweyên tetbîqî yên mîna dikekirin, cihêkarî û hin caran jî yên faşîzmê rast bê. A rast, ne bi dilê min ku di ser tiştên bi serê min de hatî re têkilî bi civaka Tirkîyeyî ên li Ewropayê re deynim.

Dema em bi hevalên lubunayên Tirkiyeyî yên ku li Swîsreyê an jî li welatên din in re peyivîn, me sedemên xwedûrkirina lubunayên Tirkiyeyî nirxandin bê çima ji têkoşîna lubunayên Tirkiyeyî ên li Ewropayê xwe dûr dixin. Di vê nîqaşê de, min gelek mînakên bihistin ku di navbera lubunayên Tirkiyeyî de cihêkarî û di gelek waran de eşkerekirina hevdu pir berbelav e. Yanê bi kurtasî dikarim wiha bêjim, cihêkarîya li nav lubunayên Tirkiyeyî yên li Ewropayê dem bi dem enerjîya meriv dixwe. Yanê dema em têkoşîna li Tirkiyeyê bidin ber çavan, gelek pratîkên me dest nîşan dikin ku ji destê me nayê em têkoşînê bi rasteqînîya xwe bidomînin.

Ez dixwazim ji serî de dest pê bikim, behsa şopajotîna pêvajoya xwe ya hiqûqî bikim. Ewîlî hatim û çûm navenda serîlêdana penahîyê. Min îfadeya xwe ya rêwîtiyê da, di wê pêvajoya îfadeya rêwîtiyê de şopa tiliyên min wergirtin. Sedema wergirtina şopa tiliyên min jî ji ber pêwîstîya Peymana Dublinê bû, divê li welatê ewil yê xerîbîyê di serîlêdana penahîyê ya her kesî de hebe. Li pergalê hat venêrin bê welatekî din a xerîbîyê heye an na, berê min bo penahîyê serî li welatekî Ewropayê daye an na. Piştî îfadeya ewil ya rêwîtiyê li navenda serîlêdanê ji min re behsa xwegihandina tendurîstiyê, di pêvajoya kontrola serîlêdana min de (pêvajoyeke bi mehan carina ji bo hin kesan bi salan dikare dirêj bibe) hêj berî bidestxistina statûya penaberîyê (statûya penahîyê) behsa mafên sosyalê kirin. Girîngî bi meyla min a cinsî dan û li gor çêbûna pêdiviyên min navendan dest nîşan kirin da ku bikarim agahî derbarê înfeksiyonên perokî werbigrim, testê belaş bikim; di mijarên rêxistin û sazîyên tenduristî de yên ku him jî bo mêran him jî ji bo jinan kondoman belav dikin û di derbarê sazîyên ku materyalên parastinê dabîn dikin de hatim agahdarkirin. Dûre transfera min bo kantonê hat kirin. Ev pêvajoya bendemanê li gor dosyeya serîlêdanê, li gor çarçoveya tecrûbeya şexsî bi xwe ya her kesî dimeşe. Bi her awayî giştîkirin bi rastî jî ne pêkan e û li gorî min divê mirov xwe ji wê giştîkirinê dûr bixe. Hin hevalên me du meh, hin jî wan sê meh li bendê man lê min di dawîya salekê de hevdîtina xwe ya duyemîn pêk anî. Lê belê piştî min hevajînê min jî ji ber rewşa xwe ya politîk a li Tirkiyê mecbûr mabû serî lê dabû. Hevjînê min hema hema piştî serîlêdana xwe kir bi sê meh şûn

de destûra xwe ya niştêcîbûnê wergirt. Ev bi temamî li gor zêdebûna dosyeyên li navenda serilêdanê diguhere. Li gor zêdebûna dosyeyên li ber destê dozgera dosyeya te, li gor berhevkirina agahiyên di derbarê hincetên dosyeyê de, li gor piştrastkirina belgeyên te hwd. diguhere. Ez dixwazim cardin balê bikşînim ser tiştêkî, pêvajoya hevdîtina duyemîn a bendemana biryarê bi rastî jî westîner e û ji hêla derûniyê ve zor dide mirovan.

Swîsre di warê entegrasyonê de, xwedî pratîkeke erênî ye bi navlêkirina min. Li vê derê ya rast dema mirov li civaka Tirkiyeyî an jî li hevalên LGBTIQ+an dinêre, dibîne ku bi awayekî arîşeyî pêşwazîya entegrasyonê kirine û berginda hemwateya wê weke asîmîlebûnê dîtine. Halbûkî, entegrasyon di serî de lihevkirina şert û mercên civakî û çandî yên heyî ye, yekparebûn e, bi awayekî baştir xwe derbirin e, heta ku li vê derê domandina têkoşîn û nasnava polîtîk e bi dîtina min. Di pêvajoya entegrasyonê de mirov dikare hin mafên mîna fêrbûna zimên û hînbûna pişeyekê bi dest bixe. Divê mirov diyar bike, ev tişt jî bi piranî dikarin biguherin û her kes jî tecrûbeya xwe ya şexsî dijî. Piştî venêrîna dosyeya we, piştî hevdîtina duyemîn serilêdana we an tê redkirin an jî tê qebûlkirin. Dema hûn biryara redkirinê werbigirin, mafê we ye ku hûn îtiraza xwe bibin dadgeha bilind û li pey redkirina wê jî bibin dageha federalî ya herî bilind. Piştî wergirtina biryara redkirinê ji dadgeha herî bilind yanî dadgeha federalî êdî wan ez bi mijarê agahdar kiribûm ku ew ê dest bi karên paş vegerandina min bikin. Mirov ji bingehe dest bi pêvajoya entegrasyonê dike. Fêrbûna zimên, bi jiyana îdarî û civakî ya vê derê re lihevbiyîn û hînbûna pişeyekê...Piştî pêvajoyeke pênc salan êdî pêwîst e hûn li ser her du lingê xwe bin. Piştî ghiştina asteke têr ya zimên mirov dikare dest bi kar bike.

Divê em her sê têgehên di derbarê penaberîyê de baş fahm bikin. Koç çi ye an jî koçber kî ye? Koçber kesek e bi mebesta başkirina rewşa xwe ya aborî û civakî ji bo zêdekirina hêvîyên xwe û malbata xwe yên aborî û civakî yên li ser pêserojê koç dike (ber bi bajarekî, welatekî, herêmekî dîtir ve). Nexwe penahende kî ye? Kesek e wiha ye: Ji ber ku endamê komeke civakî ye, ji ber aîdiyeta xwe ya olî, nijadî an jî aîdiyeta komeke diyar

a civakî û ji ber sedema ramana xwe ya siyasî tûşî tahde û miameleya nebaş û zilmê bûye; an jî dibe ku ji ber sedemên xwe heq tûşî wan tiştan bê; ji ber tirsê tûşbûnê dev ji welatê xwe yê hemwelatîyê berdide, mecbûr dimîne terk bike, nikare vegere welatê xwe yê hemwelatîyê û naxwaze ji vegere. Li vê derê dixwazim bala vê yekê bikşînim homoseksûelî bi tena serê xwe weke sedema serîlêdanê nayê pejirandin. Berî her tiştî divê cardin balê bikşînim ser: Serê pêşî ji bo serîlêdana penahîyê dixwazim kesên xwedî hincetên heq, xwedî sedemên derbasdar û yên dikare bê selimandin hincetên xwe bipeyîtînin, bi belgeyaan piştrast bikin. Heta di hevdişîna ewil de belgeyê hiquqî bi mirov didin îmkirin. Pêwîst e mirov îmze bike. Bi awayekî mirov rayeya lêkolînê dide peywardarên hiquqî yên welatê penahîyê ku belgeyên bi rêya nûnerên ji welêt tê piştrast bikin.

Li welatê ku mirov biçê divê bi çavê veqetîna ji çand û zimanê xwe li entegrasyonê nenêre. Berovajîya wê divê hûn weke pêvajoya xwedêbirîneke hêsantir û xweavakirinekê lê binêrin weke ku hûn xwegihandîneke hêsan û bi lez ya mafên civakî yên mîna perwerdehî û çandî, bi dest bixin. Danîna tîkîlîyên zêdetir bi civaka herêmî re him di warê zimên de gelekî girîng e him jî di warê gavkirina zehmetiyên li pêş mirov de dikarin mirovan bigihînin mirovên alîkar.

Gava min pirs dîtin ya herî zehmet ev bû. Dema min ev pirs dît... Belê min jî cardin ev pirsê hanê ji xwe kir, min go "gelo tu bêriya Tirkîyeyê dikî?" Ez bêriya Tirkîyeyê nakim, lê bêriya taxa xwe dikim, bêriya wan cihan dikim ku tevî malbata xwe lê bûm. Bo mînak tiştek bê serê malbata min a herî xerab ew e ku ez ê nekarim biçim Tirkîyeyê. Kekê hevjinê min mir beriya bi hefteyekê. Me rojên gelek westîner û hêrsoyî derbas kirin. Me di ku ne di mirinê de ne jî di silametiye de em ê nekarin li cem hezkiriyên xwe bin, em ê nekarin bi rastî jî serdana wan bikin. Ez li ser navê xwe bibêjim di rojên ewil ên hatina min de li Tirkîyeyê herî zêde min bêriya pisikên xwe dikirin. Dawîkê ew jî hatin vê derê. Ez bêriya hevalên xwe dikim. Hin hevalên min hene ji ber şert û mercên aborî nikarin vîze werbigrin û ez nizanîm bê ez ê kengê wan bibînim. Belê ez bêriya Tirkîyeyê nakim lê bêriya Samatyayê dikim. Bêriya tax

û kolanên lê bûme dikim, bêrîya Cîhangîr, Kurtuluş, Dîkîlîtaşê dikim, bêrîya îskeleya Beşiktaşê dikim, bêrîya Bosforosê dikim, gelekî bêrîya vapûra Kadikoyê dikim. Têra xwe helbest e ji bo min Stenbol. Lê belê îro, rastîyek heye li xwe mikur tēm: Min qet bîra wê yekê nedikir ku ez bêgav bim serî li penahîyê bidim. Lê van rojan jî min fahm kir ku rojekî bêyî tirs şiyarbûn çî azadîyeke bilind e. Wek ku min gotî Tirkîye ji bo min ji heval û taxan pêkhatî ye. Tirkîye bi awayekî fizîkî bo min êdî qediyaye, lê belê têkoşîna me ya li wê derê, têkoşîna me ya bo wê derê ew ê bi awakî dem bi dem bidome. Di helbestên min de hîna jî Stenbol heye bo nimûne, em bêjin qediya jî tiştên ku mirov nikare biqedîne dimîne li pey. Fikirîna vegeza Tirkîyeyê jî dike ku anksîyeta min zêde be, ji ber sebebên xwe yên derbasdar dike ku ez bitirsim. Rojekê vegeza Tirkîyeyê ji bo min pirseke pir piştî kêrê ye. Tu rastîyê bixwazî ez ê nekarim bersiv bidim. Bersiva aneha dikarim bêjim, na ye, ji bo betlaneyan be ji naxwazim biçim, vegerim.

Carina Karê Me Ji Yê Li Tirkîyeyê Zehmetir E, Bêhenek

Navê min Ekrem e, homoseksûeleki Cis-mêr im. Jidayîkbûna min 1981, Dêrsim e. Min dibistana seretayî li gund xwend. Dûre ji bo dibistana navîn çûm Elazîzê. Li wê derê bi qasî sê salan li cem merivên xwe mam û min dibistana navîn li wê der qedand. Serdemên ku ez behsê dikim salên 91-94an bû, di wan deman de li hin herêman şer gurr bû. Ez dibêm sala 1993an bû, gundê ku malbata min lê bû di bin zordariyêke giran de bû, bi rastî jî naskirina min û tundîya dewletê jî tam li wê wextê rast tê. (Di dibistana seretayî de lêdanên ji ber axaftina bi kurdî em nehesibînin). Her tim diavêtin ser malan, mirov dihatin binçavkirin. Dîsa di serdegirtineke rûtîn ya malê de ji ber miameleyên kêfî ên leşkeran min bi wan re gengeşî kir. Lê dûre têra xwe li min xistin, di sêzdeh salîya xwe de bûm. Di sala 1994an de me bar kir Stenbolê. Li Stenbolê di lîseyê de min derdorên politîk nas kirin û bi awayekî çalak min dest bi tevlibûna tevgerên ciwanan kir.

Di wan serdeman de çend caran hatim binçavkirin, dûre di sala 2000î de hatim girtin û panzdeh mehan di girtîgehê de mam. Piştî derketinê, dadgeh dewam kir û di sala 2003an de ceza li min birin. Piştî binçavkirinê bi demên cuda, derbarê me de doz hatibûn vekirin û ev dozên min jî dewam dikirin. Piştî birîna cezayên hepsê min nexwest cardin bikevim girtîgehê. Wekî din wê demê serdema nû ya vebûna F tîpiyan bû, tahdeyên giran û tecrîd hebûn. Min demên ewil li E Tîpiyê mabû. Li pey re Operasyona 19ê Çirîya Paşin qewimibû li hemû girtîgehên û bi vê operasyonê re em veguhastibûn girtîgehên F tîpî. Pêvajoyeke giran bû û helbet min jî nexwest cardin vegerim girtîgehê.

Bi pêşengîya merivên min ên nêz ên li Hollandayê, ez hatim Hollandayê min serî li penaberiyê da. Li wê derê li pey prosedûreke du sal û nîveki domandî min destûra nişetçihîyê wergirt û li Rotterdamê bi cî bûm.

Bi rastî em nîfşeke bêsiûd in. Berî her tiştî me qeyrana nasnavî derbas kir. Dema berê xwe didim rabirdûyê û bîr dibim timî vê yekê derdibirim. Me ew dem nekarî xwe nas bikin, me nekarî rêyekê peyda bikin. Aneha li welatên cuda mirovên gelekî cuda heman rewşê dibinin, ez gelekî li ber vê yekê dikevim. Di dema me de li Tirkîyeyê tevgera LGBTÎ+an hema hema tune bû. Haya me ji hevdiin û çalakîyên hûr û teng nîn bû. Bes min seh kiribû ku li Enqereyê ekîbeke bi navê KAOSê heye lê belê min baş nedizanî bê çi dikin çi nakin. Ji bilî wê zêde ji kes tune bû ji bo ku em biçim cem wan an jî ji me re bibin mînak, me nedikarî xwe pênase bikin. Mînak min digo qey li dinyayê ez bi tenê me. Min digo qey bi tenê ez im xwedî van hîsan. Te dî timî dipirsin û dibêjin “tu ji kengê ve xwedî van hîsan î an jî kengî tu hay ji xwe bûyî?” Ji roja roj de haya min ji cudahiya xwe hebû. Bi taybetî dema li dibistana navîn ez tûşî zorbazîyên hemsalên xwe bûm ez baş bi cudahiya xwe hesiyabûm, ji ber ku ez ne wekî wan bûm. Axaftinên min, liv û tevgerên min, tiştên bala min diçû li ser wan giş cuda bûn. Ji hêlekê ve tu ji xwe nefret dikî, ji hêlekê ve jî bi xwe re dixeyidî lê belê tu nikarî xwe pênase bikî. Min heman tengezarî li lîseyê dîtin. Dibe ku min nêzî asta tundîya fizîkî tişt nedîtibe lê belê bi gotinên mîna topo, qûnek, nonoş hwd. bi tiştên klasîk ên tinazan re ez tûşî zorbazîyên hemsalên xwe bûm. Parikî jî dezawantajeka min a wiha jî hebû û timî jî vê yekê dibêjim, ger min di wê derdora politîk de cî negirta min ê bala xwe bidaya lêgerîna xwe û min ê dest bi lêgerîna hin kesan bikira. An jî, çi zanim, min ê bêtir dêhna xwe bidaya vê nasnava xwe. Wê demê zemîna politîk, tevgerên politîk xurt bûn, ez ji di nav wan de bûm. Ji ber ku dezgehên ne takehez û ne takenivend in bi halê heyî tu jî nikarî tiştên bi xwe ve eleqedar bîni ser zimên, li pey a xwe bikevî, her carê taloq diavêjî ser a xwe, bi curekî tu dev ji xwe berdidî.

Lê belê tiştêkî wiha tê bîra min: Di 19 salîya xwe de hatim girtin, a rastî hîna zarok bûm. Di F tîpîyê de ji heman doza sîyasî hevalekî min ê hucreyê hebû. Min bi peyva “keko” bang lê dikir, bi temen ji min mezintir bû. Rojnameyên dîyarkirî dihatin ji me re, me bes dikarî ew bixwenda. Di rojnameyekê de nûçeyeke wiha hebû: “li Beyogîlî terora travestîyan”, dîsa yek ji sernûçeya klasîk a wê demê. Min jî pirseke wiha kiribû: “Keko ev travestî, homoseksûel çi ne, heger em şoreşê pêk bînin em ê van deynin ku derê, gelo politîkaya me ya li ser van çi ye?” Helbet gava min pirs a xwe

jê kir di nav wê hewldana dîkekirinê de bû û min hewl dida ku xwe li derveyê bigrim. Ew jî ji min re gotibû “ew nexweş in, dema me şoreşê pêk anî em ê wan derman bikin.” Van gotinan ji hêlekê ve ez tirsandibûm lê belê ez bi ser wî de neçûm. Ji hêlekê ve jî tişteki di nûçeyê de xwîna min li xwe germ kiribû. Di navbera min û vê nûçeyê de nêzikayîyekê hebû lê belê min tu tiştî jî nezanibû. Te di mirov pêwendîyekê datîne, nêzikayî li xwe hîs dike, tişteki wiha. Helbet ew bersiva min ji “keko” girtibû kir ku xwe bimelisînim, xwe tune bihesibînim.

Wê demê bi awayekî platonîk dilê min ketibû yekê ji girtîgehê. Şert û merc, tecrîd, tahde, greva birçîbûnê hwd. xema kê ye...Tim lê difikirim, ji hêlekê ve min li hestên xwe jî dipirsî. Bi eqlê wê demê min bi xwe ji xwe re digo “ev tişteki ku bi destê min diyarkirî be nîne”. Bi cureyekî halên xwe-qanehkirinê ye. Bi gotinên mîna “hesteke gelekî pak e, hesteke gelekî xweş e, çima xerab be, çima nexweşin e?” min xwe bi xwe hesab bi xwe re didît. Ji hêlekê ve ez xwe bi siûd hîs dikim, nasnava min a cînsî ne vekirî û diyar bû û min zordariyeke cidî jî nedidît. Jixwe di bîst û sê salîya xwe de hatim vê derê, piştî hatina vê derê helbet bêhna min derket. Li çend cihan rastî alayên keskesor hatibûm, parikî min dest bi lêkolînê jî kiribû. Di wê pêvajoyê de min xwe bêhtir nas kir, bêhtir kişif kir. Dûre min tevgera LGBTÎ nas kir.

Sedema bingehîn a ku ez ber bi koçkirinê ve dahv dam pêvajoya hiquqî bû. Ev pêvajo nebûya dibe ku ji ber nasnava xwe ya cînsî, daxwaza xwenaskirîna, daxwaza vedîtina rêyekê jî dê berê min bidaya koçkirinê.

Aneha dema lê dinêrim sedema min a ewil ne homoseksûelbûna min bû. Sedema min a ewil peydakirina wareke ewle bû ji bo jiyînê. Malbata min malbateke zêde zordar nebû lê axirî wê demê wêrekîya min nîn bû bi wan re rû bi rû bibim. Bi awayê herî vekirî divê min xwe ji wê civakê bişûsta, bawerîya min ev bû. Dema merivên min ên vê derê bi pêşniyazeke wiha hatin ez jî wiha fikirîbûm: “Belê, ew der rihet e, dê derfeta min hebe ku xwe bi xwe, bi tenê bijîm, tu kes nikaribin zordarî li min bikin.” Ez dibêim li ser wergirtina biryara koçê di xwebûnîya min a jêr [derhiş] de bandora nasnava min a cînsî jî heye.

Dema min dîroka tevgera LGBTÎ+ê an jî dîroka komeleyan xwend, di demên behsê dikim de LAMBDA ne rêxistineke sazîyî bû. Civîn hatine lidarxistin lê belê di nav komên teng de bi rê ve çûne. Ez dibêm dîsa di heman demê de, li Zankoya Stenbolê klûbek hebû li ser bingeha zayenda civakî dixebitî, min ew jî bihîstibû lê belê armanca min a pêşî cuda bû û derfeta min ji bo lêkolîneke hûrgilî pêk nehatibû. Wê demê min navê Kaosê seh kiribû, ez dibêm yekem tevlîbûna wan a Yekê Gulanê bû. Helbet dema ku min seh kir kela dilê min rabûbû. Bi vê gotina “Çawa ya, birra jî li Enqereyê komek kovar derdixin û parastina homoseksûelîyê dikin”, ez metel mabûm, kelecana bûbûm. Bi fikra min heger ez li Tirkîyeyê bimama teqez ez ê tevlî rêxistineke LGBTÎ+ bibûma an jî min ê di baskeke tevgerê de cih bigirta. Carina jî ne ku li ber vê yekê nakevim. Jixwe ez ji erdnîgarî û kevneşopîyêke têkoşîner têm, ê jixwe ew ruh jî heye, çima nebe.

Koçkirin hest û rewşeke zehmet e; mirov dev ji kesên xwe, jiyînên xwe, biranînên xwe û cihên ku hez jê dike berde û biçe. Li pey hatina Hollandayê bi sê rojan êş li mîdeya min xist. Di wan rojên ber bi hatina xwe ve min stresên dijwar dîtî. Li Stenbolê beriya li balafirê siwar bibim şikestinekê, xwe li dilê min gerandibû, li bafirgehê min xwestibû li dîya xwe bigerim û xatir jê bixwazim, lê min nekarî. Ez pir hez ji Stenbolê dikim, ji balafirê min her û her li Stenbolê temaşe kiribû, xemgîn bûbûm. Lê belê ji hêleke din ve jî bi gotinên mîna “çûyîna te wê qencir be” min han dida xwe. Demên ewil ku ez hatim vê derê bi awayekî cidî arîşeyên min ên xwebawerîyê çêbûn. A rastî te dev ji her tiştî berdaye û tu hatiya, cihekê wer ku tu çanda wî nizanî, îcar ê min qet fikra min derbarê van deran de nîn bû. Bes ji Almanayê û Hollandayê merivên me dihatin û diçûn, behsa hin tiştên ji warên xwe yên jîyanê dikirin lê belê ji bo min ew çend dûr bû ku! Qet rojekê bi bîra min neketibû ez ê bême vê derê, li van deran bijîm. Heyama ewil ji bo min pir cuda bû, zahf zehmet bû. Mînak min nedikarî bi serê bilind li kolanan bimeşim û min ji awirdana çav bi çavîya xelkê direvîyam. Ji ber ku min qet ji zimanê wan fahm nedikir, ez wiha dikfikirim: “heger kesek titştêkî ji min bipirse an jî bixwaze suhbet bikin ez ê çi bikim.” Min ew dem bi tenê îngilîzîyêke lawaz a ku ji lîseyê hîn bûbûm, zanibû. Mirov nikare

derbirana xwe bike, mirov dikeve rewşeke wiha ku xwezîya xwe bi zarokekî tîne. Hin zarokên merivên min diçûn dibistana seretayî û min xwezîya xwe bi axaftina wan a bi hollandî dikir. Min digo “çi zarokên jîr in evana”. Aneha dema bi bîr tinim kenê min pê tê, lê wê demê tam di haleke wiha de bûm. Hin hevalên me hene ji bo kar an jî ji bo master û diktorayê têne vê derê. Qet nebe ew rihettir in, pîlan û bernamêyan wan hene, dizanin ew ê çi bikin, pirsgirêka wan a zimên nîne.

Penaberî birra jî rewşeke tengazar û zehmet e. Demên ku ez behsê dikim hin tengezartir bûn. Aneha zêdetir mirov tîn, lewma jî peydakirina kesên mîna xwe parikî hêsantir bûye. Heta ku me li vê derê dest bi avakirina toreke bi navê Însiyatîfa Lubunya ya Ewropayê jî kir. Anaha li her derdorê hin kes hene, mirov dikare xwe bigihîne wan, biçe cem wan. Wê demê mirov kêmtir bûn.

Min demên ewil xwe li derdorên merivên xwe digirt û ji bilî wan kesên min ên nas tune bûn. Li derdorên wan kesên ku weke karker hatine Ewropayê zêdetir kes li gel hev hene. Li Tirkîyeyê li ber şert û mercan an jî ji ber erdnîgarîya xwe hîndarî an jî perwerdehiya pişeyî ya piraniya wan kesan bi sînor e. Mirovên ku ew dem ji ber pêkhatiyên kar û malbatê hatine di warê adaptebûna vê derê de bi her awayî ve kêman in. Wek ku di demên xwe yê hatî de, di salên şêstî û heftêyî de asê mabin. Ez vê yekê bi giştî ji bo civaka Tirkîyeyî dibêjim. Di suhbetên vê derê de, di nîqaşan de ez pê hesiyam ku ez ne aidê vê derê me. Hêj destûra min a neştecihiyê nîn bû û ez li cem merivên xwe dimam. Bi rengên xwe yê mirovî hemû, mirovên baş in, ew tiştekî cuda ye lê belê ji hêla fikran ve cihê bûn. Min şahidîya tiştekî wiha kiribû ku ez metel hiştibûm: Ên me, li malê bi kombûneke qelebalix li televîzyonê bernamêya mûzîkê temaşe dikin, Engîn Arslan li tembûrê dixê. Di wê kêliyê de yek ji wan go “tu lê binêr, wek jinan por dirêj kiriye, guhar li xwe kiriye.” Behitîm, lê fetilim û mat mam lê belê min nekarî tiştekî bibêjim. Bi ser de evana qaşo dêrsimîyên me ne û kurdên polîtîk in. Îcar hûn li kurdên din û Tirkîyeyîyan bifikirin êdî. Rol û normên zayenda civakî pîrr zelal û tûj in. Bi taybetî yê ji Anatoliya Navîn hatî pîrr girtî ne, bi xwe ve badayî ne. Li hin bajar û taxên diyar li hev civiyane, getto ava kirine. Qehwexane, komele, mizgeft

pir zêde û berfireh in û ji civaka vê derê re û ji jiyana rojane re girtî ne. Ev rewş bi rastî li min xerîb nayê. Hema bêje di her welat û civakan de kêmar bêtir bi xwe ve badayî ne, di nav hev de dijîn. Li Tirkîyeyê kurd, ermen, elewî, xeyrî-misilman bi heman awayî ne.

Bi giştî neteweperestên Tirkîyeyê yên li vê derê ew çend şovenîst û kevneşoperest in hew dibe. Gava li Tirkîyeyê ew çend ne bawermend in, lê belê dema têne vê derê bêhtir bawermend û bêhtir neteweperest dibin. Rewşa wan a li wê derê piranî û desthilat e, lê li vê derê dikevin kêmarîyê, dibe ku ev rewş liv dabe vê yekê. Piştî wergirtina destûra niştecihîyê min xwest ku mekteba xwe li vir bidomînim û min dest bi pola amadehî ya zankoyê jî kir. Helbet bi giranî perwerdehîya zimên heye. Dema min dest bi hînbûna hollandî kir, li cem min tiştêkî wiha ji xwe ber pêk hat: Ê zimanê min ê dayikê heye, kirmanckî û ji ber neaxaftinê rewşa wê hema bêje li ber jibîrkirinê ye. Min dest bi axaftina kirmanckî kiribû bi merivên xwe re da ku ji bîr nekim. Ez dibêm dema mirov zimanekî nû hîn dibe, mirov qedrê yê heyî an jî yê li ber çûnê jî digre û wî zimanî jî hembêz dike. Dibe ku berteke dijber jî pêk bê, nizanîm. Wek ku bêhtir hesta hembêzkerina neteweya xwe, ya ola xwe û ya çanda xwe li cem mirov peyda dibe. Dixwazim bêjim, fikirîna li ser rabirdûyê li vê derê bi cureyekî mirovan dixe nav rewşeke girtî. An jî dike ku mirov ji civaka vê derê veqete û bi dikekîrîna wan jî bijî. Li cem Tirkîyeyîyan ev heye wek ku. Bi halê heyî, zarokên gihaştî, nevî jî dibin weke wan. Rewşa LGBTÎ+ên ku li hewayeke wiha ji dayik bûne, mezin bûne û tê de dijîn zehmettir e. Li vê derê carina karê me ji yê Tirkîyeyê zehmetir e, bê henek.

Mirov helbet cihêkarî û nijadperestîyê dibîne, hîs dike. Jixwe Hollanda axirî ji nijadake cermen pêk tê û nijadeke zerik e. Tu li vê derê “ser-reşik î!” Her çi qas mirov adapteyê civakê bibe jî, derveyî têgihîştina misilman-tirk/erebên dikekîrî bijî jî asoxî tu bîyanî yî û tu her tim vê yekê hîs dikî. Di hişên wan de kodên ku li ser te avakirine hene, giştîkirinên hînkirî hene û piranîyên wan jî nikarin vê yekê bişkênin, derkevin derveyî wê. Pirsên mîna “tu araqê vedixwî, goştê berazan dixwî?” tu carî bi dawî nabin. Ev qalib û nêrinên qure wek ku min dîtîye li cem komên anarşîst

û xwesorîxwaz nîne. Lê belê di nav jiyana rojane de, li karxaneyan, li cem cîranên xwe mirov vê yekê hîs dike. Tu tişt neqewime jî di her qada jiyane de dîrayîyek heye û tu bi vê dîrayîyê dihesî. Helbet ji bo tevahiya civakê mirov giştîkirineke bi vî rengî bike ne rast e û ev rewş xususiyeteke vê derê bi xwe jî nîne. Bes mirov biçe ku derê nikare ji vê belayê xelas bibe, dixwazim behsa vê bikim. Bi ser de ji bo min jî ne rewşeke nû ye. Wekî kurdekî, elewîyekî ku li Tirkîyeyê ji dayik bûye, li wir mezin bûye cihêkariya li vê derê ji bo min ne hêjayî gotinê ye jî. Wekî din bi awayekî cidî îslamofobî heye. Bi taybetî piştî DAÎŞê erd û ezman pê hesiyan. Helbet weke lubunyayeke esmer û bi rî dirûveke çawa didim tam nizanîm lê belê ez bawerim hin kes bi çavên metirsî li min jî dinêrin. Rewşeke pirr absûrd e, lê belê hin caran kesên rîdirêj û bikumik dibînim hesteke wiha bi min re çêdike ku dixwazim cardin vegerim lê binêrim, kontrol bikim. Te di carê çep û rastê mirov li hev dikeve, ev rewş jî wiha ye ez bawerim. Hin caran tatêla wê yekê jî dikim, dibêm “ger ez Hollandî bûma, gelo min ê çawa hizir bikira, min ê çawa nêzikayî pê bikira?” Li Ewropayê pir êriş çêbûn lê hê jî li vê derê êrişeke eşkere çênebû. Pirî caran êrişên berlêgirtî, malên serdegirtî, mirovên desteserkirî, teqemenî hwd. ketin rojevê. Bi awayekî xwezayî jî li cem mirovan tirs û metirsî heye, rewşeke fahmbar e. Lê belê rengêkî din ê vê cihêkariyê jî ev e: LGBTÎ+ên ku ji ber zordariyên olî ji erdnîgarîyên mîna Asya, Rojhilata Navîn û Efrîqayê revîyane, li vê derê jî bi wan tiştên ku jê revîyane têne kodkirin û nirxandin. Di sepanên Date’an¹ de ez jî çend caran tûşî heman cihêkariyan bûm.

Em werin ser mijara esil, parikî behsa pêvajoya penaberîyê bikim. Min di ser nasaveke polîtîk serî lê dabû. Raportên min ên tenduristîyê, biryara doza min a cezagirtî, belgeyên dozên min ên domandî hebûn. Prosedûreke cuda ji bo min bi kar anîn. Helbet hin heval hene bes ji ber meyla xwe ya cinsî serî lê didin û destûra niştecihiyê wê digrin. Tiştê min ji wan fahm kir prosedûr nêzî hev in. Dema mirov were Hollandayê divê di nav rojekê de yanî di nav 24 seatan de bi awayekî fermî serî lê bide. Bi kîjan rêyê û çawa hatibe bi wê yekê ve girêdayî ye, li balafirgehê an jî li navendên serilêdana penaberîyê yên welêt mirov dikare serî lê bide. Heger ji mirov re pirsgerêk

¹ Sepanên online ên ku bi kêrî hevnaşina kesên nû, flortkirin, civandayin û hevditinan tê.

be xwe bigihîne van deran dikare yek ji qereqolekê bişêwire û ew berê mirov didin navendeke serilêdana penaberîyê. Piştî serilêdanê, bi demkî berê mirov didin kampekê. Li gor zêdebûna kesan kêr zêde di navbera sisê û şeş hefteyan de ji bo îfadeya ewil bang li mirov dikin. Karmenda ku îfadeya te ya ewil werdigre heger bi gotinên te qaneh bûbe an jî tu bikarî delîlan pêşkêş bikî, te weke penaber pênase dikin û prosedûrê didin destpêkirin, te li kampekê bi ci dikin. Helbet tiştên te vegotî û sedemên te yên ji bo daxwaza penahîyê ne derbasdar bin û karmenda ku îfadeya te wergirtî bawerî pê neanibe dikarin te paş ve vegeerînin an jî wext bi te didin û dixwazin tu terka welêt bikî.

Pirsgirêka herî mezin ji bo LGBTÎ+ên ku daxwaza penahîyê dikin pêvajoya peyitandina nasnava cinsî ye. Beşa Koçberîyê di vê mijarê de pir hişk e û pir bi hêsanî dikarin bibêjin “ez ê çawa fahm bikim bê tu homoseksûel î?” Mebesta vê politikayê ev bû: Rê li ber wan kesên ku ne LGBTÎ+ in lê belê LGBTÎ+ê dikin hinceta serilêdana xwe bigrin. Di rabirdûyê de qewimînên wiha rû dane. Helbet di vê rewşê de jî cirma wê dikeve stûyê wan LGBTÎ+ên li jiyaneke nû û ewle digerin. Pîrî caran girîngiya beyanên şexsî namîne û derbarê nasnava cinsî de lêpîrsînên taybet têne kirin, îfade têne girtin. Heger tu nekarî xwe îspat bikî serilêdana te tê redkirin. Jixwe ev pêvajo giş bi destê parêzerekî bêpere yê dewletê ve tê meşandin.

Mînak destûra niştecihiyê nedan hevalekî me yê ji Tirkîyeyê penahende bû, peyva “îspat bike” lê ferz kirin. Di encama hewldan, itirazên demdirêj û serilêdana dadgeha bilind de encax karî destûra niştecihiyê werbigire. Li hember vê politikaya Wezaretê nerazayî û çalakî jî hene jixwe. Di bin sernava “Gelo têra xwe ne gey im?” de kampanyek jî heye jixwe, eve çend sal e jî didome. Bi saya pêkhatiyên raya giştî û kampanyan hin kes destûra niştecihiyê wergirtin, an jî li ser hin kesan biryara bi şûn de vegeerandina li welêt rakirin. Hollanda di derbarê LGBTÎ+an de bi çavê welatekî ewle li Tirkîyeyê dinêre. Dibêjin mirov bes ji ber meyla xwe ya cinsî an jî nasnava xwe ya cinsî nikare doza penaberîyê li Hollandayê bike. Tirkîye di vî warî de weke welatekî ewle xuya dike lê belê axirî li Hollandayê pisporên vî karî hene. Tiştên li Tirkîyeyê diqewimin

baş dizanin. A rastî haya wan ji tundî û zordarîya civakî, ji polîtika û tundîya dewletê, ji êrîş, ji kuştinên nefretê û ji xwekuştinan hwd. ji van tevan hene. Heger sedema bingehîn nebûna ewlehiya canê mirov be, heger qada jiyane li jîngeha mirov teng bûbe, rêyên hiqûqa navxweyî qediyabin li gor zagonên Hollandayê mirov dikare serî li penaberîyê bide. Helbet wan ev tişt kirine çarçoveya esasa xwe ya zagonî. Wek min go, dizanin bê LGBTÎ+ên li Tirkîyeyê tûşî çi tiştan dibin, haya wan ji polîtîkayên îqtîdarê heye. Bi halê heyî, kesên ku bi vê sedemê tên, serî lê didin û destûra niştecihiyê werdigrin hene.

Di derbarê wan kesên ku serî li penaberîyê didin de li welatên wan jî dibe ku lêkolîn û karên berhevdana agahîyan bê kirin. Em dikarin bi cureyekî ji bo van tiştên ku tu bi devkî vedibêji re bibêjin xebata erêkirinê. Helbet ev jî ne rewşeke wiha ye ku mirov zû bi zû lê rast bê. Mînak di derbarê min de li Tirkîyeyê lêkolînek kiribûn û bi awayekî mîna raportê pêşkêşî parêzerê min kiribûn. Heta ku dozeka din a di derbarê min de hebûye, bi agahdarkirina wan haya min jî jê çêbû.

Bi giştî pêvajoya penaberîyê heyameke dirêj û westîner e. Di derbarê vê mijarê de karîgerîya hêdî û giran ya wezaretê jî li welêt car bi car dikeve rojevê û tê nîqaşkirin. Her wekî din di vê mijarê de li hemberî Wezaretê doz jî hatine vekirin. Carina pêvajoyên ku divê di nav salek û niv de yan jî di nav du salan de biçe serî, sê çar salan heta pênc salan jî wext digre. Di hin rewşan de heger mirov nikaribe tu delîlekî pêşkêş bike, hin dosyeyên penaberîyê hene ku heşt-deh salan jî diajo. Mînak di kampa min de kesekî hebû jî Aksarayê hatî, heşt sal bû li benda qebûlkirina serlîdêdana xwe bû. Ji ber ku elewî bû, di ser tûşbûna zordarî, komkujî û miameleyên nebaş ên elewîyên Tirkîyeyî re serî lê dabû. Nizanim çi pê hat, dosye dirêjtir bû an na min tu xeber jê negirt lê ev bendemana dirêj pir jê biribû, derûniya wî ne baş bû û li kampê encax bi saya xwarina dermanan karîbû bihewe. Ji bo prosedûrên demdirêj ên penaberîyê gavên cidî yên Wezaretê nîne. Hollanda di vê mijarê de welatekî giran e, pir dosyeyên bi ser hev de hene. Ji bo lezandina pêvajoyan her roj tişteki nû dertê û dibêjin wê personelên nû lê zêde bikin. Ji hatina min vir ve şanzdeh sal qediya û ev şanzdeh sal e ev nîqaş didomin. Ez dikarim bi rihetî vê yekê bibêjim: Li Ewropayê tu

welat bi awayekî cidî pûte bi kesekî ku bi penaberî hatibe nade. Di dema bendemayîna destûra niştecihîyê de, hin caran dibe ku biryarên gelekî kêfî bidin. Mînak dibêjin di nav heşt hefteyan de em ê biryarê ragihînin. Tu jî dibêjî “ez ê du mehan biseknim û piştî du mehan ew ê tiştêkî bêjin min”, tu xwe motive dikî. Lê belê hê hefteya heştan nehatiye nameyeke din dişînin ji te re. Dibêjin “pêvajoya te berdeyam dike” û şeş hefteyên din dirêj dikin. Piştî şeş hefteyan dikarin sê mehên din jî dirêj bikin. Yanê bendemayîn dibe westîner û ji mirov dixwe. Helbet ne ku dozên kurt jî nîn in, hene lê pir kêmin.

Kampên penaberan piranî li bakurê welêt hatine avakirin. Kampên li cihên ku hejmara xelkê wê derê lê zêde ne têne girtin û [penaber] bêhtir ber aliyê [bakur] ve têne bicîkirin. Ev polîtîka him bi tecrîdkirina penaberan re kontrolkirina wan hêsan dike him jî li hemberî bertekên Hollandayîyan tê tetbîqkirin. Kamp birra jî gelekî xerab in. Ji gelek herêmên cuda, ji çandên cuda mirov hene. Bi taybetî mirov dikeve tengasiya zimên, nikare pêwendî deyne û ev tengasî jî rewşa hanê bêdebar dike. Mirov di odeyekê de herî kêmin bi çar kesan e, dibe ku zêdetir be jî.

Di kampa penaberan de mirov nikare bêje her kes hîjyenîk e, bi rêk û pêk e, a rastî cihekî welê ye li wê derê gelekî şer û pevçûn diqewimin. Li Hollandayê di nav kampên penaberan de êrişên cidî li LGBTÎ+an bû. Mirov ji herêmên ku şer, pevçûn, birçîtî lê ne ji bêgavîyê koç dikin û piraniya wan welatan jî ne pêşveçûyî ne. Dibe ku gelek ji wan di jiyana xwe de cara ewil LGBTÎ+an dibînin, bêyî ku ew kesên LGBTÎ+an qebûl bikin dibe ku tundîyê li wan bikin. Ji ber vê sedemê li kampên ewlehiya canê LGBTÎ+an nîne. Ez dibêm çar an jî pênc sal berê bû, li kampê êriş biribûn ser jineke trans, bi alavên birîndarkirinê ew bi giranî hatibû birîndarkirin. Carekê jî di meha tebaxê de bi avên kelandî êriş biribûn ser jineke lezbîyen û laşê wê di asta duyemîn de şewitibû. Di heyamên dawî de piştî zêdebûna êrişan li Amsterdamê li ser projeya kampeke taybet ji bo LGBTÎ+an hat nîqaşkirin lê belê hîna bi ci nehatiye. Mijareke nîqaşbar bû, hin çalakvanan li dijî wê rabûn û dan xuyakirin ku ew tê mahneya tecrîdê. Ji min kirî pir erênî bû. Ji ber ku mirov nizane

di kampên din de bê çi tê serê mirovan, bila be tecrîda ji civakê, qet nebe bêhtir rihet û ewle ye. Ji bilî van demên dirêj mayîna li kampan tenduristî û derûniya mirovan xera dike. Jixwe tu hatiya welatekî nû, nizanî çi biki, heval û merivên te yê pîştgirêdanê jî tune bin di her warî de pir ji mirovan dixwe. Ji aliyê aborî ve pêvajoyeke tengezar heye. Dora pêncî ewro pere heftane didin. Pêdiviyên bingehîn ên mîna vehewîn, xwarin, tenduristî têne dabinkirin lê belê bi pêncî ewroyê heftane ne pêkan e mirov debara xwe bike, pêdiviyên mayîna pê biqedîne. Ji ber vê sedemê bi hejmareke mezin ji penaberan weke kedkarên erzan têne bikaranîn, ji aliyê karbidestan ve tûşî kedxwarinê dibin. Berê ev tişt berbelavtir bû aneşa ji ber ku kontrol bi baldarî têne kirin şuxilandina bi qaçaxî kêma bû lê belê dîsa jî penaberin hene di karên giran de bi kedkarên erzan têne şuxilandin. Heger li vê derê kesên ku mirov li ba wan bimînin an jî kesên ku mirov carinan biçê cem wan tune be, ji bo wan kesan hesta tenêhiştinê pîrsgirêkeke cidî ye. Ji ber ku mirov di kampên penaberan de bêtir pîrsgirêka tenêti û xwebaweriyê dijî.

Di mijara penaberiyê de politîka û sepanên ji aliyê Yekîtiya Ewropayê, Neteweyên Yekbûyî û Rêxistina Koçê ya Navneteweyî (IOM) ve diyarkirî hene. Helbet li cihê ku mirov diçe pêgiri bi rêveberiya herêmî dike lê belê bêhtirî politîkayên navendî têne sepanandin. Her welat bi qasî hejmara penaberên serilêdayî ji NYê diravan digre. A rastî mirov nabe penaberê welatê serilêdanê dibe yê NYyê. Her welat ji bo xwe politîkayên xweser diafirîne. Mafên mîna şuxil, mekteb, xanî hwd. encax bi wergirtina destûra niştecihiyê dikarin bêne bidestxistin. Li gor welatan ev pêvajoyê û sepanên hanê biguherin jî kêma zêde heman tişt diqewimin. Mînak di heyama penaberbûna min de li Fransayê kamp tune bûn, hevalên ku penaberê wê derê dibûn bi awayekî cidî pîrsgirêkên vehewînê didîtin. Mirov diçe û dibe penaberê wê derê lê belê kamp nîne ku bi ci bikin. Ger li wê derê nasên mirov tune bin tê wê mahneyê ku li kolanan bimînin. Ji aliyê min ve penaberî pêvajoyek e ku gelek ji mirov dixwe. Serkeftina herî mezin ew e ku mirov vê pêvajoyê bi parastina tenduristiya derûniya xwe derbas bike, lewra ez bi siûd bûm zêde li kampan nemam. Ez li cem merivên xwe mam timî û bes hefteyê bi carekê çûm, min li kampê îmzeya xwe da. Heya ku mirov penaber be mecbûr e serê hefteyê carekê

îmzeya xwe bide. Bi cureyekî mirov dibêje “ez li vir im, li benda biryara we me” û helbet mafê we ji bo geşt û gera li welatên din nîne. Bes di nav Hollandayê de mirov dikare bigere. Li Almanyayê mafê we yê geşt û gerê bi herêm û eyaletan ve sinorkirî ye. Minak, di nav welêt de mafê we yê geşt û gerê ne bêsînor e.

Di kêliya serilêdana min de ji hêla ekîbeke pisporê Tirkîyeyê ve hevdîtina me hatibû pêkanîn. Di hevdîtîna de ji min re gotibûn “hûn li Tirkîyeyê mirovên di nav têkoşînên demokratîk de, dijber in, dibe ku bi hewlên we dê tiştin biguherin. Dibe ku hûn ê bibin welatekî demokrattir, wekhevîtir. Lê belê hûn giş birevin ew ê çawa be?” Ez şaş mabûm lê belê bi nermî min diyar kiribû ev tiştêkî gelekî şexsî ye, dibe ku êdî ez tirsiyabim an jî min wê hêza têkoşînê di xwe de nedîtibe.

Koçkirin diyardeyê lêferzkirî ye û hinekî jî biryareke şexsî ye. Girtina vê biryarê, sepandina wê ne hêsan e helbet. Ji xelkê re mirov bibêje neyê-neçe, bike-neke ne rast e. Bes min hewl da ku behsa şert û mercên vê derê bikim. Dema mirov weke penaber were şertên baş li benda kesî nîne, pêvajoyêke tengazar dê li bendê be. Berî her tiştî nediyarî, nezanîna ku dê çi bibe, nedîtina dahatûyê, nekarîna pîlana tiştêkî rewşeke zehmet e. Tu nikarî van tiştan pêk bîni ji ber ku “bêkaxiz î”, yanê destûra niştecîhîyê nîne. Ev nediyarî birra jî ji mirov dixwe.

Dem bi dem hinekan pirsra prosedûra vê derê dikin û li şertên penaberîyê dipirsin. Ez tecbûrebeyên xwe û zanîna xwe helbet parve dikim lê tatêla wê yekê jî dikim ka bi rastî têra xwe sedemên wan hene ji bo jiyîna van pêvajoyên tengazar. Hwd. gelo li Tirkîyeyê di kîjan şert û mercan de dijîn, bi rastî jî ji hêla malbata xwe ve tengasîyên cidî hene, pirsgirêkên ewlehîyê hene, ji hêla aborî ve pirsgirêkên cidî dîtine? Carina jî hin kesên bi qasî ku penaber bibin tengasî nedîtine jî dinivîsin, dipirsin kesên xwedî kar û baran, kesên xwedî karîyer jî.

Piştî têkoşîn, ked û berdêlên demdirêj li Hollandayê LGBTÎ+an gelekên ji mafên xwe bi dest xistin û bi zagonan kirin bin temînatê. Ev helbet tiştêkî xweş e, kêfa meriv tîne. Lê belê guherîn û veguherîna civakî

dîyardeyeke cihê ye. Li Hollandaya ku ew çend zagon û maf lê hene di asteke cidî de homofobî jî heye. Ne tenê li vê derê li tevahîya Ewropayê rewş wiha ye. Hê jî cihêkarî, dîkekirin, êrîş pêk tên. Berî bi demeke kurt li Îstasyona Trena Rotterdamê de êrîş biribûn ser hevjinêke lezbiyen û di laşên wan de cixare tefandibûn. Her wekî din dîsa bo nimûne hevjinên gey ên bi destê hevdu girtî gelek caran tûşî êrîşan bûn. Wek ku li vê derê her kes lubunyayan datîne serê xwe têgihîştineke xerîb li ser vê derê heye, pêşdarazêke êrênî heye, her ji ber çî be. Ji bo wan kesên ku dixwazin koç bikin, weke penaberan bên van deran gotinên min wiha ne: “Li vê derê jiyanêke gul û gulistan ne li benda tu kesî jî we ye, wek ku li her derî rû dide, li vê derê jî divê mirov xwe amade bike ji tengasîyan re.”

Ev Der Sar E, Weke Cemedê

Merheba ez Alî,

Ez ji kurdên Anatolîya Navîn im. Koçbereke derveyî welêt im, mamosteyeke dibistana seretayî me. Piştî ku ez bi xwe hesiyam, ji bo ku xwe ji malbata xwe dûr bixim, min zanko weke rêya felatê dît. Cihê herî dûr ji malbata min Îzmîr bû, min Mamostetîya Seretayî hilbijart. Piştî qedandinê, bi qasî salekê min karê xwe kir. Ji ber tûndîya ku min ji malbatê dîtî min biryar da ku li derveyî welêt bijîm. Aniha li Vîyanayê dijîm û di Komeleya Karkerên Seksê de rêveberiyê dikim. Bi awayekî kordîneyî tevî Komeleya Karkerên Seksê ya Navneteweyî re xebatan dibim serî. Wekî din li Vîyanayê komeleyeke penaber û koçberên LGBTÎ+an heye ku tê de xwe bi rêxistinî dikin, li wê derê ji bo wan kesên ku bi eslê xwe Tirkîyeyî ne xizmeta şewirmendiyê dikim.

A rastî tu carî xewna min ya jîyaneke li derveyî welêt nîn bû. Heger aniha min li Vîyanayê jîyana xwe nemeşanda min ê tu carî ev der hilnebijarta. Heger malbata min ne homofobîk bûya, siûda min li ci bû: Ez di malbateke halxweş de hatim dinê. Heger ji bêgavîyê “nerevîyama” tu carî nedihatim. Çimkî li Tirkîyê malbata min ketibû şopa min ji bilî reva derveyî welêt min nikarî rê û çareyêke dîtir bibînim. Her wekî din hewesa xortanîyê jî hebû, divê di ser vê yekê re gav nekim. Di wê pêvajoyê de kuştinên LGBTÎ+an di rojnameyan de ci digirtin, tirsê min ew bû ku heman tişt bêne serê min jî. Ji dêvla Vîyanayê li Stenbolê, li Îzmîrê an jî li bajarekî din min jîyana xwe bidomanda ew ê teqez min peyda bikirina. Çimkî malbat û naskiriyên min di jîyana xwe de her tim ji hev agahdar in. Di nav xwe de xwedî toreke axaftinê ne. Serê pêşî gava ku reviyam min bajar guherand, min dît ku guhertina bajêr bi kêrî tu tiştî nayê. Dema min bajar diguherand, min didîtî û cardin dibirin malê. Piştî reva xwe ya dawî çareya ewil min biryar da ku derkevim derveyî welêt.

Biryara min a reva derveyî welêt pêvajoyeke dirêj û êşdar bû. Ji bo ku mirov karibe derkeve derveyî Tirkîyeyê pêdivîya wî/ê bi hinekî pereyan heye. Ji bo ku vî pereyî dabîn bikim ji bêgavîyê min karê seksê kir. Ez wiha bêjim, tev ketim destê mamayên transan jî. Heger gefa mirinê li min nexwarana min ê qet terkê Tirkîyeyê nekira. Derveyê welêt weke gotina “waaww”ê dest nişan dikin lê belê bi tenê ferqa wê [ji welêt] ev e: Destê tundekeyê diguhere. Lê belê tundîya li vê derê ne fizîkî ye berê xwe dide derûnîyê. Li gorî birînên derûnî dibe ku başbûna birînên ji tundîya fizîkî ya li Tirkîyeyê bi leztir be. Bi hemû dilsozîya xwe dibêjim: Li Tirkîyeyê ji ber kurdûnê tu carî cihêkarî li min nebû. Lê belê ji ber misilmanbûnê li her derê tûşî cihêkarîyan dibim. Min li Tirkîyeyê tu carî tiştêkî mîna van cihêkarîyan nedîtîn, ji bilî malbata xwe û tiştên ku malbatê li min kirî pê ve, ez nikarim bêjim ku tundî li min bûye.

Li Tirkîyeyê trans bi destê civakê rastî tundîyê tên. Belê, heger ez transbûma dibe ku ez jî ji destê civaka Tirkîyeyê tûşî tundîyê bibûma lê belê ji ber ku dirûvê min mîna yê “mêran” e ihtîmala tûşbûna tundîyê parîkî kêmtir dibe. Tu bi qasî transekê tûşî tundîyê nabî, bi awayekî hêsan tu dikarî xwe weke mêrekî heteronormatîf bidî xuyakirin, bi civakê re li hev binî, di vê yekê de tu arîşe nîne. Ez ji fikrên diya xwe yên çewto mewto yên ku digo “tu yê yan bibî mêr yan jî tu yê bimrî”, reviyam. Aniha dema lê difikirim a rast hinekî poşman im.

Malbata min gava hevpeyvîneke min a di rojnameyê de derçû û li malperan belav bû bi rasthatinî hay ji min bûn. A soxî piştî derçûna vê hevpeyvînê bûyer qewimîn. Xalê min ev nûçe li hin deran ditiye, di nav malbatê de bi hevdu parve kirine. Hûn dizanin nûçeyên li ser malperan belavbûyî bi kopîkirinê re li cihên din jî têne parvekirin lewma jî jêbirîna wan pir zehmet e. Berîya ku malbata min van vîdyo û nûçeyan bibîne ez û hevaleke lezbîyen me rola jin û mêrtîyê gerandibû li malbata min. Malbata min ji dildarîya min û hevala min a lezbîyen bawer bûbûn. Piştî demekê ha min go “êdî bes e, ez ê heya kengî veşêrim” rewş ketin vî halî. A soxî min nedixwest ez xwe eşkere bikim ne hewce bû hay ji odeya min a raketinê hebin. LGBTÎ+ên ku di nav malbatên pederşahî de mezin bûne xwe eşkere nekin hîn çêtir e. Heger mirov li Ewropayê bijî dikare vê yekê

ji malbata xwe re vebibêje lê belê di nav civakên mîna Tirkîyeyê yên zêde ol-serdest de ne bi dilê min ê ku kesên xwedan nasnava LGBTÎ+ê xwe eşkere bikin. Heger li Tirkîyeyê ez ne çalakvan bûma min ê ev berdêl nedaya. Min hebekî berdêla çalakvanîyê û xuyabûnê da. Mînak carekê diya min li ser seksê ez qefaltim. Tiştên ku dît nekarî bipejirîne. Lê bi qasî tiştên ku li jor min behs kir nebûn pirsgirêk. Wê demê ez bist û du salî bûm li zivistanê di bin lihêfan de du kes dikin çi bikin qey? Diya min ji dêvla ku li van tiştên behskirî bipirse, xwe li nedîtîne danî. A rast ji ber gotinên mîna “kurê te qûnek e” yên merivên xwe, xal û apanên xwe min ev zext dîtî. Pîlaneke min a derketina derveyî welêt nebûbû. Gava ewil min lêdan xwar ez li penaxaneyê jinan dimam. Di wan deman de bi pêşniyaza hevalekî em bi qaçaxçiyên mirovan re peyivîn. Hevalê min ji bo ku min derxîne derveyê welêt du hezar lîre daye qaçaxçiyên. Ez çûm Dikiliyê, ez bi zilamekî qaçaxçiyê mirovan re peyivîm, me biryara her tiştî da. Ez dibêm di xew de mam an jî tiştêkî din qewimî, bi awayekî ez neçûm. Perê min jî nîn bû, ez bê gav mabûm ji mala hevalê xwe jî birevim. Di wan deman li Dikiliyê bi destê LGBTÎya Stenbolê Kampa Havînê ya Transan hebû. Em bi erebeyên wan hatin Stenbolê. Min digo qey ez ê li Mêvanxaneyê Transan bimînim. Li Mêvanxaneyê Transan ji ber ku ez û Deniz Tunç pevçûbûn ez qebûl nekirim wê derê. Dûre jinekê ez birim mala xwe, min domeziya¹ wê dikir. Wê demê min li Înstagramê vîdyo digirtin, yek ji şopînerên ji Înstagrama min a düyemîn, ez şopandime. Go “Ji ber ku qet zarokê min çênebû ez dixwazim alikariya te bikim.” Helbet min jê bawer nekir. Go “heftêya pêşîya me em li ber bufeyên şilburgeran hevdu bibînin.” Tevî hevjinê xwe hat hevdişînê. Go “ez ê vîzeyekê ji bo te bişînim tu yê bi saya vê vîzeyê karibî derkevî derveyî welêt, li wê derê Komeleya LGBTÎ+an heye, ez bi wan re peyivîm. Di nav vê komeleyê de kurdekî lubunya heye, wê vexwendina xwendekaran ji te re bişîne, tu yê weke axaftvan herî wê derê, tu çûyî pê ve bi awayekî em ê rêyekê peyda bikin.”

Piştî vexwendinê, min vîze wergirt û ez hatim vê derê. Ji ber ku maweya vîzeyê sê meh bû piştî sê mehan ji bo karibim li vê derê bimînim divê

¹ Di jargona lubunayî ya ku LGBTÎ+an bi kar tinin de kesê ku karê û barên berdestê kesekî dike, alikariya wi/ê dike.

min çareserîyek bidîta. Ji bo ku karibim li vê derê bimînîm pê hesiyam ku rêya herî mantiqî zewaca bi kesekî re ye. Ji bo penahîya Awistiryayê bi parêzerekî re peyivîm, go “belê ji HDPê [Partiya Demokratîk a Gelan] doza te heye, tu çalakvanê LGBTÎ+ î, delilên ku malbata te tahde li te kiriye hene lê belê LGBTÎ+ek ji te pêşdetir heye. Ji ber ku li wê derê Talîban heye.” Bi heman rengî, ji welatên mîna Iraq, Surî, Erebistana Siudî LGBTÎ+ hene têne Awistiryayê. Ji ber ku Tirkîye ji bo LGBTÎ+an weletekî ewle tê hesabandin, LGBTÎ+ên ji Tirkîyeyê têne Awistiryayê maweyên wan ên bendemanê zêdetir e. Li vê derê gelek penaberên LGBTÎ+ ên ku ji Tirkîyeyê hatine, hene. Bi salan e li bendê ne. Bi ya min divê tu kes nebe penaber ji ber ku penaberî xerabtirîn û diwartirîn tişt e li dinê. Bifikire bi qasî neh deh salan bi mehaneyeke sed û pêncî ewroyî debara xwe dikî. Heya ku penaberîya te tê erêkirin li Awistiryaya sed û pêncî ewro alîkarî werdigrî. Asyluma pozîtîf² heye û asyluma negatîv jî heye. Asylumên negatîf kesên li bendemanê ne. Dema derbasa pozîtîfê dibî pasaporta cûn didin mirov û bi vê pasaporta cûn mirov dikare li welatan bigere; [ev pasaport] tê wê wateyê ku penaberîya mirov hatiye erêkirin. Dewlet neh sed ewro dide. Ev tê wê wateyê ku heya tu karekî peyda bikî ji xwe re neh sed ewroya te heye. Bi ser de meha ewil çar hezar ewro depozîto ji bo xaniyê didin mirov. Divê pêvajoyê de pêwîst e mirov xaniyekî bibîne û navnîşana niştecibûnê diyar bike. Dema tu dest bi kar dikî dewlet vî pereyî jî te distîne helbet. Lê belê tu negatîv bî... Mînak hevaleke trans heye ji Erzoromê ye, bi qasî duwanzdeh salan li bendê ma û serê mehê sed û pêncî ewro digre. Ji bo ku mirov nikare bi sed û pêncî ewro debara xwe bike karê seksê dikir, di şahiyên biharê de tiştên mîna bîrayê difirotin. Li vê derê bi karkerên seksê re dipeyivim, yek ji wan jî ne bextewar e, dixwazin vegezin Tirkîyeyê. Axirî mirov LGBTÎ+ be pêwîst e deh panzdeh salan li bendê bimîne. Li vê derê jineke trans hebû, li gel ku dozên wê yên siyasî jî hebûn piştî panzdeh salan statûya pozîtîv wergirt. Ji ber vê rewşê min xwest ne bi rêya penaberîyê lê belê bi rêya zewacê li vê derê bimînîm. Piştî salekê jixwe ez ê hemwelatîyê bi dest bixim.

Li Awistiryayê mafê tenduristîyê gelekî baş e. Di dema negatîf de jî dikarî sûtê ji mafên tenduristî û perwerdehiyê werbigrî. Dewlet qerdeke kesk

2 Li gor Hîquqa Penaberî ya Avusturyayê penaberê serilêdana wê hatiye qebûl kirin.

dide te û tu bi vê qerdê dikarî li her derê miayene bibî. Di warê mafê sîgortayê de Awistiryayê yek jî baştirîn welatê dinyayê ye. Divê her kes xwedî sîgortayê be, jixwe tu penaber bî dewlet bi xwe sîgortaya te çêdike. Di heman demê de teqawîdiyên penaberan ji tê xebitandin. Mafê te yê perwerdeyê heye, li vê derê serê pêşî pêwîst e mirov zimên hîn bibe. Piştî qedandina asta B2yê mirov kare [perwerdehiya xwe] li zankoyê bidomîne. Ji bo wergirtina vîzeyê mirov asta B1ê werbigre bes e. Bi taybetî ji bo penaberan ger tu asta B1ê wernegirî dibe ku dewlet perê te bibire. Dewleta Awistiryayê bi vî hişmendiyê tevdigere: Em hemû pêdiviyên bîngêhîn ên penaberan, tiştên mîna vehewîn, tenduristî, perwerde û qûtê dabîn dikin. Penaber jî divê li bergînda vê yekê almanî hîn bibin. Bi almanî ezmûnên entegrasyonê hene, heger mirov di van ezmûnan de bi ser nekeve dewlet an perê mirov qut dike an jî mirov weke karkerê bêwesif bi nav dike û berê mirov dide sektorên mîna avahîsaziyê.

Li vê derê ne ji ber Tirkîyeyîbûna xwe lê belê bi qesta ku ez ereb im tûşî cihêkarîyan bûm. Mêjûya hatina min sala 2015an bû û tam di wextê de qeyrana penaberîyê rabû. Ji ber ku ez bi penaberîyê li vê derê bi cî nebûbûm ji dewletê an jî ji sazîyeke dîtir tu kana min a hatinîyê nîn bû. Min jî bi mantiqa lubunyayan go “heger karê şuxilîne tune be ez ê karê seksê bikim.”

Min ji bo kar li Awistiryayê serî li komeleyên LGBTÎ+an, li komeleyên kurdan û li gelek cihan da. Di serîlêdana xwe de min dîyar kir ku naxwazim karê seksê bikim, paqiji jî tê de çî kar hebe dikarim bikim. Çî bû? Helbet kar nedan destê min. Min dest bi karê seksê kir. Piştî karê seksê ez tûşî gelek cureyên cihêkarî û tundiyê bûm ku hiş û aqilê min nedigirt.

Ji hêla mişterîyekê ve hatim kêrkirin. Mişterî bi hinceta “tu ereb î, tu hatî ji bo ku min bikujî” ez kêr kirim. Hin mişterîyên min çêbûn ku bi sixêfan ez ji pêlpêlokên dahv dam. Komeke me ya LGBTÎ+ên koçber û penaberan heye, dema em bi hev re bin tu pirsgirêk nayê serê min. Demeke dirêj min qehbîkbûna xwe ji wan veşart. Ji bilî van hin cihên dembihurkê hene ku take-geyên spî yên Ewropayî li wê derê ne. Ji ber ku karê seksê dikin ji bêgavîyê ji xwe re li bar û klûban digerin. Ez

mişterîyan ji wir radigrim, weke gacîyan³ di stûdyoyan de kar nakim. Li Amsterdamê adetek heye; take-gey di stûdyoyan de karê xwe dikin. Li vê derê mirov ji xwe re ji saûna û baran mişterî peyda dikin. Dema min karê seksê dikir hin kes hebûn di rûyê min de digotin “him ereb, him nexweşok, him penaber e û karê seksê dike.” Di serî de ji ber ku min bi almanî nedizanî min fahm nedikir bê çi dibêjin, niha ji ber ku bi almanî dizanim rasterast bersiv didim gotinên wan. Ez bi temamî wê hêla karê seksê datînim alîyekî, karkerên seksê ji nav civaka LGBTÎ+an ku xwe weke modern bi nav dikin jî têne vederkirin, ev jî meseleyeke din e. Ji derve dema lê binêrin pir dîyar e ku ez ji Rojhilata Navînê me. Ji ber ku ez ji Rojhilata Navînê me kesên ku ji xwe re dibên Awistiryayî me tu carî ez nekirim gel xwe, tu carî hevaltî bi min re daneanîn. Dema min digo “merhaba” li rûyê min jî mêze nedikirin. Tu flort bi yekî re dikî û dibêji “merheba, dilê te û axaftinê heye gelo?” Dibêje “ez bi ereban re napeyivim.” Mînak tu li barê direqisî dema milê te li yekî dikeve dizivire û diqire: “Tu nikarî destê xwe bi min dî, de here welatê xwe.” Di vî warî de min tundiyên zêde yên derûnî ji butch lezbiyanan dîtî. Di keliyên reqşê de ji ber rîyê min -te dî dirûvê min dide yê “mêran”- bi peyvên mîna “ereb giş hêç in, ev jî dişibe ereban” bi awayekî derûnî û -li jor jî min go- bi awayekî fîzîkî tûşî tundiyê bûm. Aniha wek berê arîşeyên min nîn in çimkî li Vîyanayê tême naskirin. Dizanin ku ez çalakvanê LGBTÎ+an im û dikarim hetka wan bibim, lewma deng nakin lê belê ez tiştên li mirovên din dikin dibihîsim. Ez dibêim berîya bi sê salan bû, min gilîya barekê kiribû, xwestibûn ereban biavêjin derve. Gilîya min bû doz û min ew doz kar kir. Li vê derê zagona “discriminationê [cîhêkarî]” heye. Bêyî nîşandana hincetekê bes ji ber erebbûnê qewirandina mirovan ji barê sûc e. Li pey wê rojê helwestên penaberên LGBTÎ+ jî hebekî guherîn. Bîza wan ji min diçe lê vê yekê bi lêv nakin. Kesên ji Tirkîyeyê, kesên ji Rojhilata Navînê dest pê dikin dîyar dikin ku êdî zagon wan diparêzin. Berê dema tiştêk li me diqewimî em bêdeng diman lê belê aniha êdî em têra xwe bi rêxistinî ne. Em eşkere dikin [îfşa], gilî dikin. Ji ber vê yekê jî em bi rewşên mîna 2015an re rû bi rû dibin.

Mezintirîn problema me karkerên seksê yên penaber tûşbûna tundîya psikolojîk e e ji hêla mişterîyan ve. Li vê derê karkerên seksê axlebe bi

3 Di jargona LGBTÎ+an de jin.

awayekî derqanûnî dişuxilin. Bêyî qeydan, bêyî qerda kesk... Li vê derê qerda qehbikîyê jî kesk e, em ji bo wê jî dibêjin qerda kesk. Arîşeyên me bi mişterîyan re çêdibin. Pîrî caran wiha tê gotin: “Ger tu ji min pere bixwazî ez ê li polîsan bigerim ji ber ku bi awayekî derqanûnî dişuxilî. Ez Awistiryayî me, wê cardin te bişînin Iraqê, Afganistanê.” Ji ber tirsên bi vî rengî bivê nevê mirov nikarin tiştekî bikin. Heman tundîya li Tirkîyeyê ye a rastî, bes ferqa wê ev ek ku tu ji destê hêzên parastinê an jî ji destê mirovekî li kolanan nayê kuştin. Gelo mirin heye? Belê heye. A dawî Hande hat kuştin. Hande li Vîyanayê li odeya ku ez tê de bûm dima. Hande di zîkê Ewropayê de li welatekî ji wan welatên herî zêde behsa şaristanîyê tê kirin ji aliyê mişterîyê xwe ve hat kuştin.

Vîyana ji bo jinên trans û netrans ewletir e. Çimkî ew bi awayekî qeydkirî dixebitin û li ser wan kontrol çêdibin. Trans di warên ewle de dixebitin lê kesên mîna me karkerên gey ên seksê bê ewlehî ne. Em bê qeyd dixebitin; ji ber ku em bê qeyd dixebitin jî em ne di kontrola dewletê de ne. Ji ber ku em ne di kontrola dewletê de ne dema karekî tê kes nizane bê em li ku ne. Jinên trans û netrans ji ber ku bi rêya navbeynkaran têne şandin agahiyên wan kesên li navnîşanên çûyî, her tiştên wan têne qeydkirin. Lê belê li cem me tiştekî werê nîne, dibe ku tu bimrî jî. Lê belê ez êdî naşuxilim.

Rewşa min ji penaberan û ji wan kesên ku bi saya zewacê dimînin hebekî cudatir e. Ez di rewşeke bêwelatîyan de me lê belê ne bêwelat im; ez di rewşa penaberan de me lê belê ne penaber im. Ji ber dozên min ên li Tirkîyeyê, berî demeke dirêj dest danîbûn ser pasaporta min a Tirkîyeyê. Ez jî ji ber ku ne penaber im bi rêya zewacê dimînim. Li Awistiryayê di sala 2019an de zewaca min a fermî hat erêkirin. Pevrebûna me deh duwanzdeh salan hebû. A min ne zewaceke fermî bû ji ber ku berî 2019an zewicîm. A min pevrebûna partnerî bû. Min ew di 2015an de kir, xwedî heman mafan im. Dema tu bi yekê Awistiryayî re dizewicî her sal destûra niştecihîyê didin mirov lê belê li Awistiryayê mirov bi yekê hemwelatîyê welatekî girêdayî Yekîtîya Ewropayê re bizewice destûra pênc salan didinê. Di zewacê de mafê te yê her tiştî heye. Mirov dikare sîgortaya hevjinê xwe bi kar bîne, sîgortaya bêkari ya hevjinê mirov hebe dikare ji wê jî sûdê werbigre. Ger deynê kredîya hevjinê mirov hebe

mecbûr e wê jî bide. Dema mirov ji hevjinê xwe vediqete, xwedî mal û milkan be ji mirov dipirsin “gelo daxwazeke te heye?”

Şertên hemwelatîbûnê hene. Li gor danîna şertên pênc salan divê herî kêm mirov sê salan full-time bişuxile. Çimkî Awistîrya yek ji mezintirîn welatê kapîtalîst ê dinyayê ye. Û li vê derê her tişt bi perê ye. Tu mirovekî bikujî te naxin hepsê lê ji dayîna bacan birevî ew ê te bixin hepsê. Pêwîst e ji bo dewletê şuxila xwe dest nişan bikî, divê mirov di asta B2yê bi almanî zanibe. Bi awayekî eşkere, pêwîst e çar salên ji pênc salan mirov full-time bişuxile. Bi ser de divê mirov du salan di nav xebatên civakî de ci bigire. Mînak xebata dildarî di nav rêxistina Xaçê Sor de... Bi giştî divê mirov li sazîyên bi dewletê ve girêdayî an jî bi dêrê ve girêdayî bi dildarî (di eslê xwe mecburî) bişuxile. Ji bilî wê, ezmûna entegrasyonê heye, divê mirov jê bi ser keve. Bi tu awayî divê tu tev lî sûcekî nebi. Bes bi carekê mirov bikeve rewşeke polîsî deh duwanzdeh salan te bi paş ve dixê. Mîn dîtîye ev rewş hatiye serê yekî. Ji bo ku hemwelatîya xwe werbigire salekê mabû jê re, çima ku bi yekî re pevçû nekarî hemwelatîyê werbigire û hîna jî li bendê ye. Em havînan di mîhrîcanan de bîra difiroşin, ev weke reva ji dayîna vacê tê hesibandin. Dema mirov diqefêlin vê yekê li qeyda mirovan dinivîsin û wergirtina hemwelatîyê bi derengî dikeve, divê mirov wiha neke. Halo divê mirov yekê pir nuwaza, sekan û bêdeng be da ku Awistîrya bikaribe bibêje “ev penaber layiqê me ye.” Hevaleke makedonî hebû, wergirtina mafê hemwelatîyê gelekî hêsan bûbû. Ji bo hevlekî Tirkîyeyî zehmettir dibe, bi xwe gey be jî ferq nake, mirovan şepirze dikin.

Ji hêla min ve divê tu kes nebe penaber. Tu kes bi xwestekî nabe penaber. Bi rastî jî heya ku bê gav nemînin bila nebin penaber. Çi zanim, bila li ser malperan bi hinekan re hevdu nas bikin, bi lihevkirinê dibe ku bizewicin. Ez dibêm ev rêya herî bi mantiq û kêmeşdar e. Kesên dixwazin koç bikin bila herin welatên mîna Kanada û Îskadînavyayê. Li wan deran ji ber ku hejmara koçberan hindiktir e, wergirtina erêkirinê dibe ku leztir be. Li Ewropya Navînê û li Ewropya Rojavayê bi rastî jî zehmet e. Wekî din ger mirov koçê derveyê welêt bike jî divê mirov wekî elemanekî wesîfdar koç bike. Ji bo ku dewlet weke hemwelatîya

xwe qebûl bike, pêwîst e mirov elemanekî wesifdar be. Kesên ji rêzê, her kesên li kolanan qebûl nakin. Divê tûrika zanebûna mirov dagirtî be û perwerî be. Mînak mirov endazyarê kompîtûrê be helbet dewlet werdigire. Ji ber ku tu yê ji bo wî tiştên sûdewar bikî. Welatên Ewropayê hebekî din sûdexwaz in. Tiştêkî ku sûde li wan neke wê çima bigirin? Ez bi gelek kesan re peyivîm; hin kes hene bi salan li bendê dimînin, têne dersînorkirin. Mirov çar sal li bendê dimîne, dibêje “jîyana min guherî”, ha te di hat dersînorkirin. Ji ber ku ew ne elemanekî wesifdar e, ew welat jî bi fikra ku wê tu sûdê ji mirov negire, bi mantiqa “ez çima wî/ê xwedî bikim?” şûn de vedigerîne.

Ez mamosteya dibistana seretayî me, ji ber ku formasyona min a pedagojîkî a vê derê heye dikarim li dibistanên maderî jî mamostetî bikim. Li vê derê awantajeka min a wiha heye ku mezintirîn civakên kêmarî yên welêt bi eslê xwe Tirkîyeyî ne. Her kes li kolanan bi tirkî dipeyivin. Pêdiviya wan bi mamosteyên tirkî re heye, min jî mamostetî kir.

Kesên bixwazîn serî li penahîyê bidin, ger rewşa wan pir xerab be, mîna ya min gefa mirinê li ser wan hebe heya ji destê wan tê bila delîlan bidin hevdu. Li ser tuşbûna tundîyan zabitnameyên polîsan hene. Dibe ku li ser telefonê yan jî li ser medyaya civakî peyamek hatibe. Dikarin vana gişan li ser kaxîzê bidin nivîsandin, bikin dosyeyekê. Wêne jî dibin; bi vî rengî çiqas belge hebe ew çend misoger dibin. Lê belê dema tu bê vê derê di destê te de tu belgeyên nişana xetereyê li ser te tune bin, dewlet ji te re dibê “kekê'm tu ne di nav xetereyê de yî, çima hewl didî ji bo penaberîyê serî lê didî, pêwîst e tu hincetên derbasdar pêşkêş bikî.” Mînak elewî dibên “ez elewî me, nikarim pêdiviyên ola xwe bi cî binim.” Dewlet vê yekê weke hinceteke hewcedar dibîne lê belê derbarê wê yekê de belge dixwaze. Dema penaberîya LGBTÎ+an bê erêkirin dibin xwedî gelek mafan. Dewlet ji penaberekî asayî zêdetir nixr bi te dide. Li vê derê asta mafên LGBTÎ+an birra jî gelek bilind e.

A dawî bêjim, ez dixwazim bes bi tenê weke tûrîstekê bêm Tirkîyeyê ji ber ku bi salane min dîya xwe nedîtîye, jixwe bi wan re napeyivim. Lê belê qet nebe min dixwest ji taxa wan derbas bibim, careke din

wan bibînim. Wekî din dixwazim ji bo dîtîna Îzmîrê bêem. Aniha bi tu awayî nikarim bêem. Bi dilxwazîyeke bêhempa ez çûbûm Îzmîrê, tekane xeyala min a mezin bû. Ji ber ku bêyî ji Îzmîrê xatir bixwazim hatibûm, dixwazim bi rastî xatir ji Îzmîrê bixwazim. Lê belê naxwazim jîyana xwe li Tirkîyeyê saz bikim, bes weke tûristekê dikarim bêem. Li vê derê tûşî nijadperestîyê filan dibim lê belê dikarim li kolanê rûnim û bîraya xwe vexwim, carina daw li xwe dikim kes berê xwe nade min jî, kes deng nake, weke queerekê dikarim ji xwe re bigirim. Dikarim neynûkên xwe boyax bikim, dema neynûkên xwe boyax bikim kes şimaqan li min naxe. Kes tifi kolanan nake, di lempê trafîkan de her kes li bendê dimîne. Mirov dikare her tiştî bike. Dawîya hefteyê em diçin klûban, te dî li Tirkîyeyê ji bo çûna klûbê mirov bi xeml û rewş amadehî dike, li vê derê tişteki wiha nîn e. Tu bi pêceme diçî û tu kes eleqa xwe bi kesî nayne. Tekane xala xerab serma ye, weke cemedê.

Bila Bêzar bin, Zivêr Bibin, Dev Jê Berdin û Biçin

Merhaba ez Dîyar

Merhaba, ez kurdekî elewî me, li Dêrsimê ji dayik bûm. Heya yek salîya xwe li Dêrsimê bûm. Bavê min ji karkerîyê teqawîd e, dîya min jina mala ye û em şeş xwişk û bira ne. Du xwişka min a mezin li Kanadayê penaber in. Malbata min ji çîna karkeran e. Mezûnê zankoyê me, min bernamêya masterê tamam kiriye, anêha xwendekarê dîktorayê me. Heşt sal e li Fransayê dijîm. Ez xwe weke jin, kurd, elewî û bîseksûel pênase dikim. Hemû nasnavên min ji bo min bi qîmet in, li cem min tişteki wilo yek ji a din girîngtir be nîne. Kurdbûna min ji bîseksûelîya min girîngtir nîne an jî bîseksûelîya min ji alîyê min ê ku ez zaroka malbateke ji çîna karker im, ne girîngtir e ji bo min. Girîngîya tevan wekhev e. Bi dîtina min ev nasnavên min ketine nav hev. Ji ber ku nikarim wan ji hev û du cihê bikim nizanîm kîjan ji wan girîngtir e, kîjan ji wan min weke min saz dike.

Li Stenbolê behskirina nasnava xwe ya LGBTÎ+ bi tena serê xwe zehmetîyek e. Lê belê ez di malbateke “rihet” de mezin bûm. Di dema lîseyê de ji cem malbata xwe qut bûm. Di demên zankoyê de ji ber ku di mala xwe de bûm zextên malbatê ji xwe nîn bû û min jî qada xwe ya ewle afirandibû. Ji malbatê ve yekser min zext hîs nekirin. Lê belê weke pêşfîkreki min digo pêwîst e nasnava xwe ya bîseksûelîyê ji wan re bibêjim. Dema li ser naskirina nasnava xwe ya bîseksûel difîkrim bê kengî bû, dikarim bêjim bîst û çar an bîst û pênc salîyên min bû. Heya wê demê heteroseksûel bûm. Li pey bîst û çar an bîst û pênc salîyên xwe meyla min çû ser bîseksûelîyê. Li Zankoya Stenbolê klûbeke bi navê Radar hebû. Di pola yekemîn de ez çûm civîneke Radarê. Li wê derê min hîs kir ku klûbeke pir girîye, wiha zû bi zû jî kesên ji derveyî xwe qebûl nedikirin. Cara ewil li wê derê min bi kesên LGBTÎ+an re bi awayekî rêxistinî pêwendî danî. Heya wê demê ji tevgera LGBTÎ+ê

bêhtir angajê tevgera femînîst û tevgera kurd bûbûm, ji ber wê yekê min di nav têkoşîna LGBTÎ+ê de qet cî negirtibû.

Hincetên sereke yên ji bo veqetîna min a ji Tirkîyeyê sedemên polîtîk bûn. Min ji ber kurdbûn û elewîbûna xwe vê biryarê girtibû. Ez li Tirkîyeyê bimama ez ê bihatama girtin. Ji ber vê yekê ya min koçeke mecbûrî bû. Lewra serê pêşî bi demkî çûm welatekî Ewropaya Rojhilat ji ber ku min nedixwest li Ewropayê bijîm. Min biryar da li wê derê bimînîm. Biryara min a vegeerê hebû heger doza min a li Tirkîyeyê ji hukmê biketa. Jixwe ez weke xwendekar çûbûm Ewropayê lewma jî min tiştêkî wiha ku dibêjin “em li Tirkîyeyê di bin zextan de ne, em li Ewropayê wiha azad in” li cem xwe hîs nekir. Jixwe welatê ku ez çûmê weletekî zêde îslamofobîk û nijadperest bû. Bi porên xwe yên reş, ger dîyar bibe ku tu ne ewropî yî dibe ku tu tûşî tiştên gelek xerab bibî. Hevalên min ên nêz hebûn ji Erebistana Siûdî digotin ji ber laçikên xwe tifi li wan hatiye kirin. Ji ber ku ez hatibûm welatekî li Ewropaya Rojhilat min ew welat bi giştî weke welatê Ewropayê bi xwe nedidît lewma jî li ser Ewropayê fikrekî min tune bû. Piştî heşt meh şûn de vegeeriyam Tirkîyeyê. Di ser cihê ku ez lê bûm tu carî fikrekî min ê wiha nebû ku “Ewropa wiha ye an jî wilo ye.” Wek min gotî cihê ku ez lê bûm li gorî min ne di krîtera welatekî ewropî de bû. Li Herêma Schengenê ye lê belê çavdêriyêke min a bi wî rengî li ser çênebû, jixwe min zanibû welatekî zêde oldar û nijadperest e. Di mijarê jin û LGBTÎ+an de min bihîst ku Fransa welatekî çê ye. Ji ber vê yekê jî terciha çûna min Fransa bû. Ji nasnava xwe ya kurdî wêdetir min bala xwe bêhtir dabû nasnavên xwe yên jin û LGBT+î, di terciha min de bandora wê baldayîne hebû. Gava mirov tê vê derê, bi wê kelecane her tişt wek ku sûper be li mirov tê, ji ber ku li Tirkîyeyê di vê babetê de gelekî mubalexe heye.

Min dît ku, bandora femînîzma pêla duyemîn, bandora kitêbên ku me ew xwendine heye lê tu eleqeya tiştên ku me xwendine û vê derê bi hevdu re nîne; tiştên bi vê terzê, weke “lûksê” aîdê kesên elîtan e, nîqaş pir hindik bandor li çalakvanîya kolanan dike an jî di jiyana koçberekî de heger ne dewlemend be, ne aîdê çîna jorîn be şewqa rasteqîniyekê nîne. Weke polîtîkaya dewletê em bibêjin xwedî polîtîkayêke gelekî xerab e.

Berê, zewaca homoseksûelan jî qedexe bû li vê derê encax mirov karibû PACSê¹ bike. Mirov zewicandî be, heteroseksuel be dikare zarokan ji xwe re bike ewlad, lê LGBTÎ+ bi ji bo te ne derbasdar e. Hêj berî bi çend salan mafê zewacê derket. Tu zewicî bî encax piştî pênc salan dikarî serî li penaberiyê bidî. Ji hêla mafên jinan ve jixwe di rewşeke dijwar de ye. Li Fransayê ji sê rojê carekî jinek tê kuştin. Em dikarin bêjin ev reqem li gorî yên Tirkîyeyê kêmtir in lê bi ya min danîna hiyerarşiyekê ne rast e. Mesela li Tirkîyeyê bi saya têkoşîna kurd, tevgera jin a kurd û femînîstan têkoşîneke me ya elimandî heye. Di vê têkoşînê de tiştê sereke ew e ku divê mirov kirdeyê bike bingeh. Mîna wan meşên jinan yên ku mêr nayînê. Li vê derê tiştên wiha tu carî nayên nav nîqaşê. Di civîneke 8ê Adarê de mêrên cîs-heteroseksûel dikarin bên û li gel dijberîya jinan, dikarin fikrên xwe bibêjin û dikarin werin tev lî meşan bibin. Li vê derê me dît ku hin kesên din li ser navê kirdeyan dipeyvin. Wekî din divê mirov vê yekê ji baş binirxîne, piştî êrişên DAÎŞê li Ewropayê helwesteke guherandî (ez nikarim vê yekê li mêzinê bixim) heye. Li gor gotina koçberên ku ji mêj ve li wê ne, demên berê rewşa koçber, jin û LGBTÎ+an rihettir bûye. Ji ber ku em koçber in em tiştên li vê derê bi awayekî cuda dijîn. Bi êrişên DAÎŞê re li vê derê dijberîya li hemberî koçberan derveyî adetê zêdetir bû. Li Fransayê bi wan zagonên ku di serdema RAYê [Rewşa Awarte] de derketin pê ve her tiştê kete rewşeke. Tu bêyî vê derê helbet rihettir î lê li gorî ku derê? Ez ji Tirkîyeyê hatime [li vê derê] bêhtir rihet im . Li gor Stenbolê belkî li kolanan bêhtir bi dilfirehî dimeşim. Hevalekî min ê gey ji Kaliforniyayê hatibû rojek bi girîn hat malê. Go “min di jîyana xwe de welatekî wek vira homofobîk nedîtîye.” Li metroyê destdirêjî li lawik kirine. Em ê li gor ku derê bipîvin? Li gor Tirkîyeyê yan li gor Kaliforniya? Homofobî li vê derê hingî zêde ye ku hew dibe.

Heya bîst û pênc salîya xwe min weke jineke heteroseksûel jîyana xwe domand û bi awayekî xwezayî jî pozîsyona min a li wê derê li ser hevkarîya bi [wan]² tevgeran re saz bûbû. Lê dema ez ji pozîsyona kesê hevkar [piştgir] derketim bûm kirdeyê vê dîyardeyê, fahmkirina

1 n.w. Peymaneke mîna zewacê ye.

2 Di deqa tirkî de dibêje “bi vê tevgerê” lê li gor pêwenda deqê ez dibêim behsa van tevgeran dike: “têkoşîna kurd, tevgera jin a kurd û femînîstan.”

vê rewşê, rasterast bandor jê girtin û bi vê bandorê re bidestxistina vê hişmendîya politîk, gihîştina vê qonaxê tişteki wiha ye ku dem jê re divê. Ez piştî bist û pênc salîya xwe di babeta LGBTÎ+ê bêhtir politîze bûm û ev bi xwe ne ji bona wî tiştî bû ku ez zûtir angajê politikayê bibim, ji bona serwextbûn, tecrûbe, berhevkirinê bû; angû ev rewşa hanê bi encama livandina tecrûbeyên ku li cem min berhevkirî bûn re pêwendîdar bû. Gava peyv tê ser vê xalê ez nikarim li ser serhatiyên mêrekî gey tişteki bêjim. Heger em li ser mafên jinanî û mêranîyê bipeyvin hin îmtiyazên mirovan hene ku bes ji mêrbûyîne pêk ve tên. Lewma [geybûn] nayê wê mahneyê ku mêrên gey ji wan îmtiyazên xalî ne. Ango mêrên gey jî heta dawîyê dikarin jê sûdê werbigrin. Ango xwedîbûna du nasnavan awantajên xwe jî hene dezawatajên xwe jî. Mêrê gey dema nasnaveke dezawantajî li xwe dike hemû awantajên mayîn danayne kêlekê. Ev nasnavên hanê nasnavên grîft ên di nav hev de ketî ne. Mesela dema dest bi karekî bike bilindbûna wî li gor jineke heteroseksûel an jî li gor lezbiyenekê hêsantir e. Bi kurtî geybûn nayê wê mahneyê ku ji awantajên mêranîyê sûdê negrin. Ji aliyekî din bêhtirbûna bertekên li têkilîyên mêrên homoseksûel dikare bêhtir bi xirabî bê têgihîştin lê belê em ji kîjan perspektîfê lê dinêrin? Çimkî têkilîyên lezbiyen pirî caran weke meyleke cinsî nayê fahmkirin. Bêhtirî weke fantazîyê dimîne di nav fahma civakê de. Ji bo wan kesên ku wiha difikrin têkilîya homoseksûelî ya mêran karekî cidî ye û dibe ku encamên wê yê cidî jî hebin, lê belê di nav wan her du jinên behskirî de gelo wê tişteki "cidî" çî be? Em behsa du meylên cinsî dikin. Ewîlî tundîyeke di ser qebûlkirinê re heye, her wekî din tundîya paşguhkirinê heye. Em ê çawa biryar bidin kîjan ji van tundîyan xerabtir e.

Li gor civatê li holê penîs tune be mirov nikare behsa hevşabûnê bike. Em ji bireke mêran bipirsîn, jina wî bi jineke din re hevşa bibe wê weke xapandinê nebîne. Lê belê jina wî bi mêrekî re hevşa bibe bergînda wê dibe tişteki din. Em nikarin rolê jinanî deynin aliyekî û wiha nîqaşa lezbiyenîyê bikin.

Ez hebekî bême ser çîroka xwe ya li Tirkîyeyê. Em di bin zextên giran ên polîsan de bûn, mala me dihat çavdêrî kirin, ji sedî nodê kesên ku

dihatin mala me hatibûn desteserkirin. Rojekê hevalekî min hat, dîyar kir ku polis di derheqê min de ji mirovan gotinan berhev dikin û em giştin wê baweriyê ku derketina derveyî welêt wê biryara herî bi mantiq be. Ji bo dîtina ber xwe heya bi encambûna dozê ji bona heşt mehan derketim derveyî welêt. Dûre li ser min biryarê desteserkirinê hat derxistin. Parêzerê min bi dozgeriyê re peyivî û ew biryar da rakirin. Ez vegeyriyam Tirkîyeyê, min ifadeya xwe da, ji ber ku helwesta dozger pir hişk bû min go ew ê min desteser bikin. Ez fikirîm, min go wê demê divê çi bikim. Wek min berê jî got, êdî min têra xwe ezmûn li xwe zêde kiribûn. Bêyî ku li nasnava xwe ya kurdî (têkoşîna kurdan li her derî heye, min go ez biçim ku derê ez ê karibim angaja wê bibim) bifikirim, ez li wê fikirîm ku weke jineke lezbîyen ez biçim ku derê ez ê rihet bibim. Îlûzyona bîskêk berê min behskirî, pirtûkên ku min xwendî, şoreşa cinsî ya li Fransayê, tiştên wiha min dan ber çavan û hatim Fransayê.

Ez li ser navê xwendekariyê hatim Fransayê. Di ser kursa zimên re min serî li vîzeyê da û ez hatim. Piştî salekê min dest bi perwerdehiyê kir. Li vê derê statûya min hîna jî xwendekarî ye. Heft sal e li vê derê xwendekar im. Divê mirov piştî şerê Sûrî bi du serdeman ve behsa Fransayê bike; berî êrişên DAÎŞê ên li vir û piştî wan êrişan. Ji ber ku Fransa xwedî dîrokeke kolonyalî ya xurt e xwedî rastîyeke kokdar a îslamofobîyê ye û ji ber Cezayîrê ku rû bi rûyê vê rewşa xwe nebûye hê jî erefbobî û îslamofobî heye. Jixwe mirov kare li her derê bi vê yekê bihese. Mirov dikare mêtîngerîya li welatên Giravê li daîreyên dewletê bibîne. Karmendên di asta herî jêr de reşik in, mirov kare şewqdana dîroka mêtîngeriyê ya li ser Fransayê bi awayekî berbiçav bibîne. Bi giştî li Parîsê zelaltir dixuye. Parîs Stenbola Tirkîyeyê ye hebekî. Bajarekî qelebalix e, gelek mirov tê de dijîn. Wekî din a girîng ew e ku mirov li kîjan deverê be. Li deverên bakûr cihên bi navê banylîyo yên ku çîna karkeran pêkhatî hene, her ku mirov ber bi bakûr ve diçe hejarî zêdetir dibe. Ber bi başûr ve rêjeya kesên temenmezin zêde dibe, wek ku ber bi çîna bilind ve sînorek hatibe danîn. Mirov vê yekê li ser xetên metroyê jî dibîne, tu Metro 1ê siwar bibî pak î paqij e. Tu li Metro 7ê siwar bibî, weke tûnela tirsê ya Disneylandê ye. Gava mirov diçe bakûr hestê ku lê peyda dibe ne heman hest e gava ku diçe başûr.

Ez hez ji bikaranîna peyva cihêkarîyê nakim. Ser û binê nijadperestî û îslamofobîyê dinixumîne. Zankoya ku ez li wê derê dixwînim herhal yek ji mektebên herî naskirî ye. Sê salên ewil li mektebê min bi tenê çar xwendekarên reşik diditin. Mesela li mekteba me ji penaberan re cî venakin, heger tu ne dewlemend û spî bi ihtîmala çûna te ya wê mektebê pir kêm e. Xwaringeha mektebê nîne. Xwendekar dikarin li restorantên dewlemend xwarin bixwin. Bibore lê ez ne dewlemend im, ango ez nikarim li restorantan xwarin bixwim. An jî tiştêkî gelekî hêsan heye: Mesela tu li cihekî rûdinê, tu yê çay bixwazî, av bixwazî zilam bi te re bi îngilîzî napeyve. Tu dest bi axaftina bi fransî dikî, vê carê zilam devoka te naecibîne, dest bi axaftina îngilîzî dike. Hevalekî min ji bo sîgortaya tenduristîyê tam sê caran belgeyên xwe şandin, di her sê caran de jî wenda kirin mesela. Li pey wê em bi hevdu re çûn sazîyê. Jinika li wê derê peywirdarkirî bi gotina “min hezar car ji we re got. Ev dosye qet nehatîye vê derê, qet nehatîye wergirtin. We li derekî xeletî kiriye. Ev wiha nabe” bi ser me de hîlbû. Me jî serê xwe jê re xwar nekir û me dest bi pevçûnê kir. Dawîkê xebatkarekî din hat, tu nabêjî dosye li wê bûye. Ango ji ber çî ev hatin serê me? Çimkî kesên li hemberî te jî nikarin bi frensiyeke sûper bipeyvin, ew jî ne spî ne. Ew rewş encax wisa dikare bê ravekirin: Jin bi xwe ne spî be jî peyva wê ya frensî herikbar e, dewlet rayeya karmendîyê pê daye, bi wê rayedanê karê xwe li xerabîyê digerîne û mafê wan kesên li hemberî xwe dişkêne. Mesela gava tu diçî yek ji mezintirîn garên vê derê, li gara bakûr polis li her derê ne, peywirdarên ewlehiyê li her derê ne. Kesên pêşî li wan tê birin an ereb in an jî reşik in. Min qet nedîtiye li ser laşê kesekî spî an jî kej lêgerîne bikin. Xwedêgiravî nijadperestî sûceke mezin e.

Li vê der 8ê Adarê dibe du şeq. Naxwazin li cihên meşa karkerên seksê bimeşin. Piraniya karkerên seksê jî koçber/penaber û jinên trans in. Pênc şeş sal e meşa 8 ê Adarê ji ber vê yekê di rewşeke dabeşkirî de ye. Mîrov di civînan de bi xwe jî vê yekê dibîne, bi eşkereyî dibêjin ku “em naxwazin bi wan re bimeşin.”

Weke gelek welatên Ewropayê Fransa jî ji bo ku penaberan negire hewl dide. Kesên ji bo penaberîyê tê serê pêşî heger li balafirgehê penahende

bûbe nêzî heftayekê deh rojan li balafirgehê de di bin çavdêriyê de te girtin. Şopa tilîyan filan têne girtin, heger pêvajoyeke bi şûn de şandinê tune be derdixin derve. Heya berîya bi salekê mirov diçûn navendê yekser dosye digirtin, penahende dibûn. Aneha li Parisê dosyeyên mirovan li ser hev komkirîne lewma di ser telefonê re tu karî jivan bigrî. Komeleyeke biçûk û kêrnehatî saz kirine, tu diçî wê derê. Dûre parêzgarî dosyeya penaberîyê dide te. Şopa tilîyan digrin helbet. Ji wergirtina şopa tilîyan nêzî şeş heft seatan te li wê derê di bendemanê de dihêlin. Heger şopa tilîyan li welatekî Ewropayê xuya neke ji bo ku tu karibî serî li penaberîyê bidî dosyeyên hewce didin te. Pêwist e di nav bîst û yek rojan de tu wê dosyeyê temam bikî bişîni parêzgarîyê. Dûre ji bo çil û pênc rojan 585 ewro pere bi te didin ango mehane dike 390 ewro. Helbet karên te di hemdê xwe de bimeşe tu dikarî vî pereyî werbigrî.

Piştî temamkirina dosyeyê du heb pêvajo hene. Prosedûra ewil bi lez diçe. Di nav panzdeh rojan de îfadeya te digrin û biryara rênexşeya pêvajoyê didin. Prosedûreke din heye, ew jî nêzî şeş mehan didome. Em bêjin şopa tilîya te li welatekî Ewropayê peyda bû an jî tiştêkî din gewimî, demildest bi pêvajoyeke lez te paş ve dişînin.

Pêwist e hemû prosedûran bi frensî bikî. Îfadeya te bi frensî dixwazin, heger perê te tune be, dibe ku tu nikaribî kesî peyde bikî ji bo wergerandinê. Li vê derê yek ji mexdûrîyeta herî mezin ev bû dihat jiyîn. Lê belê dema serilêdana te redkirin tu dikarî serî li dadgeha bilind bidî. Hingê dewlet bê pere mafê parêzerê dide te. Heya wê demê ne piştgiriya wergerê ne jî alîkariya hiqûqî qet nayê dayîn. Ango parikî politikayên xwe wiha disepînin: Bila bêzar bin, zivêr bibin, dev jê berdin û biçin. Li navendên serilêdanê gelek bi xerabî li gel xelqê tevdigerin. Mesela mirov seat çarê sibehê tên. Hewa weke cemedê ye, bifikrin seat çarê sibehê dikevin rêzê. Her parêzgar hejmareke diyardirî werdigre, jê zêdetir mirovan nagrin. Lewma jî mirov ji ber vê yekê ji nivê şevê ve dikevin rêzê. Tevî betaniyên xwe li wê derê li ser erdê asphaltê radikevin. Dema têketina hundir peywardarê ewlehîyê rêza hanê neecibandibe an jî di pirsgireke biçûk de dikare te nexe hundir. Tundiyeke wiha derûnî heye ku hew dibe. Hawira wê derê ew çend bi hêrs e gava mirov dikeve

hundir pê dihesa, ew hewa li dev û rûyê mirov dikeve. Ez bi xwe, li gel ne penaber im jî bi awayekî misoger travmatîze dibim. Têkilîyên ku bi mirovan re datînin û miameleya ku li mirovan dikin erjeng e.

Li vê derê dema tu penaber dibî ji te dipirsin, dibêjin “gelo cihê te ye mayîne heye yan na?” Ger tu bêjî “erê heye” wê demê alîkariya perê bi te nakin. Qet diyar nakin ku heger mirov wê vebijêrkê di formê de dest nîşan bike wê nikaribe pere werbigre. Li vê derê birek mirov hene li cem merivên xwe dimînin bi nezani wê vebijêrkê dest nîşan kirine û dewlet jî pere nade van mirovan. Ji ber ku pêş-agahdariyek nîne ev pirseke xapînokî ye.

Te di li Stenbolê li Tarlabaşiyê li gor dîmane hotelên xerab hene, penaberan dişînin otelên ji wan jî xerabtir. Heger cî hebe dikarî şevokê li wê derê şevokê li dereke din rakevî. Rojekê dikarin te bişînin 100 km wêdetir roja din dikarin rabin bişînin 100 km wêdetir, tew bawerî bi vê jî nabe, ger cî hebe gengaz e. Pergaleke kampan tune ye, wek Swîsrê an jî wek Almaniyê. Bi hin otelan re peyman girêdidin, li cem wan cî hebe te li wê derê bi cî dikin. Piştî wegirtina statûya penaberîyê kurseke entegrasyonê heye, sê rojan filan diçiyê. Tiştên weke al, sembol û nîrxên Fransayê hînî te dikin. Li pey wê çend seatên diyardîrî pêwîst e tu biçî kursa frensî. Ev jî formalîte ye ji ber ku kesên dibistana seretayî qedandî û bijîşkekî dixin heman polê. Yekê bi tîpê erebî dizane û yekê bi tîpê latîni dizane dixin heman polê. Bi awayekî xwezayî jî ew kes heya hînî tîpan dibe kesê din ê mezûnê zankoyê li wê derê bi betalî rûdîne. Ew kurs ji hînkirina tiştina wêdetir formalîte ye a rastî. Kesekî heştê salî û nexwende tevî diktorekî sî salî dixin heman polê.

Li vê derê kursên bêpere nîn in. Hin cî hene ji aliyê dêr an jî komeleyan ve bi dildarî hatine damezrandin lê belê ne girêdayîyê dewletê ne. Ango ne weke Almaniyê ye an jî weke Belçikayê. Li Fransayê pergala tenduristiyê li gorî welatên din gelekî baş e. Her dahata te li bin pereyêke diyardîrî be wê demê dewlet jî sedî sed xwe dide ber her tiştên te. Tu dikarî herî şaredariyan testên elîsayê bê pere bi lezgîni bidî kirin. Tu dikarî dermanên xwe yê HIVê bê pere werbigrî. Tu dikarî derziya

hepatîtê bê pere bidî kirin. Ji bo înfeksiyonên ku bi rêya seksûeli derbas dibin tu dikarî xwe bigihîni xîzmetan. Kondom bê pere ne û mirov bi rihetî dikare bi dest bixe.

Hê ku ez li Fransayê jî dijîm ez nikarim ji kesî re bêjim “neyên vê derê, ev der xerab e.” Kesê ku tê vê derê li wê derê di kîjan şertan de ye, ew ê dev ji çî berde û wê li vê derê bibe xwedî çî, ev gişt tiştên şexsî ne. Penaberbûyîn bi rastî pêvajoyeke zehmet e. Talîyê li vê derê rêjeya homofobî, lezbofobî gelekî bilind e. Ji bilî qadên LGBTÎ+an li kolanan ihtîmala dîtina jinên an jî mêrên bi destê hev girtî qet ne pêkan e. Li gel ku ez ne bi şertên polîtîk hatime jî zor didim xwe ku nebim penaber. Çimkî kesên ku ew [penaberî] hatiye serê wan tûşî tundiyên derûnî yên wiha tên ku bi peyvê nayê gotin. Ango tu yê li ku biseknî, tu yê çî bikî, çawa tevbigêrî mafê diyarkirina van tiştan gişî di destê wan de ye. Di vê pêvajoya prosedûran bi xwe jî tundîya ku li mirovan dikin di astên dijwar de ne, ji ber vê yekê jî derûnîya koçberan di rewşeke pir xerab de ye. Ez aneha piştgiri didim dosyeyên penaberiyê. Çewisandinên pergale li ser mirovên gihitîştîye asteke ew çend dijwar ku zêde zêde bandor li mirovan dike, hew tu arîşeya wan a polîtîk tune ye jî hin mirov hene ji ber aborîyê koç kirine û alîkarîyên hiquqî werdigrin, ew bi xwe jî van tiştan dijîn.

Endîşeya jiyani ya mirov hebe, heger ji dîya xwe, bavê xwe, ji malbata xwe revîya be, hela ku ewlehîya canê tune be, ku ewlehîya canê di ser her tiştî re ye, dikare li koçkirinê bifikre. Li vê derê ji bo tu kes soza gulistanê nadin. Belkî berîya sî salan dibû lê aneha nabe.

A rastî ez difikirim bême Tirkîyeyê. Hatim Fransayê, ev heft sal e li vê derê me. Min penaberî nekir, hê jî li bendê me ku hin tişt biguherin. Ji ber ihtîmala desteserkirinê û tiştên bi vî rengî ez di rewşa bendemanê de me. Ger atmosfera sîyasî biguhere helbet dixwazim vegerim Tirkîyeyê. Tim min dixwest lê belê rîska hatin û ketina hepsê min dide sekinandin. Ev sê sal e jî nikarim bême Tirkîyeyê ji ber vê yekê.

Vê Gavê Ez ê Çi Bikim?

Merhaba,

Navê min Tîna Godîva ye. Bîst û neh salî me. Kurdeke ji rihayê me. Berîya du salan min koçî cihê xwe yê a niha kiriye, hemwelatîyê Tirkîyeyê me. Serborîya min a koçê helbet ji bo min ne hêsan bû; çewsên ku ji zaroktîya min vir ve hatibûn serê min bûn sedema koçkirina min. Berî çewsên malbatê çewsên dewletê ez ber bi vê serborîyê ve dehf dam.

Di serdemên ku ez bi homoseksuweliya xwe hesiyam bi zêdebûna çewisandinan re carina min ev nasnama xwe ji bîr dikir. Di wan salan de jiyana min bi awayên çewisandinên malbatê, çewisandinên dewletê û bi xwe-nasnekirinê dimeşîya. Dema ez gav bi gav bi xwe dihesiyam hîna di sêzdeh salîya xwe de bûm.

Li dibistana seretayî dema min hevaleke xwe maç kir ez pê hesiyam. Ev çi bû, min nedizani. Hemcinsên min gavê ji mêrekî hez dikirin min daxwaza jinekê dikir. Ev rewş ji min re parikî “xerîb” hat. Wekî din min di xwe de li pirsgerêkekê geriya. Gelo ya bi pirsgerêk ez bûm? Di wan temenan de ez gelek caran ketim pey vê pirsra “gelo ev nexweşînek e?”

Ji heşt salîya xwe vir ve ez him bêyî bav him jî bêyî dê mezin bûm, bavê min li ber çavê min bi tahdeyê hat qetilkirinê. Ji ber vê sedemê bi kuştina zaroktîya xwe re kamil bûm. Li gel ku sêzdeh salî bûm bi xweşîkî min fikir diafirandin, min karibû xwe arasteyî bikim û bikevim pey vê pirsra “ez çima wiha me.”

Mîn bi xwe ji xwe dipirsî hevalên min ên keçik daxwaze mêrekî dikirin ji ber çi ra ez jinekê dixwazim. Gelo min bersiva van peyde kir? Helbet min nekir di wê temenê de, axirê zarok bûm. Min ew ji kesî re venegot, tirsiyam. Ji we bav tune, dê tune... Li mektebê mamoste hene lê belê bawerîya mirov

bi wan nayê. Kesên zimanê min ê dayîkê qebûl nekin û destûra axaftinê nedin, bi ser de axaftina tirkî li min ferz bikin min ê çawa vê hesta xwe karibûya ji wan re vebigota? Di vê pêvajoyê de min derbên derûnî xwarin, min nedikarî derkevim derve, li malê min timî kitêb dixwend. Ev kitêb, kitêbên ji bo mezinan bûn. Li wan deran min li xwe digeriya. Min bersiva pirsên mîna “ez kî me, ji ber çi wiha me” digeriyam.

Di serdema lîseyê de internet bi nav û deng bû. Min dest pê kir ji Google pirsî bê ez kî me, ev hest çi ne. Li wê derê min gotina homoseksûel dît. Hin malperên internetê digotin jinek dikare ji jineke din hez bike an jî mêrek dikare hez ji mêrekî din bike ev tişt “asayî” ne. Lê belê di şîroveyan binîya wan de min derbirînên mîna “raşehiti” - ku em fobî dibêjinê- didîtin. Van şîroveyan ez tirsandim, min got rewşa min ji malbata min re bê qalkirin ez ê bême kuştin. Çimkî li wê derê gotinên nefretê jî hebûn, mesela digotin “ez ê vana bikujim.”

Li pey lîseyê min riyek danî ber xwe. Ji ber eleqeya lixwepirsînê min dixwest filozofiyê bixwînim. Ez bi ser ketim, min xwend, bixwebaweriya min pêk hat. Min û yeka li ser internetê me hevdu nas kir, dest bi têkilîyê kir. Têkilîyê gelekî xweş bû. Dûrayî hebû, ez li Rihayê bûm ew li Bursayê bû. Min gelek hewl da xwe nêzî wê bikim, min zankoyeke li Stenbolê kar kir. Lê belê, min terka Beşa Filozofiya ku pir jê hez dikir, da. Bi çûna Stenbolê re hezkirina min ez vexwendim Bursayê. Jixwe min berê Stenbolê nedîtibû. Tiştên wiha dihatin gotin “Stenbolê bajarekî mezin e, qelebalix e, tu ditirsi, kesên li wê derê pir perwerî ne.” Ev rûdana mirovê perwerî ew çend dihatin gotin, hêj min dest bi zankoyê nekiribû min dest bi xwendinê kiribû. Hezkirina ewil, eşqa ewil, dilsoziya ewil ew çend hestên xweş bûn, weke Rihayê çewsa polîsan tune, tahde nîne. Heya wê demê ji bo min hezkirin bes ji malbatê pêk dihat, min go digo ew jî bes e. Piştî naskirina wê jinê di dilê min de tiştên cuda qewimîn. Lingên min bi firê diketin. Piştî du mehên li pey çûna Stenbolê, min wêrekîyê li xwe pêça, biryar da ku biçim Bursayê. Cara ewil ez û wê jina hezkirî me yê bihata gel hev. Kela dilê min rabûbû. Dema me hevdu dît, divê min çi bikira? Gelo merhabayeke asayî, destê hev girtin an jî hembêzkin? Kesa li pêşberî min jî bi kelecana bû. Li rawestgehê pêşwaziya min kir,

weke du hevalên hev me silav li hevdu kir, min destê xwe dirêj nekir ji ber ku li min wer hat kefa destên min ji ber germahîyê xwê daye. Dema silavdayînê ew jî bi kelecana bû. Belkî kelecana min derbasî wê bûbû. Dûre me hevdu hembêz kir. Aha wê demê min fahm kir ku ev ez im û min ew qebûl kir. Qebûl kirin parikî zehmet dibû. Li jînewara min vê yekê weke “nexweşîn” an jî “raşehitîn” didan xuyakirin. Dawîkê min qebûl kiribû û pir jî bextewar bûm. Min di otobosê de destê wê girt. Homoseksûelbûn ne tiştekî xerab e û li gel vê yekê qebûl kirin jî tiştekî nuwaze bû. Eger rojekî hin kes vê kitêbê bixwînin pêşniyaza min li wan bila meyla xwe qebûl bikin. Qebûl bikin! Çimkî tu wê demê bextewar dibî, ji hêla derûnî ve azad dibî. Ruh û bedena te bi saya wê yek dişê bi hev bikeliye. Min filozofîyê xwend. Li gor bawerîya min xweza me weke du zayendan ji hevdu cihê nake. Em bes jîndar in.

Ez bême ser pêvajoya veqetîna ji Tirkîyeyê... Ewropa li ser zimanê me xeyala min a zaroktîyê bû. Ji zaroktîya xwe vir ve min xeyala wê dikir. Li jînewera xwe pir westiyabûm, min nema karî li hember çewsandinan xwe ragirim, her dema min serê xwe datanî ser balgîfê min digo “ew ê kengê derî bişkênin û bikevin hundir.” Li herêmên Tirkîyeyê mîna Rojhilat û Başûr rojhilata Anadolê jîyan pir cuda ye. Kesên ji Stenbolê dijîn bi rastî nikarin fahm bikin. Di serdema mektebê de me min rûdanên bûyî ji hevalên xwe yê Stenbolê re vegotin gotin “em li kîjan cîhanê ne.” Kîjan cîhan? Em li heman welatî ne, li heman bajarî, em bêhna hema hewayê dikin lê belê ew haya wan ji van tune bû. Wekî din, min fahma wan jî dikir, bi xweşbînî tevdigeriyam. Çimkî li televîzyonê nedîtî, li rojnameyan nedixwendin.

Bûyera dawî, bi avêtina ser mala me kir ku biryara koçkirina ji Tirkîyeyê bidim. Di bûyera teqemenî ya Pirsûsê de min hevalên xwe jî ji dest dan. Ez li wê derê bûm, jixwe gelek ji wan li ber destê min mirin. Ev bûyer kartêka herî mezin bû li ser biryara derketina ji Tirkîyeyê. Şer tiştekî xerab e. Min şer jî dît. Jiyana min li ser sînorê bû, bi dildarî dixebitîm. Aneha jî gelo min karî tiştên serhatî vebibêjim? Na. Bi hatina vê derê re wek ku ji dogehê rizgar bûbûm, ketibûm bihûştê. Li Ewropayê zehmetî hene gelo? Helbet hene.

Sedema duyemîn jî homoseksûelîya min bû. Çimkî westîyam, bi rastî jî westîyam. Û min xwest ji bo xwe bijîm ew dem. Gelo ev xwehezî ye? Bi ya min, na. Bîst û heft sal e ev dîtiye. Gotin rihet e mirovek nivê temama jiyana xwe wiha derbas kir. Belkî ez ê pênc-deh salên din jî bijîm, ez dixwazim zarokên li rûyê min bişirin, yên êşnedîtî jî min re bêjin beyanîbaş, merhaba. Bêyî ku zimanekî ewropî bizanibim bi rê ketim. Kurdîya min, tirkîya min û îngilîzîya min a teqlo meqlo hebû. Carina ji bo vê rêwitiyê re dibêjin dînîtî. Carina ez jî difikirim bê çawa bi ser ketime. Dema pîyê min bi vê derê ket min bi xwe ji xwe re pirsî go “min çi kiriye.” Li gor hinekan pir wêrekî ye. Dema bi rê ketim li Balafirgeha Stenbolê dest danîn ser vîze û pasaporta min. Bi qasî du seatan nedan min. Lêpîrsîna vî tiştî jî kirin: Kê vê vîzeyê da te, bi ku derê ve diçî?” Gava veqetîne jî min zehmetî dît. Di xuyanîyê de diçûm geşt û gerê lê gor fikirîna wan mafekî min î wiha jî nîn bû. Pîrsa vê yekê jî dikin. Bi vîzeyê bernameya şuxilîne hatim vê derê.

Te di dibêjin cihê zayîna mirov an cihê têrbûna mirov... Cihê zayîna mirovan cipçihê ne. Li vê derê me, lê belê bêhma welatê min jî pir cihê ye. Dema ez li Rihayê li balafirê siwar bûm û hatim Stenbolê tu hest li min peyde nebû. Çimkî mirov her li ku be jî hewayê Tirkîyeyê hîs dike. Te di hewayê welêt e. Ez li balafira Fîlandiyê siwar bûm, balafir bi firê ket. Wê keliyê çavên min li yekê Tirkîyeyê digere. Wiha difikirim dibêjim li wê derê ew ê kesên pêşwazîya min bikin hebin lê dîsa jî ez ê çawa biçim. Guhê min timî dixwest peyveke tirkî an jî kurdî bibihîse. Li gel vê yekê jimara telefona wan kesên bêne pêşîya min li cem min hebûn û ez agahdar kiribûm dema ku rewşên awarte pêk hat bê ez ê çawa alîkarî ji balafirgehê werbigrim. Teqlo meqlo be jî îngilîzîya min hebû lê belê dîsa jî mirov dixwaze zimanekî ji axên xwe seh bike. Tiştêkî din di balafirê de hat bîra min: “Min ê aneha çi bikira?”

Balafir daket balafirgehê. Dema ji balafirgehê derketim polîsa li wê derê jî min re go “tu bi xêr hatî.” Jixwe ez jî mat mam, min bi xwe ji xwe re go “çi dibê?” Min nêrî di uniformayên wan de polîs dinivîsî. Dûre min go “gelo ez di xew de me?” Van polîsan bi îngilîzî jî min pirsîn bê pêdiviya min bi tiştêkî heye an na. Dûre min dengê kesekî bi tirkî dipeyive seh

kir û tavilê min berê xwe dayê. Min jê pirsî ku cihê derketinê bi ku de ye. Di vê navberê de di hundirê min de hestên xerîb hebûn lê belê aneha jî nikarim tarîfa wê bikim. Valahîyek... Belkî valahîya kêmhîştina hin tiştan. Hesta min a din jî, min hesaba wê derê girtibû û ji bo vekirina hesabeke din amade bûm. Kesên pêşwaziya min kirin ev xwebawerî dabûne min. Min bi xwe ji xwe re go “temam, wê her tişt çareser bibe.

Piştî pirsê “ez ê valêza xwe ji ku bigrim” min dest pê kir ji wan kesên Tirkîyeyê di derbarê vê derê de pirsan kir. Gotin ku ev der cihekî gelekî baş e û nebûna hezkirina mirovî ya li Tirkîyeyê tu yê li vê derê bibînî. Gotin “netirse! Li vê derê tu pirsgirêk dernayê.” Gotin “ger pirsgirêkek çêbû dikarî li me bigerî” û jimarên xwe dan. Min valêza xwe girt. Diçim, lê piyekî min bi pêş de diçe, piyekî din paş de diçe. Min gavên xwe davêtin ew qas giran bûn te di qey valêza min bi tonan barkirî ye. Li alîkî jî çavên min tije bûbûn. Dema ez hatim malbateke li vê derê ez pêşwazî kirim. E malbat malbateke ji Tirkîyeyê bû me hevdu didît. A rastî ji ber vê yekê rihettir bûm. Dawîya dawî bi rêyeke fermî hatibûm, helbet ev jî di nav xwe de xwedî hin zehmetîyan bû. Li vê derê dema li otobosê siwar dibî şifêr dibê “beyanibaş, bi xêr hatî”, di asansorê de mirov silav li hev du dikin. Ev tiştên pêwist in lê belê li me pir xerîb tê. Du sal e li vê derê me, pir ecêb e tevteví min pênc çaran dengê qornayê bihîstin. Li gel her tiştî ez dikarim bêjim parîkî bi siûd im. Di warê welatê hatinê de bi siûd im, naşibe tu welatan. Kesên li vê derê bêtir rûken in lê li vê derê jî “hindik be jî- ne ku nijadperestî nîne. Gelo bila LGBTÎ+ bên? Ger hûn ji min bipirsî bi ya min berî hatinê divê baş bifikirin. Pir zehmet dibe, kesên te li pişt xwe hiştine û cardin nikarî vegeirî. Malbat...

Fînlandîya ji piraniya welatên Ewropayê cuda ye. Her meh, hema hema her roj zagon diguherin. Zagonên nû jî tên. Guherîna zagonan çawa dibe; zagonek dikeve karîgeriyê welat di nav xwe de dipêve. Çavdêrî dikin bê zagon û xelk li hevdu dikin an na. Dema em dibê xelk ne tenê behsa hemwelatîyên Fînlandîyê tê kirin. Lihevkirina penaberan jî tê çavdêrîkirin, penaberan tune nahesibînin. Li aliyê din jî dema ev zagon pir diguherin em weke kesên penaber pir ditirsîn. Zagonek heye li derdora wê mafên xwe bi kar tîni, piştî mehekê dibêjin ew zagon

guherîye. Li vê derê di hevdîtinan de serê pêşî min nasnava xwe ya kurdî û serhatîyên li ser wê vegotin dûre min behsa homoseksûelbûna xwe kir. Tu bi awakî aloz nikarî behsa van tiştan bikî. Pirsên ewil in: Çima daxwaza penaberîyê dikî, di serilêdana penaberîyê de belgeyên te hene gelo. Mînak di derbarê mayîna li girtîgehê, cezagirtinên te hwd. belgeyên wisa. Ger belgeyên bi homoseksûelîyê re eleqedar hebin bi awakî pozîtîf cihêkarî dikin. Ez parikî heq didim vê daxwaza belgeyan. Li gel ku ne homoseksûel in jî hin kes hene dikarin derewan bikin û bibin penaber. Di ser van mirovan re rêjeya bawerîya ji me pir û pir dikeve. Pirsê herî girîng ev e: “Belê di jîyanê de ev tişt qewimîne lê anêha wê çi bibe? Tu yê çi bikî?”

Serilêdana min a ewil hat redkirin û li min hat vekolîn. Ji min re ev yek gotibûn: “Ger Riha xerab be here li Stenbolê bijî.” Bersiva min jî ji wan re ve bû: “Gelo li gorî we min ew fikir nekiriye?” Min dîyar kir ku ez ne ji Rihayê reviyam ez jî çewisandinan reviyam. Di çavê wan de dewleta li Rihayê û dewleta li Stenbolê ne yek e. Di hevdîtînê de Peymana Stenbolê jî hêla Tirkîyeyê ve neqil dikin û behsa mafên ku daye jinan dikin. Belê min behsa hebûna zagonan kir, lê min go zagon nayên sependin. Yanê a rastî jî me çêtir zanin bê çi dikare bê sependin çi nikare bê sependin. Dema mirov televîzyonan vedike rastê gelek dokûmenterên derbarê Tirkîyeyê de tê. Mesele di hevdîtînê de hat gotin ku li Stenbolê gelek komeleyên LGBTÎ+ hene, ew dikarin alîkarîya te bikin. Min ji wan re got ku nasnava min ne eşkere ye. Li gorê hişê wan li welatekî komeleyek vebûbe li wê derê serbestî heye. Li welatekî darvekirin tune be tahde jî tune ye. Li ber destê wan agahiyên hemû komeleyên LGBTÎ+ ên li Tirkîyeyê hene, tînin datînin ber te. Banga min li hemû komeleyan e: Ji kerema xwe! Bala xwe baş bidin wan ewraqên hûn didin kesên penaberan. Çimkî em li hin heteroseksûelên ku xwedî vê ewraqê rast tên.

Cihêkarî, nijadaperestî li vê derê jî tînin. Li nav malbata ku ez bi wan re dijîm jî nijadperestek hebû. Ev zêde jî ber bi çav nîn bû. Belkî ew jî ne nijadperestî bû, cudahîya çandî bû û şoka çandê li min ket. Min di çalakîyekê de ev rewş dîtin. Dewleta finî di mijarekî de mafên penaberan da sekinandin, xelqê Finlandîyayê bi xwe derketibû protestoyê. Xelqê

finî ya vî welatî bi xwe jî li cem penaberan xwe bi cî dikin. Di van protestoyan de helbet weke dij-alîyek nijadperest jî bi komeke deh panzdeh kesan cî digirtin. Heta di nav wan yekê emirkirî jî hebû. Min xwe nêzî wî kir, min jê pirsî ku çima nijadperestî dike, bes keniya. Di vê bûyera behskirî de kesên em ji wan re dibêjin “nijadperest” nikarin xwe nêzî me bikin, nikarin tiştên xerab bêjin. Ne êriş e. Dema tu dimeşî li aliyên din disekinîn û alayên xwe li ba dikin. Rewşekî wiha qet nabe ku bêjin em penaberan di qadên şuxilînê de naxwazin. Di rewşeke wiha de zagonên li vê derê wê canê xelqê xwe bieşîne. Cezayên pir giran ên vê yekê hene. Li vê derê di jiyana kar de ol, mehane û politîka qet nayê axaftin. Ji ber ku ev qedexe ye.

Pêşniyaza min a ewil li wan kesên LGBTÎ+an ku dixwazin koç bikin derewan nekin, bala xwe baş didin hûrguliyên. Mesela tu dibêji “min tahde li Tirkîyeyê ditiye”, bi awakî bê eleqe dibêjin “tarîfa mala xwe bike.” Mesela pirsî boyaxa mala te dikin. Qet belgeyên sexte nedin, ev dertê holê û demildest mirov tê dersînorkirin. Empatîyê saz dikin, derdê wan zêde jî ne dersînorkirina te ye. Parêzer ji min re go “yeka homoseksûel a li Tirkîyeyê desteserkirî bide nimûnekirin.” Weke homoseksûeleke jin jî te tê pirsîn bê tûşî çî bûyî. Hat gotin ku te jiyana li gor meyla xwe ya cinsî neditiye lê belê kesên astengdarên vê yekê kî bûn, vê ya piştrast bike. Ev welat pir girîngî dide perçeyên kaxizan û belgeyan.

Kesên dixwazin bibin penaber divê van qet ji bîr nekin: Dema çûn Ewropayê bila vê mantiqa ku kesên Tirkîyeyî mirovên me ne ji hişê xwe bibin. Çimkî di tu mijarê de alîkarî bi te nakin. Bi taybetî jî homoseksûel bî. Mixabin kesên Tirkîyeyî li vê derê jî bi mantiqa li Tirkîyeyê ne. Li hemberî wan li vê derê jî di sa mirov mecbûr dibe xwe veşêre. Tirkîyeyîyên li vê derê (kurd, tirk) penaberê vê derê bibin jî, bi girêdana zewacê bîn jî, weke karker bîn jî hişmendîya wan a li ser homoseksûelan tim wek xwe ye. Bila kes bi bawerîya wan nebe penaber. Gava min alîkarî ji Tirkîyeyîyên li vê derê dixwest mixabin tûşî teklîfên erjeng dihatim. Hemwelatîyên ewropî ji Tirkîyeyîyên baştir û dilsoztir in. Li gor têgihiştina Tirkîyeyîyan jinek bi tena serê xwe hatibe vê derê “tiştêkî xerab kiriye”, bi vê fikrê jî dixwazên sûtê jê bigrin. Bo minak te

li cem xwe didin şuxilîn, gef li te dixwin, dest datînin ser mafên te. Car tê, ev kesên han rê li ber şuxîlina te digrin, heta ji wergirtina destûra niştecihiyê re dibin asteng. Di vê mijarê de hikûmeta finî ji bo penaberan semînerên agahdarkirinê li dar dixin. Dîyar dikin ku penaberên li hemberî rewşeke wiha mayî bila vê rewşê ragihînin polîsan. Zagoneke nû derket. Berê pêvajoya penaberiyê bi qasî çar şeş salan dirêj dibû. Aneha di nav şeş mehan de bersiv didin. Ji bo serilêdanê sê mafên te hene. Dema te red bikin tu dikarî her du mafên xwe yên din bikarbînî. Parêzerên bêdestheq di vê pêvajoyê de piştgirî didin. Piştî wergirtina bersiva redkirinê mirov kare bişîne temyîzê. Di vê pêvajoyê de mafê te yê şuxilînê jî mafê te yê zewacê jî heye. Lê belê zewaca sexte bê kirin ew pê derdixin. Carina di hevdiîtinê de tê gotin “em bi çîroka te ya vegotî dizanin, dev jê berde...” Divê mirov bêje “na nikarim dev jê berdim. Ev tişt bandor li min kirin.”

Li vê derê li kampan dimînî. Tiştê dibêjin kamp jî apartman e. Hemcins bi hemcinsan dimîne. Malbat bi hevdu re dimînin. Pak î paqij e. Ez ne li kampê di mal de dimînim. Kes li te ferz nake, vaye “were li kampê bimîne.” Heqê xwarinan bi te didin. Di vê pêvajoya bendemanê de tu diçî mektebê jî. Mekteba zimên mecburî ye. Dema tu B1, B2 ji ezmûnan werbigrî dikarî biçî mektebên wan ên pîşeyî. Ji bo her pîşeyî mektebek heye. Tu li avahîsaziyê jî bixebitî, biçî paqijîya malan jî lazim e perwerde bibî. Heqê otobûsa te, heqê telefona te tê dayîn. Li kampê 350 ewro alikariya madî tê dayîn. Ev kêmbixuye jî ji ber ku her tişt erzan e têrê mirov dike. Ger perê te têrê cil û bergan neke tu diçî kampê dibêji “cil û bergên min nîn in”, ew jî qertek didin; diçî cihê cil û bergên ji destê duyem lê belê paqij û ûtkirî, ji wir dabîn dikî. Li qadên derveyê kampê çalakîyên civakî têne kirin. Bi ser homoseksûelbûna te re ger tu biwazî dikarî bi tena serê xwe jî bimînî. Hin kamp jî hene bi tevayî lê dimînin. Ji ber ku ez li kampê namînim pêwîst e navnîşana xwe ragihînim. Ger gumana tişteki bikin, mesela ji tenduristîya min bikevin gumanê, mesela ger kesê li cem dimînim miameleyên xerab bi min bike tên li malê vedinêrin. Tên, lê vedinêrin bê jiyana te çawa didome. Her şeş mehê carek mafên me yên fermî tê vegotin. Tevlîbûna wan mecbûrî ye. Gava tu tev lê nebi li alikariyên de dikujin. Di serî de dikarî bona salekê

destûra niştecihîyê werbigrî, dûre ger bizewicî dikarî çar salan destûra niştecihîyê werbigrî. Di dawîya çar salan de ger ji ezmûnan derbas bibî dibî hemwelatî.

Gelo daxwaza vegeza Tirkîyeyê heye li cem min? Ma mirov kare dev ji bihûştê berde biçê dogehê. Helbet nafikrim. Gelo ez bîra malbata xwe dikim? Helbet! Piştî wergirtina niştecihîya vê derê belkî ji bo geşt û gerê werim. Li vê derê herî zêde bêriya mêvanan dikim. Li vê derê kes li deriyê te naxe. Tu bêriya germahîya malbatê dikî. Bêriya xwarinan dikî. Li vir gava tu dibêjî “ez kurd im” fobîya mirovan ji peyva kurd nîne. Bi giştî li hemberî fikr û ola te pêşdarazîyên xelkê nîne. Ez nikarim werim wê derê, nikarim vegerim. Her ku bêrikirinên min hebin jî ez ji vî welatî hez dikim.

DYA, Xwezîya Mirov Bi Tirkîyeyê Tîne

Merhaba Ez Mistefa,

Min dibistana seretayî, dibistana navîn û lise li Tekirdagê tamam kir. Dûre ji Zankoya Marmarayê ji beşa Îqtîsadê mezûn bûm. Paşê salek du sal bi banqegerîyê re mijûl bûm. Peyre...Yanê ane... Jîyana xwe li Dewletên Yekbûyî ya Amerîkayê didominim, hê ji li vê derê dijîm.

Heya salên zankoyê li Tirkîyeyê min derfet û wêrekîya derbirîna nasnava xwe ya vekirî bi xwe re nedît. Bi halê heyî, her çiqas min li herêmeke ku ji hêla fikrê ve azad û ji hêla cihanbînîyê ve serbest dimam jî di warê “êşkerekirinê” de min nekarî xwe rihet hîs bikim. Eşkerebûna min bi hatina min a Stenbolê re, bi sazkirina jîyaneke serbixwe re pêkan bû. Bi taybetî di pêvajoya Gezîyê de piştî ku tevgera LGBTÎ di endamên medyayê de bêtir xuya kir û ket rojevê min jî ew derfet bi dest xist ku xwe ji malbatê re eşkere bikim. Bi saya hêz û piştgirîya ku min ji tevgera Gezîyê wergirt min nasnava xwe bêhtir da xuyakirin. Li Tirkîyeyê jîyana min a bi nasnava homoseksûelîyê bi giştî piştî 2010an dest pê kir. Her ku haya min ji xwe hebû jî ez timî daîm wek ku di nav dolabekê de bûm. Pêvajoya min a derketina ji vê dolabê serê pêşî bi rewşa min a çalakvanîyê ve eleqedar bû. Wek min gotî di wê pêvajoyê de, xuyanîbûna me ya zêdetir, destpêkirina qebûlbûyîna me ya ji derdorên berfirehtir a rastî wêrekî da min.

Belê demeke dirêj bû ez difikîrim ku xwe ji malbatê re eşkere bikim. Dema min têkîlîya xwe û malbat û merivên xwe dida ber çavan êdî haya min ji pêwîstîya bi jîyaneke rihet hebû. Divê min hin tişt bikira. Helbet di wê serdemê de bixwebawerîya zankoyîbûnê jî bi min re hebû. Ji ber ku Gezî jî li vê pirsîyara min a biryara xwe-êşkerekirinê rast hat xwebawerî û wêrekîya min zêdetir bûn. Esil em dikarin bêjîn kombînasyonê van hemûyan e. Him biryarên min ên şexsî him jî guherîna wê demê ya

civakî bandor li jîyana min a çalakvanîyê û pêvajoya xwe-êşkerekirinê kir. Her çiqas pêvajoya Geziyê ji bo me bûbe kana hêvîyan, wêrekî dabe me jî rewşa polîtîk ya Tirkîyeyê kir ku hêvîyên me yên destkeftî di nav çend salan de cardin ji dest me biçe. Ez dibêm pêvajoya Geziyê ji bi awayekî serketî tamam nebû. Li gor fikra min vê pêvajoyê gelek tiştan li me zêde kiribin ji encamên wê bi ser neket. Herî xweş rewşa hevalên me yên di pêvajoya Geziyê de van gotinên min piştrast dikin, ên li rêza herî pêş ya çalakvaniya LGBTÎ+ê de bûn bi xwe jî koçî welatên din kirin. Min jî wek van hevalên behskirî bi fikra ku tevgerên bi vî cureyî li welatên dijdemokratîk ne xwedan siûdên pêşketinê ne, bir biryara koçkirinê rabûm.

Ji bo koçkirinê tercîha min a ewil Dewletên Yekbûyî ya Amerîkayê bû. Sedema wê jî ev bû ku berê ji bo demeke kurt be jî ez hatibûm Amerîkayê û kêmbê jî agahiyên min ên derbarê vê derê de hebûn. Helbet hebûna naskiriyekî min î li vê derê jî bû wesîle. Wekî din tiştê ku zor da biryardayînê destkeftiyên me yên berî bi çend salan bû ku di nav çend salan de ji dest çûn. Li Tirkîyeyê guherînên polîtîk pir bi lez pêk tên. Rojevên me pir dînamîk in, hêlên wê rewşê yên êrênî jî hene û yên neyînî jî hene. Mirov bi kurtî bêje, êdî min xwe li Tirkîyeyê di ewlehîyê de hîs nedikir.

Hatina min a Amerîkayê bi awayekî cuda qewimî. Piştî hatina vê derê pêvajoya min a mayîna fermî bûyereke cîpcihê bû. Ez bi vîzeyê xwendekariyê hatim vê derê. Yanê wek gelekên ji me ez jî bi vîzeyê ku mirov ji bo perwerdehiya zimên serî lê dide hatim. Li Amerîkayê min hevaleke transseksûel a ji Tirkîyeyê koçkirî nas kir. A rastî pîlana min ew bû ku bi rêya mektebê li vê derê bimînim lewra fikra penaberîyê qet li tîlekî hişê min jî nediket. Lê belê dûre vê hevala trans ez agahdar kirim ku mafê min ê penaberîyê heye, bi rêya parêzerekî min serî li penaberîyê da. Çimkî di nav şeş mehan de wê maweya vîzeyê min biqedîya. Rêya tekane a mayîna li Amerîkayê domandina mektebê bû, ew jî rêyeke pir buha bû. Bi taybetî li Amerîkayê mirov bi vîzeyê xwendekariyê bijî mixabin derfeta şuxilînê jî ne pêkan e. Pêwîst e mirov dahatekê bi dest bixe. Berê di xwendekariyê de bi alîkariya malbatê re min jiyana xwe didomand.

Ji ber vê sedemê jî min dest bi lêkolîna prosedûrên penaberîyê kir. Ez fêr bûm ku gelekên ji homoseksûelên ji Tirkîyeyê berê serî lê dane û serilêdana gelekên ji wan jî hatiye qebûlkin. Bi saya serê hevala xwe ya trans min derfeta hevnasîna LGBTÎ+ên din ên vê derê dît. Û min serî li penaberîyê da. Pêvajoya serilêdanê dan destpêkirin, bi awayekî jî qet bang li hevdîtîne jî nekirin. Bi temamî statûya min hatibû erêkirin. Piştî serilêdanê nimreyeke ewlehîya civakî didin te. Ev jî bi fermî destûra te ya neştcehiyê û şuxilîne pêkan dike. Pêvajoya min a penaberîyê hêj didomîya min biryara zewacê girt. Dema rewşa zewacê tê holê jî pêwîst e mirov serilêdana penaberîyê şûn ve bikişîne. Di sala 2017an de min serilêdana xwe ya penaberîyê şûn ve kişand. Bi rêya zewacê min serî li Green Cardê da. Ev qerta kesk du sal derbasdar e. Di vê maweyê de ji aliyê hikûmeta Amerîkayê ve zewacê heteroseksûel jî ên homoseksûel jî pêgiri bi pêvajoya kontrolê ye. Piştî qedandina du salan carekî din serî lê didî. Ji bo deh salan destûra niştcehi û şuxilîne didin.

Wek min behskirî ji roja ku piyê min li axa Amerîkayê ketiye vir ve ez bûm xwedî sê statûyên cihê. Vizeya xwendekaran, ya penaberîyê û li pey wan jî ya zewacê... Dema mirov bi hemwelatîyekî amerîkî re bizewice dikare di nav sê salan de hemwelatîbûnê bi dest bixe. Mesela aneha du salên min qedîyaye. Piştî deh mehan wê mafê min ê serilêdana hemwelatîbûnê çêbe û piştî hemwelatîbûnê ez ê bikarim deng jî bidim. Ji bilî vê rûdana zewacê rêyeke din heye ji bo bidestxistina Green Cardê, ew jî wek ku hûn jî dizanin pergala peşkavêtîne. Ji bo serilêdana hemwelatîyê pêwîst e mirov pênc salan di vê pergalê de li bendê be. Yanê awantajêke bi vî rengî ya zewacê heye. Li ser peşkavêtîne wergirtina Green Cardê, ji milyonê yek ihtîmal e. Ji ber ku hejmara serilêdanê zêdetir e lewma rêjeya bidestxistinê jî gelekî kêmtir e. Aneha di rêveberîya Donald Trump de em nêta wî ya rakirina rêbaza peşkavêtîni jî dibînin, ji nûçeyan seh dikin. Li Amerîkayê politikayêke zêde zêde dijî koçberîyê tê meşandin. Hikûmeta Amerîkayê di salên dahatûyê de pîlana guherîna bi temamî ya zagona koçberan dike.

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di fahma dewleta civakî de welatekî sifir e. Dema ez wê bi Tirkîyeyê re didim ber hevdu, mirov carina dibêje

ku Tirkîye jî jê çêtir e. Yanê dema em li nimûneyên Ewropayê binêrin, kesekî çûbe wê derê û penaber bûbe, pêdivîyên wî yên mîna vehewîn, tenduristî û perwerdehiyê di serî de ji aliyê dewletê ve têne dabinkirin. Lê belê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê qet mafekî te yî wiha nîne. Mesela gava xwendekarîya min qedîya û min serî li penaberîyê da pê ve heya nimreya min a ewlehîya civakî bihata pêwîst bû demek diyar li bendê bimînim. Di vê pêvajoyê de ji bo min derfeta şuxilînê nehat dayîn. Di nav wê pêvajoyê de ez mecbûr mam mesrefên xwe bi xwe bikim. Mirovên mîna min penaber an jî di nêta penaberîyê de ne ew bi xwe jî heman pirsgirêkan dijîn.

Aneha pir zehmet e ku mirov bikare behsa dram û trejedîyên penaberên li ser sînor bike. Mixabin medya jî nikare rewşa penaberên di şert û mercên zehmet de dişuxilin bide nîşandan. Li Qesra Spî serokekî faşîst heye. Bi awayekî hewl didin ku xuyabûna nûçeyên di derbarê penaberan de asteng bikin. Ez ê çawa behs bikim nizanîm lê belê wek ku hin rûdanên li Tirkîyeyê dihatin serê min li Amerîka jî dibin ezmûnên min. Te di dibêjin dejavu, tiştêkî wiha ye.

Ez li eyaleta New Yorkê dijîm. Li Amerîkayê gelek eyalet hene û di navbera van eyaletan de cudahiyan mezin hene. Ev der bi temamî liberal e, eyaleteke bêhtir demokrat e. Wek min behs kir mixabin ew fahma dewleta civakî nîne, a rastî bawerîya min pê nîne di demek kurt de jî guherînek pêk bê. Mînak di pergala tenduristîyê de pirsgirêkan mezin hene. Timî mecbur î ji şirketên sigortayan sigortaya taybet a tenduristîyê bistinî. Tu pişgirî an jî tevkarîya dewletê nîne ji te re. Di pergala perwerdehiyê de jî wiha ye, mantiqa zankoya dewletê jî tune ye. Saziyên mîna zankoyên weqfan hene, ji bo wan jî mirov mecbûr e pereyekî pir zêde bide wan.

Li vê derê navê min ê ewil Mistefa bû pirsgirêkeke mezin. Tu carî min bîr nedikir ku ez ê li Amerîkayê tûşî cihêkarîyeke bi vî rengî bêm. Ev cihêkarîya ez rast lê hatim bes ji ber navê min ê ewil Mistefa bû. Di jîyana xwe de ji ber homoseksûelîya xwe gelek caran ez li cihêkarîyan rast hatim. Lê belê qet min bîra van tiştan nedikir ku ji ber navê xwe ez û tûşî cihêkarîyê bibim an jî ji ber ku dê hinekan bêjin ev misilman e û ez

ê tûşî cihêkarîyan bêm. Her çiqas ez xwe weke misilman pênase nekim jî, bawerîya min a olî tunebe jî, li vê derê dema navê min ê ewil Mistefa tê bilêvkirin tiştê sereke yê ku tê bîra mirovan misilmanbûna min e. Bi taybetî dema dibêjin ji Tirkîyeyê hatiye, te û nasnava misilmantîyê dikin weke hev. Li vê derê îslamofobî di asteke dijwar de ye. Li vê derê tu carî ji ber homoseksûeliya xwe ez tûşî cihêkarîyê nehatim bileks homoseksûelî bû sedema guherîna riwangeya mirovan li ser min, bû nasnavekî alîkarê min. Nasnava min a homoseksûel bend danî ber cihêkarîya îslamofobîyê ya li dahatûyê. Çimkî dema homoseksûeliya xwe vedibêjim dikevin nav fikrekî wiha: “Aaa tamam e hingê, pirsgirêkên te hebûne bi olê re an jî bi welatê xwe re. Ji ber wê yekê tu hatîyî vir. Tu jî ji me yî.” Di babeta nasnavan de bi awayekî vekirî durûtî heye lewma jî dixwazim behsa wê bikim. Li vê derê zêde homofobî jî nîne. Biş giştî cihêkarîyeka homoseksûeliyê li eyaletên başûr tê dîtin.

Li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di nav demê re ji ber ku sê statûyên min ên cuda çêbûbûn hin pirsgirêkên min hebûn. Asayî kesekî bi rêya zewacê Green Card wergirtibe divê ji bo çûna welatê xwe, geşt û gerê tu tengasî lê nebe. Lê belê ji ber ku min serî li penaberîyê daye hikûmeta Amerîkayê her bi çi awayî be destûr nade geşt û gera min a ji bo Tirkîyeyê. Dema min serî li penaberîyê da beyana min ev bû ku ewlehîya canê min nînbû, endîşeya dahatûyê bi min re hebû lewma min terka Tirkîyeyê da. Ji vî rengê serîlêdana min a penaberîyê ihtîmala vegera min a Tirkîyeyê ji dest min hat girtin. Heya neha pirsgirêka herî mezin bi rewşa min a hiqûqî ve girêdayî ev e. Ji bilî vê rewşê, ez ê di nav deh an yanzdeh mehan de serî li hemwelatîbûnê bidim. Di hevdîtinan de ger encameke baş bigrim û bibim hemwelatî, ji wê pê ve ew ê ji aliyê serdena Tirkîyeyê ve tu pirsgirêka min nemîne. Di vê maweyê de li aliyê hikûmeta Tirkîyeyê jî rûdaneke dîtir tê serê min. Li wê derê jî li ser rewşa min zelalîyek nîne û ez dibêm qey li wê derê jî derbarê min de fiş tomar kirine. Çimkî dema tu taloqa leşkerîyê dikî balyozxaneyê Tirkîyeyê ji te dixwaze ku tu cihê şuxila xwe beyan bikî, ger hebe Green Card û qerda şuxlê wana jî beyan bikî. Dema min ew beyan kirin pê ve jî xuya dibe ku ez ji bo şeş mehan bo xwendekariyê hatime Amerîkayê, dûre her çawa bûbe min destûra niştecihî û şuxilê bi dest xistiye û hê jî mayîna min a li vê derê didome. Ev çawa pêkan dibe, mirovekî nezewicandî encax bi

rêya penaberîyê dikare teqez bike. Bi taloqkirina leşkerîyê re Komara Tirkîyeyê dibe ku hay ji serilêdana min a penaberîyê bûbe.

Aneha ji hêla hikûmatê ve tê zanîn ku ez piştî şeş mehên vîzeyê jî li Amerîkayê dimînim. Gerek hatibe zanîn. Min xwe mecbûr his kir ku tecîla leşkerîyê bikim. Piştî wergirtina hemwelatîbûnê ji bo serdana Tirkîyeyê min pîlana xwe çekiribû, hîna jî fikra min heye, a rastî min dev jê bernedaye. Min go ev tecîla min pêk bê dê di serdana min a Tirkîyeyê de ihtîmala pirsgirêkan ji holê rabe. Lê belê asayî kesê ku serilêdana penaberîyê kir gereka bi hikûmeta xwe re bi awayekî ne di nav karekî an jî pêwendîyeke fermî de be. Ji ber rewşa min a leşkerîyê mecbûrîyeteke min a bi vî rengî çê bû.

Bi çavdêriya min bêhtir elewî, kurd, homoseksûel ji Tirkîyeyê bo Amerîkayê serî lê dane. Kesên nas giş bi rêya penaberîyê li vê derê destûra niştecîhî û şuxilê girtibûn. Ji bo serilêdanê ez dibêm ya herî bimantiq ew e ku mirov bi rêya parêzeran serî lê bide. Ji bilî vê jî heger mirov biçê komeleyên LGBTÎ+an di mijara serilêdanê de alîkarî dikin. Penaberî ne tiştêkî wiha ye ku mirov serî lê da pê ve her tişt qedîya û çû. Pêvajoyeke dirêj e. Piştî serilêdanê bes ji bo hevdîtîna jî dibe ku mirov bi maweyeke bi qandî pênc şeş salan mecbûr be li bendê bimîne. Piştî vê pêvajoya bendemana dirêj di wê kêliya hevdîtîna de mirov mecbûr e ku sedemên heqî yên penaberîyê piştrast bike: Bi belgeyan, bi delîlan, derbiranan; bi derbiranên hevalên xwe yan jî derdora xwe yên nivî nivîskî û nivî devkî.

Dema serilêdana te neyê qebûlîkirin li dij radibî, careke din serî lê didî. Careke din wek ya berê bi maweyeke dirêj li bendê dimîni. Ger ji hevdîtîna duyemîn jî bê redîkirin vê carê hewl didin ku te bişînin welatê te. Prosedûra vegeerê didin destpêkirin. Ji bo kesê serî li penaberîyê daye ev pêvajoyeke mişkule û zehmet e.

Min seh kir ku ev pêvajo li welatên Ewropayê pir bi hêsantir e lê min ezmûna wê nekirîye. Ji ber ku axlebê dewletên Ewropayê dewletên civakî ne ji gelek hêlan ve em dizanin ji DYAYê çêtir in. Em dizanin penaber jî di şert û mercên çêtir de ne. Ez pê bawer im ku penaberên li Ewropayê

dijîn di mijarên bingehîn ên mîna vehewîn, tenduristî û perwerdehiyê de xwe ewletir hîs dikin. Li vê derê min ji hevalên penaber tu tişt nebihîstîye li ser rihetiya vê derê. Li Amerîkayê di şert û mercên giran de li beramberî destheqên erzan mecbûr in bixebitin. Kesên penaber ji asta perwerdehiyê ve bilind bin jî, li welatên xwe di pileyeke baş de bibin jî ev bi kêrî tu tiştî nayê. Her kes pêwîst e ji sifirê dest pê bike. Ez dibêm pêvajoya penaberiyê li Amerîkayê zehmet e. Ger ne rûdana zewaca min bibûya, nizanim min ê karibûya heya ku derê pêvajoya xwe ya penaberiyê bidomanda. Ez dibînim ku kesên nas ji pêvajoyên dijwar derbas dibin. Hevalên dixwazin koç bikin bila baş lê bikolin, gerek eyalet û bajarê çûnê baş hilibijêrin. Ez bi taybetî li ser Amerîkayê bibêjim; welatekî mezin e û di nav eyaletan de cudahiyan mezin hene. Eyalet ne perçeyeke welêt in, lazim e mirov bi çavê welatekî din li wan binêre. Aneha çawa ku li welatên Ewropaya Rojhilat homofobî di asteke dijwar de ye û kesên LGBTÎ+ li wê derê tûşî cihêkariyê dibin li Amerîka li eyaletên başûr jî kesên tûşî gelek cihêkariyan dibin kesên LGBTÎ+ ne û bi taybetî jî trans in. Bi federalî zagona zewacê li hemû eyaletan derbasdar e lê wek ku me di hin mînan de dîtî bînpêkirina mafan gelek caran têne serê mirovan. Mesala şuxilîna transan di leşkeriyê de hat qedexekirin, heya neha ji bo vê yekê tu gav nehatîye avêtin.

Ji aliyê din di piraniya eyaletan de ji ber nasnavên xwe yên LGBTÎ+ dibe ku ji karên xwe bibin, hîna jî tu bendên li ber vê yekê nîn in. Ez behsa eyaletên Komarparêzan dikim. Di xuyanîyê de medya bes ji ber ku li ser wekhevîya zewacê disekne li tevahiya Amerîkayê qinyateke wiha heye: LGBTÎ+ pir serbest in û din bin parastinê de ne. Lê belê dema mirov lê hûr dibe diyar dibe ku mafê şuxilînê ne di bin ewlekariyê de ye. Ger ji ber homoseksûelîyê tu ji karê xwe bibî, wê demê tu girîngîya wekhevîya zewacê namîne. Ji ber vê sedemê LGBTÎ+ên ku dixwazin ji Tirkîyeyê bînin pêşniyaza min li wan, bila hilibijartina eyaletan, bajarên ku dixwazin lê bijîn bi baldarî bikin û berî hatina xwe li zagonên wê eyaletê vebikolin. Li gel vê yekê li bajarê hilibijartî bizanin bê kesên nas hene an na, bi wan re bila têkilî deynin, ez dibêm wê baş be. Li Amerîkayê civateke pir mezin a Tirkîyeyê nîne. Piraniya wan li eyaletên New Yorkê, New Jerseyê dijîn. Wekî din dê çiqas bandora wê hebe nizanim ger bikarin

kesên li vê derê dijîn peyde bikin û bi wan re bipeyvin ez dibêm ew ê ji baş be. Dema mirov ji dûr ve lê dinêre dibe ku her tişt jê ve bi zelali nexuye.

Naxwazim bi mayîndeyî vegerim Tirkîyeyê. Dema astengîya min a hiqûqî ji ber min rabe, wî mafî careke din bi dest bixim, ez difikrim serdana Tirkîyeyê bikim. Dawîya dawî hîna jî meriv û dostên min ên li wê derê dijîn hene û demek dirêj e min ew nedîtine. Helbet pir dixwazim wan bibînim. Xeyalên min ên dahatûyê hene, wek xeyala piraniya LGBTÎ+an e zanim; wek sazkirina malbatekê, bûyîna xwedî zarok, jîyana li cihekî bi rêzemend. Xeyalkirina bidestxistina vana hesteke li gel me hemûyan e. Aneha ez jî qet naxwazim destkeftîyên min ji destê min biçin. Di salên dahatûyê de ji ber vê sedemê pîlaneke min a vegeza Tirkîyeyê nîne. Heger li Tirkîyeyê guherînên bingehîn, veguherîn çêbûn û ez bêjim em ê bikarin hin mafan bi dest bixin helbet, çima na? Lê belê aneha xuyaye zêde ne pêkan e.

ENCAM

Li piraniya welatên cihanê di warê mafên LGBTÎ+an li gel geşedanên êrênî yên van salên dawîn îro li cihanê 175 milyon LGBTÎ+ li hawirdorên ku bi awayekî pergali miameleyên nebaş li wan tê kirin, dijîn. (1) Li gor raportên ILGAYê LGBTÎ+bûyîn hîna ji li zêdetirê heftê welatan weke sûc tê qebûlkirin. Li pêncê ji wan welatan cezaya îdamê didin vî “suci.” (2)

Di rojên îroyîn de bi hejmareke zêdebar mirov ji ber nasnavên xwe yên zayendî û meylên xwe yên cinsî ji wan welatên ku dibên em ê li wê derê xwe di ewlehiyê de his bikin daxwaza paneberiyê dikin. Bes di sala 2019an de bi hejmara 22.705 kesên Tirkîyeyî ji bîst û heft welatên bi ser Yekîtiya Ewropayê de heman daxwazê kirine. (3) Rêjeya LGBTÎ+ên serî li penaberiyê dane li YEYê û li cihanê hîna bi giştî nayê zanin bê çiqas e.

Rojnameya The Gurdian di nûçeya xwe ya li Îngilîstanê û li welatên Yekîtiya Ewropayê pîraniya serilêdana wan kesên ku ji ber nasnavên xwe yên zayendî û meylên xwe yên cinsî daxwaza paneberiyê kirine, hatiye redkirin de diyar dike ku hikûmeta wan welatan baweriya xwe bi sedemên endamên penaberiyê naynin û kesên serilêdayî ji nikarin delilên têrker peyda bikin. Li gor heman nûçeyê, serilêdana çar kesên ji dehan ji ber ku bawerî bi wê yekê naynin ku ji ber nasnavên xwe yên zayendî û meylên xwe yên cinsî zext li wan bûye, nehatiye qebûlkirin. Sê kesên ji endamên penaberiyê ji diyar kirine ku ezmûnên wan ên jîyanî ji aliyê rayedarên hevdîtînê ve têra xwe nehatine guhdarîkirin û pirsên rast ji wan nehatiye pirsîn. (4)

Di vê navberê de Komîsyona Ewropayê di sala 2015an de di pêşniyazekê de Tirkîye di nav “makewelatên ewle” (safe country of origin) de destnîşan kiriye, li pey wê re hin welatên din ên endam heta gavek bi pêş de diçin û pêşniyaz kirine ku Tirkîye bibe “welatê ewle yê sêyemîn.” Ev jî ji wan kesên ku dixwazin penaberîya welatên YEYê bikin astengeke

cipcuda ye. Aramanca wê yekê de ev e ku kesên di ser Tirkîyeyê re têne Yekîtîya Ewropayê bi mecbûrî dîsa li Tirkîyeyê bê vegerandin. (5)

Bi heman awayê ji ber ku li Tirkîyeyê qedexe li ser homoseksûeliyê nîne û di xuyanîyê de hin mafên dîtir jî hene li gelek welatên YEyê Tirkîye ji bo LGBTÎ+an jî weke welatekî “ewle” tê hesabandin. Demhat Bella axatina di navber wê û rayedarê serîlêdana wê de wiha neqil dike: “ Te di dema min raportên ILGA Europe, Kaos GL û Pembe Hayatê pêşkêşî wan kir zilamê li wê derê go ‘na yaw, te ev ji ku dîtin? Tirkîye ji bo LGBTÎ+an welatekî ewle ye.’ Dema min da nişankirin ku li gor ILGA Europê Tirkîye di warê bînpêkirina mafên LGBTÎ+an de li Ewropayê di rêza yekemîn de, li cîhanê jî di rêze nehemîn de ye, zilam nekarî bi vê yekê bawer bibe.”

“Cihê ku Çîrok Dest Pê Dike”

Bi giştî em li nav têkiliyên heteroseksûel jî dayîk dibin. Axlebe weke jina ewil em diya xwe, weke mêrê ewil jî em bavê xwe nas dikin. Pêdivîya me ya herî girîng jiyana di nav ewlehîyê de û hezkirineke bê şert û merc e. Em nikaribin binîn ziman jî daxwaza me ya ewil ji bo parastinê arasteyî malbatê ye.

Rêya gelek LGBTÎ+an di nav salan de weke penaber li welatên din bidome jî, tecrûbeyê ewil a sirgûniyê bi hîskirina cudabûyînên xwe re dibe ku ji malbatê ve dest pê dike. Gelek şewirxwazên min diyar dikin ku di temenên biçûk de hay ji cudahiyan xwe bûne lê belê nekarîne nav lê bikin. Hinek ji wan dibêjin “heya ku li hewşa mektebê jî min re gotin min nedizani ku ez gey im.” Transfobî û homofobîya civakî geh li cem malbatê, geh li mektebê, geh jî li kar her û her ji yê li hemberî xwe re dibêje “Tîştên şaş û nayên qebûkirin di hundirê te de heye.”

Pinar vê veqetînê wiha vedibêje: “ Min xwe wek firêzan hîs kir. Di çavên malbata xwe de jixwe ez zarokekî xerab û nediwê bûm. Piştî gihiştina temenekê, serhatîyên min bi rastî jî debar nedibûn. Him ji ber tundîya giran a derûnî ya malbatê û ya hevsalan him jî ji ber tundîya li mektebê dihat serê min di rewşeke pir bêzar de bûm.”

Lekolînên heyî destnîşan dikin ku LGBTÎ+ên ku xwe ji malbatê re eşkere kirine bi tundîya devkî û fizîkîyê re, bi zorganîyê re, bi kuştinê re, bi qewirandina ji malê re, bi zordayîna zewacê re, bi gefa birina qaşo terapîya selihandinê re rû bi rû dimînin. (6)

Alî wiha behsa pêvajoya serhatîya xwe û malbatê dike: “Serê pêşî gava ku reviyam min bajar guherand, min dît ku guhertina bajêr bi kêrî tu tiştî nayê. Dema min bajar diguherand, min didîtin û cardin dibirin malê. Piştî reva xwe ya dawî çareya ewil min biryar da ku derkevim derveyî welêt.”

Li gor gotina Demhar Bella bi tenê polîtîkayêke wê heye, dibêje “Ez trans im, ez takekeseke vê civakê me, parçeyêke wê me û li vê derê me” û piştî sehkirina ku malbata wê gefa mirinê li dixwe pêve ji wiha behsa wê pêvajoyê dike: “ ... di jîyana min de aloziyek dest pê kir, nayê gotin... Min zirar nedaye tu jîndaran. Ji ber ku min gotiye ‘bes ez ev im’, hin kes dixwazin min bikujin.” Mixabin ev jî bi hevkarîya dewlet û polîsan pêk tê.”

Pêvajoya Şingirêdanê

LGBTÎ+ên penaber ne bes malbata xwe li pey xwe dihêlin; welatên xwe, komên xwe yên çandî, jîyanên xwe yên bi zehmetî avakirî, têkilîyên xwe yên civakî, rêhevalên xwe yên li nav an jî li derveyê têkoşînê yên ku hîna sax in an jî ne sax in tev de li pey xwe dihêlin û tevî van pir-wendayîyên di wê gava veqetîna ji welêt dibe ku bikevin pêvajoya şingirêdanê.

Nesaxîya Şîna Dirêjbûyî (Prolonged Grief Disorder) ji aliyê Rêxistina Tenduristîyê ya Cihanî (WHO) ve di sala 2018an de weke teşhîsekê hat qebûl kirin. Li gor lêkolînan ji ber serborîyên tundîyê, wendayîyên travmatîk, bînpêkirinên mafên mirovan, şahidîya li mirinên malbat û hevalan di nav penaberan de Nesaxîya Şîna Dirêjbûyî bi rêjeyêke bilind tê ditin. (7)

Li gor gotina Tîna Godîva berî derketina ji Tirkîyeyê serdegirtina mala wê bû bûyera dawî ku biryara koçkirinê bide, pê re rewşa hestên xwe

wiha raberî me dike: “Di bûyera teqemenî ya Pirsûsê de min hevalên xwe jî ji dest dan. Ez li wê derê bûm, ji xwe gelek ji wan li ber destê min mirin. Ev bûyer kartêka herî mezin bû li ser biryara derketina ji Tirkîyeyê. Şer tiştêkî xerab e. Min şer jî dît. Jiyana min li ser sînorê bû, bi dildarî dixebitîm. Aneha jî gelo min karî tiştên serhatî vebibêjim? Na.”

Li Ewropayê li ser rewşa tenduristîya derûniyê ji aliyê YEyê ve lêkolîneke din hatiye kirin, li gor wê lêkolînê dîtir dibe ku çalakîya koçkirinê bi xwe di hundirê xwe wendayîyekê dihewîne û ji ber tirsê darizandinê penaber dizanin ku ew ê nikaribin vegerin welatên xwe lewma jî ev rewş dike ku hesta wendayîyê xurttir dibe. (8)

Li gor gotina Erce ku naxwaze rewşa heyî ya welêt bişopîne, sedema wê jî wiha diyar dike: “Him ez bêriya welat dikim him jî hewl didim li nûçeyên di derbarê Tirkîyeyê de nexwînim da ku xwe baştir hîs bikim.” Bêrikirina xwe jî wiha tarif dike: “em bêjin qediya jî tiştên ku mirov nikare biqedîne dimîne li pey.”

Li gor gotina Demhat Bella gava balafireh dadikeve pîstê di jiyana xwe de cara ewil xwe rihet hîs dike û di wê kêliyê de du hestên cuda bi hevdu re diji û vê yekê bi me re parve dike: “Wê kêliya ku tekerên balafirê li erdê ketin ji bo min erdhêjeke nû bû çimkî. Di jiyana min de xala werçerxê bû... Min digo qey erdhêja (Erdhêja Edeneyê) berî bi salan hatibû serê min, wek ku cardin dihat serê min. Dûre ez pê hesiyam ku ya rastî jixwe di nav xwe de min erdhêja herî mezin a jiyana didît ku qet xebera min jê nîn bû.”

